

## Kamîya Bawerîyêka Qedîme: Êzidîtîye (2)

**MÎSHEFA** Reşî yanî Mishefa Sîyaye kitabo pîroz yê êzidîyan o. No kitab bi alfabeyêka cîyaye nusîyayo. Na alfabe ne alfabeya erebkî ne îbrankî ne zî suryankî ya, yanî alfabeyêka xususî ya. **RÛPEL-11**



## Hişê Kurdan: Navendên Kurdolojiyê

**JI** bo zimanê Kurdî bigihe îro, Kurdolojiyan gelek xebat kirine. Îro eger em di vê astê de bi zimanê xwe dijîn ev yek jî bi saya xebatên Kurdolojiyan e. Gelek navendên Kurdolojiyê hene ku ji aliyê Kurdan ve hatine vekirin. **RÛPEL-12**



## “Koroya ji enstrûmanên teşt, bîdon û textikan”

**HER** tişt beriya sê salan dema ku xwendekarên dibistana Hamurpetê ji malên xwe anîna; teşt, bîdon, kevçî, quşxane û teweyan dest pê kir. Zarokên Gimgimê tevî kêmderfetan jî, dev ji daxwaza xwe ya muzîkê bernedan. **RÛPEL-14**


# bas

HEFTENAMEYA NÛÇEYÎ Û ŞIROVEYÎ
HEJMAR: 19
15 - 21 GULAN 2017
www.basnews.com




HEVDÎTINÊN ENQERE Û BEXDAYÊ

# LI SER DERXISTINA PKKÊ JI ŞENGALÊ LI HEV DIKIN

### JI HERDU WELATAN LÛTKEYA LEŞKERÎ

Berpirsên pilebilind yên Tirkiyê û Îraqê, beriya çend rojan bi rojeva hebûna PKKê ya li Şengalê civiyan. Hat zanîn ku herdu welat dê li ser vê mijarê careke din bicivin û di vê civînê de wê berpirsên leşkerî cih bigirin.


### EBADÎ: DIVÊ PKK JI ŞENGALÊ DERKEVE

Serokwezîrê Îraqê Heyder Ebadî ragihand: “Eger PKK ji Şengalê derkeve, hincetek bo Tirkiyê jî namîne ku li heremê bisekine.” Tevî hewldan û dijayetiya Malîkî jî Ebadî, daxwaza derketina PKKê dike.



**EKREM ÖNEN** >02

Aleksander Jaba û Mela Mahmûdê Bazîdî



**MURAD CIWAN** >04

378 Saliya dubeşbûna kurdistanê: Peymana qesra şêrîn



**HOŞENG OSÊ** >07

YNK, PKK û “qantona” Sulêmaniye



**NADÎRE GUNTAŞ ALDATMAZ** >10

La sey vatena mi nêbî



**ELÎ EWNÎ:**

## JI BILÎ SERXWEBÛNÊ TU ALTERNATÎF NÎN E

“Rêyek nema ku me li gel Îraqê ne ceriband; Otonomî, komar, qraliyetî, Baas û heta pergala demokratîk jî lê mixabin yekê ji van jî kêşe çareser nekirin. Ji bilî serxwebûnê tu rê nema ye ku me ne ceribandiye û vê carê jî em ê vê biceribînin.”

03



## PKK PIŞTÎ BAKÛR DÊ LI BAŞÛR ŞER DERXE?

Di demeke ku Başûrê Kurdistanê amadekariyên referandûma serxwebûna Kurdistanê dike, kiryar û daxuyaniyên rêvebirên PKK’ê yên li dijî Kurdistanê û li Kerkûkê bilindkirina ala PKK’ê rastî bertekan tên.

04



EKREM ÖNEN

## Aleksander Jaba û Mela Mahmûdê Bazîdî

Ji bo têkiliyên Jaba û Mela Mahmûd baş bêne fam kirin, divê mirovli guhertinên di siyaseta derve a Rûsya Qeyser û nakokiyên Rûsya Qeyserî bi Împaratoriya Osmanî re binêre. Wêdemê têkiliya wan baştir tê fam kirin.

Têkiliyên Kurd û Rûsan herçiqas berê hebin jî lê aktîv têkilîyên wan di destpêka salên 1850î de dest pê dike. Stratejiya Rûsan a bi sedsalan ku dixwazin bigihên ser avên germ û şerê Rûsya Qeyserî ji alîkî ve bi Împaratoriya Osmanî re ji alîkî din bi Farisan re bû sebebku Kurd bala Rûsan bikişînin. Balkêşiya Rûsya li ser Kurdistanê esas ji ber motîvên berjewendiyê geopolîtîk ê Rûsya Qeyserî bû. Rûsya Qeyserî herdem li Kurdan di çarçoweya stratejiya leşkerîde dinêrî. Piştî ku Kurdan bala Rûsan kişandiye, ji bo ku bi karibin Kurdan bi alî xwede bikşînin li ser ziman, çand û jiyana Kurdan a civakî lêkolîn kirine. Di destpêka 1850î de pêşî di rêya konslosxanên xwe ên li Kurdistanê wek Bedlîs, Wan, Erzirom, Xoy, Musil û hwd. de lêkolîn kirine. Hêjayî gotinêye ku konsolos û balyozê Rûsya Qeyserî wê demê gelek ji wan akademîsyen bûn. Wek mînak Mînorskî û Jaba du dîplomatê Rusya Qeyserî bûn di derbarê ziman, çand û jiyana Kurdan a civakî de karê gelekî mezin kirine. Aleksander Jaba yê ku di 1828an de dema li Zanîngeha Vîlenskiyê a beşê zimanê rojhilat ku bi wezareta derve a Rûsya ve girêdayî bû xelas dike pişt re dibe konsolosê Yafayê, paşê dibe konsolosê Selanîkê her weha dibe konsolosê Smyrna (Îzmîr) paşê ji 1848an heta 1866an dibe konsolosê Erziromê. Di vê demê de li ser daxwaza gerînendeyê muzeya Asyayê Borîs Andreyevîç Dorna dest bi fêrbûna zimanê kurdî kiriye û bi vê munasebetê li wir dostaniya wî bi Mela Mahmûdê Bazîdî dest pê dike. Di 1854an di şerê Rusya Qeyserî bi Împaratoriya Osmanî re. Bazîd dikeve destê Rûsan di vê demê de birayê Mela Mahmûd tê kuştin û Behlûl Paşa esîr dikeve dest Rûsan. Mela Mahmûd tê li Erziromê bi cih dibe. Li Erzirom û Meletî bi keşifkirina nivîsên Farisî li ser zêran mijûl dibe. Di 1856an de ji ber sebebên aborî dixwaze cardin vegere Bazîdê di vê demê de konsolosê Rûsya Qeyserî Aleksander Jaba wî nas dike û Jaba jê dixwazê wî fêrî Kurdî bike û bi hevre destnivîsên Kurdî berhev bikin ji bo bişînin akademiya zanistî a Sankt Petersbûrgê. Ji vê demê pêve mirov dibîne ku Mela Mahmûd weke sekreterekî konsolosxanê kar dike. Ji nivîsê Aleksander Jaba mirov dibîne ku qimetekî gelekî mezin dide MelaMahmûd. Mela Mahmûd di vê demê de Jaba fêrî Kurdî dike her weha zêdeyî 50 pirtûk û bi sedan şiîr û destnivîs berhev kirin û şandin Sankt Petersbûrgê. Hinek berhev kirinin Aleksander Jaba evin: ”Stranên Kurmancî, Klamên Keçan, Rûpelê Zarokan, Melayê Batê, Mem û Zîn, Yusif û Zileyxa, pirtûka Mela Yûnisê Xalkatînî, Feqiyê Teyranû gelekî din hene. Koleksîyona Jaba 54 beş û 4017 rupelin. Jaba gelek ji wan bi Mela Mahmûd re berhev kirine. Diserdema Mela Mahmûd jiyaye de gelek rewşenbîrên Kurd hebûne pir heyfe ku îro Kurd ji gelekan ne haydarin. Heta ji bo Mela Mahmûd jî di dest mede bes di koleksiyona Aleksander Jaba de agahiyên fireh di derbarê wî de hene, beriya Jaba rewşa wî çawa bûye an têkiliyên wî bi kêre hebûne em nizanin. Di arşîvên Rûsya de ez li nivîsekê rast hatim ku berî Jaba jî têkiliyên wî di 1930î de bi alimê Rûs Felîkan Martîn von Zaremba re hebûye. Felîkan di 1874an de li Zanîngeha Moskow doktora xwe xelas dike paşê li enstîtûya wezareta derve demekê kar dike paşê dibe katolîk diçe li Swîsre bi cih dibe. Hêjaye lêkolînek fireh li ser bibe. Jixwe em heta niha hew aliyên Mela Mahmûd yên alim zanin. Rola wî a civakî kêm dizanin. Li gor Jaba MelaMahmûd ji bo civata Kurda li ser hev be rolên gelek girîng lîstiye weke mînak di dema serhildana Bedirexaniyande dibe qasid di navbera Kurd û Osmaniyan de. Paşê ku Osmanî fam dikin ew Kurd e, pêşî wî surgûnî Wanê dikin paşê jî wî digrin.

Aleksander Jaba Kî ye?

Alexander Auguste Jaba an bi awayekî din August Dementievîç Jaba di 1801ê de li Kraslavê di malbatek katolîk a arîstokrat de ji dayik bûye. Ji 1848an heta 1866an li Erziromê bûye konsolê Rûsya. Di salên 1853-1856an de ketiye şerê Kirimê, paşê vegeriyaye Erziromê. Wî li ser daxwaza gerînendeyê muzeya Asyayê Borîs Andreyevîç Dorna dest bi fêrbûna zimanê kurdî kiriye û bi vê munasebetê li wir dostaniya wî bi Mela Mahmûdê Bazîdî, Ehmed Xan û gelek zanayên Kurd re çêdibe. Mirov dikare bêje ev dibe sebeb ku wêjeya kurdî dewlementtir bibe. Li ser adet, çîrok û edebiyata Kurda lekolîn kirine û ew di 1860î de di kovara Fransî Recueil des notices et récits de la littérature et des tribus du Kourdistan de dane çap kirin. Her weha ferhengeke Jaba Kurdî-Fransî, Fransî-Kurdî heye. Di 1879an de Jaba Ferhenga Kurdî Fransî amade kir, paşê bi lêzedekirina alimê Almanî Ferdinand Justi ku kurdiya wê bi tîpên erebî û transkrîpsiya wê ya latînî ji aliyê Jaba de hatiye amade kirin, hat çap kirin. Jaba gelek sûd ji Bazîdî û zanyarên Kurd ên din wergirtiye. Di 1866an de dawî li karê wî tê û li Îzmîrê bi cih dibe. Di 1894an li Îzmîrê dimire.

Hevdîtinên Enqere û Bexdayê

# Li ser derxistina PKKê ji Şengalê li hev dikin





RABİA ÇETİN

**HAT** zanîn ku di navbera Tirkiyê ku bi sedema hebûna PKKê li dijî Şengalê operasyonek pêkanîbû û Îraqê de li ser hebûna PKKê ya li Şengalê li asta jor civîn pêk hatin. Li gor agahiyên jêdereke pêbawer ku Basê re aşkere kir, di navbera her du welatan de li ser hebûna PKKê ya li Şengalê li asta jor civînên girîng pêk hatin. Li gor agahiyên hatine bidestxistin Tirkiyeyê beriya çend rojan Balyozê Îraqê yê li Enqerê vexwend navendê. Di vê civînê de Tirkiyê ji rayedarên Îraqê xwest ku helwesteke zelal nîşan bidin û çareseriyekê ji vê meselê re bibînin. Herwiha hatiye ragihandin ku ew êdî bi tu awayî destûr nedin ku PKK li wê derê bimîne.

Dîsa li gor agahiyên heman çavkaniyê, rayedarên herdu welatan piştî vê hevdîtinê, vê carê li Bexdayê civiyan. Di vê civînê de Cîgirê Serokkomarê Îraqê Usamme Nuceyfî û Balyozê Tirkiyê yê Bexdayê Fatih Yıldız hatin ba hev. Hat zanîn ku her du welatan di vê civînê de jî li ser neman û derxistina PKKê ji Şengalê li hev kirine.

**“PKK ji Şengalê derkeve, wê leşkerên Tirk jî derkevin”**

Li hêla din di civîna parlamenterên PDK û Serokwezîrê Îraqê Heyder Îbadî de jî hebûna PKKê ya li Şengalê mijara sereke bû. Di vê civînê de parlamenterên PDKê ji Heyder Îbadî re ragihandin ku ji ber hebûna PKKê û kiryarên wê, xizmetgûzarî ji bo Şengalê naçin. Herwiha hatiye destnîşankirin ku PKK li pêşiya avadankirina Şengal û herêmê asteng e û ji ber PKK xebatên ji nû ve avakirina Şengalê nayên destpêkirin. Hêzên PKKê piştî êrişên DAIŞê yên li ser herêmê derbasî Şengalê bû û piştî paqijkirina Şengalê ji DAIŞê bi peşmergeyan ve, ji bajêr derneketin. Li şûna ku derkeve PKKê li Şengalê hêzên leşkerî yên girêdayî xwe ava kirin û bi vî awayî bo midaxeleyên Tirkiyê yên li deverê jî hincetan çêdike û dibe sedema aloziyan. Herwiha hat zanîn ku Ebadî jî ji parlamenterên PDKê re diyar kiriye ku sedema mayîna leşkerên Tirkiyê yên li Îraqê jî hebûna PKKê ya li herêmê ye û eger PKK ji Şengalê û deverên din derkeve wê bo mayîna leşkerên Tirkiyê jî hincetek nemîne. Ebadî ragihandiye ku divê teqez PKK ji Şengalê û herêmê derkeve.

**Saziyên ewlekariyê yên Tirkiye û Îraqê dê bicivin**

Li gor agahiyên ku Basê bidestxistine, saziyên ewlehî û leşkeriyê yên Tirkiye û Îraqê dê di demek nêz de lûtkeyekê pêk bînin. Di vê civînê de ji yên beriya wê cudatir, vê carê berpirsên leşkerî û sîxurî yên her du welatan wê bicivin. Di vê lûtkeyê de jî hebûna PKKê mijara sereke ye û tê çaverêkirin ku ji vê civînê biryarên girîng derkevin. Herwiha çavkaniyên nêzî hikûmetê jî ku nexwastin navê xwe aşkere bikin ji Basê re axivîn û lidarxistina vê lûtkeyê ne derewandin.

**Di nava YNKê de bêbiryariya PKKê**

Li gor agahiyên Basê bi destxistina hebûn û kiryarên PKKê yên li herêmê di nava Yekitiya Niştimaniya Kurdistanê (YNK) de dubendî û cudahiyek çêkiriye. PKK niha di serî de herêmên Germiyan û Rewandûz, li deverên li jêr kontrola YNKê di nava liv û tevgerekê de ye û çalak e. Ev yek jî bûye sedema dubendiyekê di nava YNKê de. Aliyê ku kontrol, hêz û desthilata partiyê di dest de ye û di bin kontrola Îranê de ye, li gel hebûna PKKê ya li herêmê ye û naxwaze PKK ji herêmê derkeve. Aliyê din jî di nava YNKê de destnîşan dikin ku wê PKK, di pêşerojê de dê ji YNKê re bibe metirsî û vê mînakê dide: “PKK, beriya niha tenê li Qendîlê bû. Lêbelê niha li her devera ku em tê ne ye. Rêxistinên girêdayî xwe ava dike, ciwanan dibe kampên xwe û di her warî de cihê xwe xweş dike. Ev yek li dijî me talûke û gef e. YNK bi vî awayî bi destên xwe metirsiyê li ser xwe ava dike. Me berê çavên xwe ji Cundul Îslamê re jî girtin û ew rêxistin herî dawîn ji kontrolê derket. Egere wê heye ku PKK bo me bibe Cundul Îslameke nû. Divê PKK ji herêmê derkeve.”



## Malîkî çima dixwaze PKK li herêmê bimîne?

Li hêla din PKKê jî midaxele û êrişên Tirkiyê yên li dijî Şengalê xist stûyê Başûrê Kurdistanê û dijayetiya xwe ya li dijî serxwebûna Kurdistanê ragihand. Herwiha berpirs û rayedarên PKKê her tim aşkere dikin ku ew li gel yekgirtina Îraqê ne û qebûl nakin ku Kurdistan serxwebûna xwe ragihîne. Herwiha berpirsên PKK û Siyasetmedarê Şîî Nurî El Malîkî li dijî Ebadî tevdigerin û ji van gotin û sekna Ebadî ne razî ne. Malîkî berovajî Ebadî, ji ber jêrdesthilat û bandora Îranê û berjewendiyên xwe dixwaze PKK li herêmê bimîne. Her wiha heman jêderî da zanîn ku Îran di her fersendê de dijayetiya xwe ya li hemberî referandûma serxwebûna Kurdistanê aşkere dike, bi destê Malîkî û PKKê hewldanên pêşîgirtina proseya referandûma serxwebûnê dide.

## Di nava PKKê de parçebûna DYA û Rûsyayê

Dewletên Yekgritî yên Amerîkayê piştî rêkeftina Tirkiyê, Îran û Rûsyayê ya avakirina ‘herêmên bêpevçûn’ li Sûriyê, biryara şandina çekên giran bo hêzên HSDê ku YPG pêşengiya wê dike, pesend kir û bi vî awayî beriya operasyona rizgarkirina Reqayê hinartina çekan bo YPGê dest pê kir. Beriya pesendkirina biryara çekên giran bo YPGê hêzên DYAyê li ser sînorê Rojava bicih bûn û hevkariya xwe ya bo YPGê zêde kir. Çavkaniyekê ji Basê re ragihand ku ev hevkarî û piştgiriya zêde ya dawîn a DYAyê di nava PKKê de bûye sedema niqaş û parçebûnê. Li gor wê jêderê aliyekî di nava PKKê de dibêje ku ev piştgirî û alîkariya DYAyê divê bê dîtin, ji bo mittefikiyê di nava vebijêrkên heyî de DYA ya herî baş e û pêwendiyên bi DYAyê re bên bihêzkirin û bi DYAyê re tevbigerin. Aliyên din jî li gel hevalbendiya mihwera Rûsyayê ku Sûriye û Îran jî tê de cih digirin û dixwaze ku pêweniyên bi vê mîhwerê re bên pêşxistin. Dîsa li gor jêderekî nêzî PKKê di demeke nêzîk de şandeke PKKê dê serdana Rûsyayê bike û wê li gel berpirsên Rûsyayê bicive. Di vê civînê de alîkarî û piştevaniya DYAyê ya bo YPGê dê were axaftin û PKK jî dê bi rêya Rûsyayê ji Sûriye û Îranê bêje ku ev alîkarî tenê ‘di çarçova şerê li dijî DAIŞê de ne’.

## Nasnameya berpirsên PKKê yên gefan li Kurdistanê dixwin balê dikişîne

Nasnameya berpirsên PKKê ku ev heyamek e li dijî serxwebûna Kurdistanê daxuyaniyan didin û gefan li Kurdistanê dixwin balê dikşîne û ev bûye cihê niqaşan. Herî dawîn berpirsê PKKê Rıza Altun gef li Kurdistanê xwarin û got: “Em ê şer vegûhezînin Herêma Kurdistanê û bikin qada şer.” Herwiha berpirsên PKKê yên Tirk di her fersendê de bi daxuyaniyên xwe yên li dijî Kurdistanê di rojevê de ne. Berpirsên Hikûmeta Herêma Kurdistanê jî balê dikşînin ser nasnameya van kesan û dibêjin divê bi baldarî tevbigerin.

## Endamê Serkirdeyatiya PDKê Elî Ewnî:

# Ji bilî serxwebûnê tu alternatîf nîne



BARHAM MUSTAFA

**ENDAMÊ** rêveberiya KCKê Riza Altun hefteya din gotibû; "Ji îro pê de Başûrê Kurdistanê jî di bin hedefa me de ye, em ê şer bibin Herêma Kurdistanê" hûn van gotinên Altun çawa dinirxînin?

Li gor nêrîna min a herî baş şerê di nav PKKê û Tirkiyeyê de li qada Tirkiyeyê bê meşandin. Eger PKK ji dil jî doza azadiyê bi rê ve dibe, wê demê qada şer ne Başûr ne jî Bakur e, qada vî şerî bajarên Tirkiyeyê ne. Hebûna PKKê li Başûr, Şingal û Qendîlê ne meşrû ye. Mayîna PKKê li van herêman tenê bi armanca bikaranîna ji aliyê dewletên herêmê ve ye. PKK, bi 'siyaseta xendekan' çawa bû sedema wêrankirina Cizîr, Şirnex, Silopî, Gever û Sûra Bakûrê Kurdistanê, dixwaze heman wêrankirinê li Başûrê Kurdistanê jî bike. Ev daxwaz û biryar ne ya PKKê ye lê dibe ku bicihanîna rola dane PKKê ye. Dewletên herêmê, proseya aborî û siyasî ya ber bi serxwebûna Kurdistanê ve diçe hezim nakin. Ji ber vê yekê jî PKKê bikar tînin. PKK jî mixabin ji bo gelê Kurd negihêje armanca xwe bûye piyonê destê van dewletan. Eger PKK, Şingalê, Êzidiyan û gelê Kurdistanê difikire bila hemû hêza xwe ji deverê vekêşe. Dewleta Tirkiyeyê ji ber hebûna PKKê a li van deveran êrîş tîne ser gelê me û Pêşmergeyên me şehîd dikevin. Pêdiviya Şingal û Herêma Kurdistanê bi PKKê nîne. PKK bûye bela serê me.

**Endamê rêveberiya KCKê Duran Kalkan dibêje ku birêvebirina Kurdistanê ji Hewlêrê xelet e û divê bajarên Şingal, Silêmanî, Dihok, Zaxo bi xwe bên îdarekirin hûn van daxûyaniyan çawa dinirxînin?**

Biryara îdarekirina ji Şingalê, dê ji aliyê kê ve û çawa bê îdarekirin ne ji aliyê Duran Kalkan û yên wek wî tê dayîn. Şingal, bajarekî di bin îdareya Herêma Kurdistanê de ye û destûra bingehîn a Îraqê jî dide zanîn ku qedera Şingalê dê bi referandûmê diyar bibe. Tenê gelê Kurdistanê dikare di derheqê qedera Şingalê de biryar bide. Çawa hemû bajarên Fransayê ji Parîsê, hemû eyaletên Amerîka ji Waşingtonê birêve diçin Kurdistan jî dê ji Hewlêrê bê îdarekirin. Duran Kalkan li şikeftên Qendîlê xwe veşartiye û dixwaze xwe bi Şingaliyan re xwe ferz bike.

**Başûrê Kurdistanê bi referandûma serxwebûnê di rojeva Rojhilatanavîn û Cîhanê de ye ev daxûyaniyên PKKê tesadûf in?**

Eger mirov a rastî bêje PKK, ne hêzeke di armanca tekoşîna Kurdistanê de ye. Ji serî de PKK ji aliyê dewleta kûr ve hat damezirandin. Armanca damezirandinê astengiya li pêşiya tekoşîna azadiya gelê Kurdistanê bû. PKK wek hêzeke sixte bûye bela serê gelê Kurd. Di vê çarçoveyê de jî PKK derxistin pêş û mezinkirin. Niha milekî PKKê di destê Îranê de mîna çekeke pir xeternak e. Milê din jî di xizmeta Ergenokiyên berê de ye. Vê hêzê bi navê Kurdbûnê beşek ji gel kişandiye cem xwe. Ji bilî vê yekê tu feydeya wan ne kiryarên wan ne jî bi daxûyaniyên wan qet bi gelê Kurd û Kurdistanê re tune ye. Polîtîkayên PKKê bêguman xizmeta Kurdistanê nakin. Ji xwe ne bi armanca Kurdbûnê û Kurdistanê hatiye damezirandin. Ji vê yekê emîn bin ku ji bo astengî li pêşiya serxwebûn û referandûma serxwebûna Kurdistanê derxe çi ji destê wan were dê bikin. PKK, yekane partî ye ku astengiya proseyên ji bo gelê Kurd e. Ji bilî PKKê tu hêza Kurdî heye ku serxwebûnê naxwaze? PKK ji me re awayekî vekirî dibêje ku: "Bila dewleta Tirkan hebe lê em netewdewleta Kurdan naxwazin û em ê ji vê re bibin astengî." Hûn dikarin yek miletekî nîşanî min bidin da ku dev ji welatê xwe berdabe? Nîne. Li ser ruyê cîhanê tu miletek nîne ku dev ji axa xwe berdabe.

**Armanca bilindkirina ala PKKê li Kerkûkê dê qirîza li Kerkûkê kûr bike?**

Mixabin PKK çi bike hin aliyên di nav YNK, Goran û Partiyên Îslamî yên Siyasî de ne li çepika dixin. Sedema vê yekê jî li hember derketina PKKê ku birêvebirina siyaseta PDKê a ji bo Kurdbûyînê ye. Em siyasetê dimeşînin ew jî li hemberî me di nav xebatan de ne. Bifikirin ku PKK li Rojavayê Kurdistanê bilindkirina Ala Kurdistanê qedexe kiriye, li Kerkûkê ala xwe bi rehetî bilind dike. PKK, siyasetmedarên Rojava ku di bin siya ENKSê de tevdigerin asteng dike û rêveberên wê desteser dike, dikuje hetta dişewitîne. Ew hêza ku li Rojava van kiryaran dike, emê çawa bilindkirina ala wan li Kerkûkê pesend bikin. Belê, PKK bi hebûna xwe rewşê xirabtir dike. PKK, li Başûr ne hêzeke siyasî û ne jî kanûnî ye. Yekane armanca van kiryarên PKKê heye ku têkçûyîna li Bakurê Kurdistanê veşêre!

**Piştî girtina navendên ENKSê û desteserkirina hin Siyasetmedarên ENKSê serokê ENKSê Birahîm Biro daxwaza "Bila DYA, dev ji alîkariya PYDê berde" kir, hûn çawa dinirxînin?**

Em umida filitina gelê Rojavayê Kurdistanê ji polîtîkayên PKKê dikin. Em berjewendiyên xwe yên neteweyî bi PKKê ve girê nadin. Li gor min xweparastina gelê Rojava meşrû ye û divê ji bin zilm û zexta rejîma şoven ya Erep a Suriyeyê bifilitin û azad bibin. Li gor me di pêşerojê de dê Rojava û Başûr di bin siya dewletekê de bibin yek. Em heman netew in. PKK bi vî halê xwe li Rojava xizmeta Kurdbûnê nake. Di bêrîka te de nasnameya Baasê hebe tu nikarî bibêjî ez di xizmeta Kurd û Kurdistanê de me. PKK him di lîsteya terorê ya Netewêyên Yekbûyî (NY) de him jî di ya Yekîtiya Ewropa (YE) de ye. Ji bo ku meşrûiyetê ji siyaseta xwe ya xelet re bistîne, Rojava bikar tîne. PKK ne hêzeke welatperwer e, ji ber vê jî divê ji Şingal û Başûrê Kurdistanê derkeve û biçe di bin îdareya MÎT'a Tirkiyeyê de bixebite. Ji ber ku cihê xebata wan MÎT e. Rojava, Başûr an jî Bakurê Kurdistanê nîne.

Li gor min divê ENKS, li gel PYDê rûne û yekîtiya netewî ava bike. Xwe ji rejima Baas ya Suriyeyê û PKKê rizgar bike. Niha hewildanek heye ku PYD û ENKS ligel hev bicivin û Rojavayê Kurdistanê bi hev re birêve bibin. Dixwazim balê bikşînim ser mijareke din. PKK, maniya "Dê birakûjî derkeve" derdixe pêş û li ber Pêşmergeyên Roj dibe astengî. Pêşmergeyên Roj bi tevahî ji ciwanên Rojava pêk tê. Gelo dê ji PKKê neyê pirskirin, "Madem tu ji şerê Birakûjî ditirsî çi karê te li Başûrê Kurdistanê heye?"

**PKKê heta niha li Bakurê Kurdistanê ji bo binkeyek ava bike gundek jî rizgar nekiriye. Lê xebatê ji bo ku hemû hêza xwe li Rojava û Başûrê Kurdistanê bicîh bike dike.**

PKK, herdem qala yekbûyîna Îraqê dike lê ji aliyê din ve daxûyaniyên li ser Kerkûk û Şingalê jî hene hûn çawa dinirxînin?

PKK niha bi awayekî vekirî ji bo yekîtiya Îraqê di bin sîwana Heşdî Şeibî de dixebite. Ji bo Îraq weke niha bimîne ji Nûrî Malikî pereyek mezin distîne. Jixwe Şingal jî li ser daxwaza Malikî dagir kiriye. Niha jî berê xwe dide Kerkûkê. Dixwaze Kerkûkê di tepsiya zêrîn de pêşkêşî Nûrî Malikî bike. Çawa ku li Rojava di bin xizmeta Esad de dixebite li Îraqê jî di bin xizmeta Malikî de dixebitin. Dema rizgarkirina Kurdan ji PKKê hatiye. Em dereng jî mane.

**Hûnê Astengiyên Îranê li hember referandûmê çawa têk bibin?**

Îran û tevî her sê dagirkerên din xwedî pirsgirêkên pergala xwe ne. Kêşeya herî mezin ya Îran, Tirkiye, Suriye û Îraqê kêşeya Kurdan e. Li gor min Îran an jî dewletên din ji bo astengiya serxwebûna Herêma Kurdistanê çeteyên wek PKKê bikar bînin wê demê bersiva gelê Kurdistanê jî dê tûnd be. Herêma Kurdistanê li hember van astengiyan bi ser ketiye. Wek mînaka ÎŞÎDê. Li hember Herêma Kurdistanê cûr bi cûre teşebusên pîs hatine kirin. Li hember ewlehiya me gav hatin avêtin, gundên me hatin bomberan kirin, hêzên terorî bi ser me de hatin şandin lê belê me van teşebusan têk birin. Bila ev baş bê zanîn; "Dîwarên ku Îranê diparêzin ji parêzvanên welatê me zeîftir in. Li hember serxwebûna me kî bisekine em ê li hember wan li ber xwe bidin."

**Dewletên wek Îranê xebatên astengkirina referandûma serxwebûnê bikin dê tedbîrên Hikûmeta Kurdistanê çi bin?**

Hikûmeta Herêma Kurdistanê ji bo Jenosîdên Enfalê, komkûjiyên Helebçe nebin û parastina xwe dixwaze li hember mala xwe dîwarên zexim ava bike. Niha têkiliyên Kurdistanê bi cîhanê re gelek xurt in. Rast e dewletên cîran li hember dewleta serbixwe ya Kurdistanê ne, lê bila baş zanibin ku Kurdistana serbixwe tu carî ji wan re nabe gef. Niha jî eger dewleta Îraqê bikaribe dê bi balafirên xwe me bombebaran bike. Daxwaza serxwebûna me yekane ji bo cardin jenosîd û komkûjiyên dij mirovatiyê bi ser me de neyê ye.

**Helwesta Îran, Tirkiye û Suriyeyê di derheqê Kurdistana serbixwe dê çawa be?**

Di serî de dê bertekên tûnd nîşan bidin. Dê bixwazin ku em dev ji daxwaza xwe berdin. Lê belê piştî dewleta xwe îlan kir bi tûndî dê nikaribin êrîşî me bikin. Ji ber ku pergala cîhanê dê rê nede wan. Pergala niha a cîhanê dê nehêle me dagir bikin, bikûjin. Dê piştî vê yekê wê ji hemû dewletan zaftir li gel me peywendiyan deynin û dê me nas bikin. Ew ê jî bibînin ku dewleta Kurdistanê ji bo aştî û îstiqrara herêmê ferz e.

**Gelo Rusya û DYA bibêjin na em 'Dewleta serbixwe a Kurdistanê naxwazin' dê çi bibe?**

Di sedsala dawîn de dema me dest bi doza azadiya netewî kir me ji kesî destûr nexwest. Wê demê têkiliyên dagirkerên me li gel hev pir baş bûn. Hew mabû ku aşiqê hev bibin. Tevî vê yekê jî me doza xwe kir û em gihîştin vê astê. Ji îro pê de jî heta em serxwebûna xwe bidest nexin em ê doza serxwebûnê bidomînin. Nexşa Rojhilatanavîn bi neheqiyan hat dabeşkirin. Di encamê de Kurdistan kirin çar perçe. Çi ji destê wan hat li hemberî me kirin.

**PKK 3 sal e li Şingalê ye gelo çima Tirkiye niha êrîş kir?**

Bi rastî divê ev pirs ji her du aliyan bê pirsîn. Çima hûn şerê di navbera we de tînin welatê me? Navenda çareseriya pirsgirêkên PKK û Tirkiyeyê Tirkiye ye. Ne Başûrê Kurdistanê ye. DAÎŞ li Şingalê tenê êrîşin asmanî nekiribû. Niha Tirkiye, PKKê dike manî û vê yekê li Şingalê dike. Çima Êzidî bibin qurbaniyên siyaseta PKKê ya xelet. Bila li qada xwe ji pirsgirêkên xwe re çareseriyê bigerin.





## ELÎ EWNÎ

Endamê Serkirdeyatiya Partiya Demokrata Kurdistanê (PDK) Elî Ewnî, di derheqê referandûma serxwebûna Başûrê Kurdistanê de destnîşan kir ku "Ji bilî serxwebûnê ti çareya me nîne" Ewnî, di derheqê egera li hember derketina Turkiye, Îran, Îraq û Rusyayê de jî wiha got: "Heta em serxwebûna xwe îlan nekin em ê doza xwe bidomînin!"

### Referandûma serxwebûnê nayê wateya îlankirina serxwebûnê. Li gor we serxwebûn kengê ye?

Referandûm ji bo me dibe qarteke xurt ku em bikaribin li hember Îraqê û dewletên din bikar bînin. Ji bo proseyê di destê Kurdan de dibe qarteke xurt. Ev qart ji bo hevdîtinên di navbera Kurdistan û Îraqê de destê me xurt dike. Armanca me mîna Çekoslovakyayê bi awayekî aştî ji-hev-cûda-bûne. Me ji rêveberên Îraqî re got ku; "Tu rê nema ku me ligel we neceribandibe. Otonomî, komar, qraliyetî, Baas û heta pergala demokratîk jî lê mixabin tu pergalî pirsgirêka Kurdî çareser nekir. Ji bilî serxwebûnê tu rê nemaye ku me ceribandiye vê carê jî em ê vê biceribînin."

Armanca me veqetandineke aşitiyane ye. Eger ev nebe wê demê em ê rê û rêbazên cûda biceribînin. Di vê oxirê de em amade ne canê xwe bidin.



> Me ji rêveberên Îraqî re got; "Tu rê nema ku me ligel we neceribandibe. Otonomî, komar, qraliyetî, Baas û heta pergala demokratîk jî lê mixabin tu pergalan pirsgirêka Kurdî çareser nekir. Ji bilî serxwebûnê tu rê nemaye ku me ceribandiye vê carê jî em ê vê biceribînin."

MURAD CÎWAN

## 378 Saliya dubeşbûna kurdistanê: Peymana qesra şêrîn

Vê hefteyê 378 sal di ser Peymana Qesra Şêrîn re derbas dibin. Peymana ku welatê kurdan kir du beş, di 17ê gulana 1639ê de li Deşta Zohabê ya nêzî Qesra Şêrîn a ser bi Îranê ve hat mohrkirin.

Kurd giringiyeka mezin didin peymanê; ew wek destpêka êş û jana kurdan a îroyîn tê nirxandin.

Destpêka vê êşê esas berî wê bi 500 salan, bi hatin û vegirtina oxuzan a Îranê, Kurdistanê, Azerbaycanê, Ermenîstanê, Gurcistanê û Erebistanê û du sed û pêncî salan piştî wan, bi pêla duyê (ya Moxolên Cengîzî) û sed û pêncî salan pişt re bi ya siyê (Moxolên Tîmûr) ya bi hatina Moxolan bû. Fermanrewatiyên seranserê welatê kurdan; Şeddadî, Rewadî, Merwanî, Eyyubî û yên din ên hur û gir di bin dagirkerî û sulteyên wan de man, gav bi gav wenda bûn, çûn.

Piştî 400 salan ku ev hersê pêlên xezebê ji deverê vekişiyan, Qereqoyunî û Aqqoyunî li ser mîrasên wan hilhatin û berfireh bûn. Di hundurê sedsaleka din de Aqqoyunuyan zora Qereqoyunuyan bir, pişt re ew jî ji hev ketin.

Di destpêka sedsala 16ê de (1501) Şah Îsmaîlê Safewî paytexta Aqqoyunuyan Tebrîz zeftkir û şahîtiya xwe îlan kir. Di 13-14 salan de Şah Îsmaîl ji Maveraunehrê heta bi Erzincanê, rojavayê Sêwasê, Ermenîstan û Azerbaycan xist destê xwe. Hidûdê li gel Memlukiyan bû Firat, daket heta Xelîca Besrayê. Kurdistan ji Loristanê heta Dersimê, rojhilatê Sêwasê û rojavayê Erzincanê ket bin destê Safewiyan. Meletiye û rojavayê Firatê; bakurê Helebê tabiê Memlukiyan bû. Meraş û Kilîs di bin serweriya Mîrekiya Dulqadiriyan de bûn.

Şah ÎsmaÎl mîrên kurdan kuştibûn, zindan kiribûn yan dabûn alî, beg û fermanrewyên ji mezhebê şîe danîbûn ser kele û bajarên kurdan, zorê dida ku kurd bibin şîe.

Wê wextê Osmanî ji Erzincanê, Sêwasê û Antalyayê rojavatir, dewleteka Ewropayê-Balkanan bûn. Li ser daxwaza mîrên Kurdan ku Îdrîsê Bedlîsî nuneratiya wan dikir, di bin serweriya Yavuz Sultan Selîm de sefereka Osmanî hat ser Îranê, li Çaldiranê şer di navbera Safewiyan û tifaqa Osmanî û kurda de derket. Safewî têkçûn.

Bi derfeta ji vê serkeftinê û bi alikariya orduya Osmanî kurdan serî hilda, Safewî ji welatên xwe derxistin. Kurdan di nav Osmaniyan de îdareyên xwe yên muxtar û nîv muxtar avakir.

Lê di 1514 - 1515ê de hemû Kurdistan xelas nebû. Ji rojhilatê Erzincanê, bakurê mîrekiya Bedlîsê; hawzeya Gola Wanê û berjortir heta Qefqasyayê, beşeka mezin a mîrekiya Hekkariyê, beşeka mîrekiya Soran, mîrekiya Erdelan ku heta rojhilatê Mûsilê dihat, Şarezor digirt nav xwe û Mîrekiya Loristan ser bi Safewiyan ve ma.

Yavuz bi orduya Osmanî û kurdan di 1516 - 1518ê de dewleta Memlukiya hilweşand rex bi rexê rojavayê Firatê, pişt re heta Deryaya Sor; Erebistan û bajarên pîroz ên Îslamê jî xist destê xwe, bû xelîfeyê îslamê.

Yavuz di 1920an de, Şah Îsmaîl di 1924an de mir. Qanûnî û Şah Tahmasp hatin ser desthilatê. Tahmasp 10 salî bû, şerê desthilatê di nav axa û fermanrewayên Safewî de destpêkir. Özbekan ji rojhilatê ve hicûmî Îranê kir. Di vê rewşê de, di 1533yê de Qanûnî berê sedrezam Îbrahîm Paşa şand ser Azerbaycanê, pişt re ew jî di derket seferê. Di 1534an de Tebrîz hat girtin. Bi sefera Iraqeyn şer ber bi Xelîcê ve hat dirêjkirin û Bexdad, Besra, Necef û Kerbela ket bin destê Osmaniyan (1534).

Sefera Qanûnî ya di 1548 - 1549ê de, ber bi Şêrwan û Qefqasyayê ve bû, ji Tebrîzê wêdetir tu der nehatin zeftkirin, lê di vê navberê de hewzaya Gola Wanê, Erzirom, temamiya Hekkariyê bû tabiê Osmaniyan. Li van deran jî mîrekiyên kurdan li ser esasê mîrasên xwe, bûn xwedan serwerî.

Çend carên din seferên ber bi Naxîcewanê û Rewanê de bûn, lê destkeftin nebû. Di 1555an de bi Peymana Amasyayê lihevkirina hidûdan di navbera osmanî û îraniyan de pêkhat. Osmaniyan serweriya xwe li ser xeta serheda rojhilat, ew deverên ku ji Rewanê heta Besrayê girtibûn bi Îraniyan da qebûl kirin.

Piştre di salên 1580 – 1590î de osmaniyan Rewan û Naxîcewan jî xist destê xwe û bi peymana 1591ê serweriya li ser van deran tekez kirin.

Lê di destpêka sedsala 17ê de (1603 - 1612) Şah Abbasê Safewî hicûmê ser erdên bin destê Osmaniyan ên li Azerbaycanê û Kafkasyayê kir; Qerebax, Gence, Naxîcewan, Tebrîz û pişt re Rewan (Erîvan) ji osmaniyan stend. Di vê navberê de gelek caran osmaniyan sefer birin ser van ciyên stendî, fêde nebû.

Di 1612an de peymanek di navbera osmaniyan û îraniyan de çêbû ku xwe li ser esasê peymana Amasyayê (1555) girt. Maddeyek ew bû ku; Seyid Xanê (Mîrê Amedîyê) û Helo Xanê (mîrê Erdelan) ku erdên Huweyzeya nêzî Bexdadê û yên Şarezorê istîla kirine, ji bal safewiyan neyên destekkirin.

Dewam hefteya bê...

# PKK piştî Bakûr dê li Başûr şer derxe?



NÛJÎN ONEN

Di demeke ku Başûrê Kurdistanê amadekariyên referandûma serxwebûna Kurdistanê dike, hin daxuyaniyên rêvebirên PKK'ê yê li hember wê û li Kerkûkê bilindkirina ala PKK'ê rastî bertekan tê. Rêvebirê konseya KCK'ê Riza Altun di derbarê Şengal û Qereçoxê de gotibû "KDP, bi hêza Komara Tirkiyeyê dixwaze li Başûr bibe xwedî hêz lê ev dikare Başûrê Kurdistanê bike qada şer ev rîska girtiye ser xwe. Heger ku Komara Tirkiyeyê û KDP di siyaseta xwe de bi israr bin dê Başûrê Kurdistanê bibe qada şer." Piştî daxuyaniya Altun,Wezareta Pêşmerge ya Herêma Kurdistanê got; "Em hêvî dikin ku ev fikir tenê aîdê Rıza Altun be ne helwesta giştî ya PKK'ê be." Ji aliyê din ve Nûnerê Yekîtiya Ewropa Clarisse Pasztory li Hewlêrê di daxuyaniya xwe de gotibû; "Daxuyaniyên rêvebirên PKK'ê gef in. Ti kes û alî gefên li welatan tê kirin napejirîne. Qeymeqamê Kerkûkê Kami Saleyî li ser bilindkirina ala PKK'ê li Kerkûkê gotibû; "Kerkûk ne qada çalakiyên PKK'ê ye, em li dijî bilindkirina alê ne." Parlementerê YNK'ê yê parlementoya Iraqê Mihemed Osman jî di daxuyaniya xwe de gotibû: "Li Kerkûkê bilindkirina ala PKK'ê li dijî destûrê ye."

Ji xeynî daxuyaniyên Başûrê Kurdistanê yê li hember PKK'ê ka hin partiyên Bakûrê Kurdistanê derbarê van mijaran de çi difikirin?

"Hikûmeta Kurdistanê naxwaze pozê Kurdekî jî xwîn bibe"

"Cîgirê Serokê Hak-Parê Abdülmenaf Kıran dibêje; "Başûrê Kurdistanê ber bi dewletbûnê ve diçe. Dewlet nikarin weke rêxistinan bêberpirsiyane tevbigerin. Ji bo di qada navneteweyî de dewletek wek dewlet bê qebûlkirin divê ewil mixalefeta bi çek bertaraf bike. Daxuyaniyên Rıza Altun tenê xisarê dide têkoşîna Kurdan ya netewî û wekî din ti fêda wê tuneye. Ev helwest xizmetê li dijmin û bêstatûbûna Kurdan dike. Wek Hak-Parê me berê jî gotibû PKK ala xwe li Şengal an Kerkûkê daliqîne an li Şengalê bixwaze desthilatdariya xwe pêkbîne û desthilatdariya Herêma Kurdistanê nas neke ev yek ne rast e û bi Kurbûnê nayê ravekirin."

Kıran dibêje daxuyaniyên ku dibêjin 'Başûrê Kurdistanê bi Tirkiyeyê re li hev kiriye û Tirkiye li ser vê lihevkirinê êrîşî Şengalê kiriye' ne rast in û wiha berdewam dike; "Derfeta Başûrê Kurdistanê tuneye ji êrîşên Tirkiyeyê re bibe asteng. Di dema Hikûmeta Navendî ya Îraqê de jî Tirkiye her tim operasyon pêk dianîn. Hikûmeta Kurdistanê naxwaze pozê Kurdekî jî xwîn bibe."

Kıran di berdewamiya axaftina xwe de dibêje: "PKK ji serxwebûna Başûrê Kurdistanê re dibe asteng, di daxuyaniya Rıza Altun de helwesteke Kurdistanî tuneye. Divê midaxaleyî karê Başûrê Kurdistanê yê navxweyî nekin. Ka em bihêlin bila Başûrê Kurdistanê bi awayekî xwezayî pêşve biçe. Ev kes fikiran şêlû dikin û dibêjin 'em dewletê naxwazin, statuyê naxwazin.'"


**"Ji dîroka sedsalan ders nestandin e!"**

Endamê MGK ya Tevgera Azadî Enes Atilla Pay dibêje: "Rêxistinek bibêje emê êrîşî Başûrê Kurdistanê an parçeyekî Kurdistanê bikin bêsiûdî ye. Di sedsaleke ku Kurdistan û Rojhilatanavîn di heyema herî stratejîk dijî, di pêvajoyeke wiha de bikaranîna şêwazeke bi vî rengî ji dîrokê ders nestandin e.

Pay amaje dike: "Di rewşeke ku Kurdistan rojeva dinyayê diyar dike de, mixalefeteke hişk ya ku hêzên Kurdî li hember hevûdu dikin dibe ku bibe sedema ji destçûna pêvajoyê. Divê hêzên Kurd bi stratejiyeke hevbeş li hember mêtingeran têbikoşin. Ji bo Başûrê Kurdistanê divê hemû Kurd werin cem hev û ji bo serxwebûnê têbikoşin. Hêzên Kurdî nabe ku ji bo li parçeyên din bicîh bibin bi desthilatdarên wir re şer bikin, ev yek nayê qebûlkirin."


Abdülmenaf Kıran


M. Emin Kardaş


Enes Atilla Pay


İmam Taşçıer

## Dijminatiya Kurdistanê tê kirin

Serokê Partiya Demokrat a Kurdistana Tirkiye (PDK-T) Mehmet Emin Kardaş, li ser daxuyaniya Rıza Altun dibêje; "Li ser dijminatiya Kurdistanê bi salan e di xebat û niyeteke wiha de ne. Çi li Rojhilatanavîn û çi jî li Suriye û Tirkiye, PKK ti carî ji bo doza Kurdan şer nekir. Berovajî vê PKK wek rêxistineke ku ji bo astengkirina dewleta Kurd kar dike. Ev daxuyanî ne tesadûf in, çi wexta ku dengê Kurdan bi awayekî rêxistinî derdikeve ji bo ku pêşiya vê bigirin, çi ji destê wan bê dikin. Ji bo ku dewleta Kurd ava nebe çi ji destê wan bê dikin."

## Hemû Kurd divê li destkeftiyan xwedî derkevin

Parlementerê HDP'ê İmam Taşçier dibêje 'ne li ser navê partiya xwe lê weke parlamenterekî HDP'ê dixwazim fikrên xwe yên di derbarê vê mijarê de bînim ziman.' Taşçıer, mijarê wiha dinirxîne: "Dema Sykes-Picotê Kurd bêyî îradeya xwe bûne çar parçe, ev bi sedsal in Kurd bi hevûdu re jiyane û wexta ku ev sînor çêbûne nêviyê malbatê aliyakî sînor maye nêviyê din jî aliyê din maye. Di vê navberê de têkilî û çûnûhatina Kurdan berdewam kiriye. Ji ber vî awayî partî û rêxistinên tamamê Kurdistanê divê tifaq, diyalog û yekîtiya wan li hemberî dijminan hebe. Divê fikrên cuda jî hebin. Li her çar perçeyên Kurdistanê partiyek dikare jiyan û xebata xwe berdewam bike lê divê serkeftinên wî perçeyê Kurdistanê hemû partî û rêxistin lê xwedî derkevin û ev serkeftin bibe serkeftina milletê Kurd. Serkeftina Kurdistana Başûr serkeftina her çar perçeyan û ya Kurdên li hemû dinyayê dijîn e. Şerek di nav partî û rêxistinên Kurdan de derkeve Başûr-Bakûr-Rojava-Rojhilat wê hemû Kurd jê xisarê bibînin. Wek parlementerekî Kurd daxwaziya min ev e tifaq û yekîtî û têkiliya partî, rêxistin û şexsiyetê Kurdan bi hevûdu re hebe. Li Kurdistana Başûr daxwaza referanduma serxwebûnê heye divê em hemû rêz û hurmetê ji biryara wan re bigirin.

# Xeyala tunekirina kemalîzmê û rastî





HİŞYAR ÖZALP

Sala 2006'an bi vekirina hinek dozên bi navê Ergenekonê, hejmarek payebilindên Kemalîst hatin girtin, sala 2007'an destêwerdana leşkerî ya ku weke e-muhtirayê tê naskirin, ji aliyê AKPê ve bi tûndî hate têkbirin.

**BERÎ** referandûma 16'ê Nîsanê ya ku ji bo serastkirina 18 xalên destûra bingehîn a Komara Tirkiyê hate kirin û piştî wê jî raya giştî ya Bakurê Kurdistanê û hinek aliyên diyar li ser xalekê gotûbêj dikirin û digotin, eger encama referandûmê "belê" be, wê îdeolojiya Kemalîst were tunekirin. Ev gotûbêj niha jî berdewam e.

Lê di rastiyê de, tu pêwendiya wan xalên ku ketine referandûmê û hatine pejirandin bi tunekirina Kemalîzmê re nîne û her wiha tu mafên netewî jî nade Kurdistaniyan. Pakêta ku hatiye pejirandin, di rastiyê de rê dide ku Serokomar bibe takekesê xwediyê mafê birêvebiriyê.

Heger em berê xwe bidin dema derbasbûyî, emê bibînin ku ji dema AKP bûye desthilat, ango ji sala 2002'an ve tê gotin ku wê Kemalîzm bi destê vê partiyê were tunekirin. Emê niha hinekî li sedemên ku ev bawerî derxistin holê bikolin. Xala yekemîn ew e ku kadirên birêvebir yên AKPê ji nava Partiya Refahê hatibûn ku ew bixwe jî partiyeke îslamî bû û bi riya derbeyekê ji desthilatê hatibû dûrxistin. Ev yek bû sedem ku Tirkên sekuler bawer bikin ku ev kes bi hatina ser desthilatê, derfeta tolhildana xwe ji sîstemê bidest dixin.

Xala diwemîn ev e; sala 1902'an di Kongreya jontirkan de, di nava opozîsyona Osmaniyan de du baskên ji hev cuda derketin ku nerîna wan ya di derbarê pirsên siyasî yên serekî de dûrî hev bû. Ji wê rojê û heta roja me ya niha, dîroka siyaseta Tirkiyê bûye dîroka şerê di navbera van her du baskan de. Nûnertiya baskekî ji van pişt re ji aliyê Îttîhad û Terakî û dawiyê jî ji aliyê CHP ve hate kirin û AKPê jî xwe weke nûner û parêzvanê baskê din da nîşandan. Ev rewş bû sedem ku baweriya tunebûna baskê Kemalîst derkeve pêş.

Lê belê 16 salên derbasbûyî aşkere kirin ku hizra nehiştina Kemalîzmê weke îdeolojiyekê di nava birêvebiriya dewletê de lawaz bû û di dema dawî de bi temamî nema. Ji ber ku li gora ku tê dîtin, AKP weke partiyekê ji prensîbên avabûna xwe dûr ketiye. AKPê di programa partiyê de cihekî girîng daye fikrên ku xeta Mîrza Sabahattîn, Fikreya Îtîlaf û Hurrîyetê, Huseyîn Avnî û Menderes di dema xwe de nûnertiya wê dikirin. Li gora vê yekê AKP di salên destpêkê de partiyeke wiha diyar bû ku dixwest di siyaseta derve de hemahengiyê li gel welatên rojava û demokrasiya wan bike û ji bo endamtiya Yekîtiya Ewropa jî gavên berbiçav avêtin. Di siyaseta aborî de jî li gel aboriya bazara azad bû û ji bo xwe gihandin û rakêşana sermayeya biyanî gavên pêwîst davêtin. Di sîstema îdarî de jî dixwest merkeziyeta ademî bide rûniştandin. Di pirsa Kurdan de riya entegrasyonê dabû ber xwe û herçiqasî ne çarenûssaz û durust be jî hinek gav avêtin. Pêwîst nake mirov bibêje ku li hemberî îslamiyan nerm bû.

Dema em berê xwe bidin roja me, Komara Tirkiyê ya ku AKP tê de li ser desthilat e, pêwendiyên wê li gel welatên Rojava li ber têkçûnê ne, danûstandinên ji bo endamtiya Yekîtiya Ewropa rawestiyane, di siyaseta derve de ne cihê baweriyê ye û êrîşî derdora xwe dike, azadiya derbirîn û ragihandinê lê nema ye, sermayedarên biyanî jê direvin û hewil dide pirsa Kurdan jî bi riya rijandina xwînê çareser bike. Bûye dewleteke wiha ku piştgiriya demokratan ji dest daye, kesên ku ne li gora bîr û baweriya wê tevdigerin ji kar avêtine û desthilata dadweriyê lê nemaye. Ango hinek gavên pratîkî û yasaya ku îdeolojiya resmî ya desthilatdar, bandorê li ser hinek îdeolojiyên dijber dike û rastiya ku Kemalîzm weke vîrûsekê ketiye nava canê temamê siyaseta Tirkiyê ketiye rojevê. Erdogan û partiya wî AKP, Komara Tirkiyê li gora îdeolojiya Kemalîst birêve dibin.

Li cem raya giştî ya Tirkiyê, bendewariya tunekirina Kemalîzmê, piştî her hilbijartineke ku di berjewendiya AKPê de bi dawî dibe, (AKP ji roja avabûna xwe û heta niha di temamê hilbijartinên herêmî û giştî de jî biser ketiye) careke din zindî dibe. Sala 2006'an bi vekirina hinek dozên bi navê Ergenekonê, hejmarek payebilindên Kemalîst hatin girtin, sala 2007'an destêwerdana leşkerî ya ku weke e-muhtirayê tê naskirin, ji aliyê AKPê ve bi tûndî hate têkbirin û di sala 2010'an de guhertinên ku di destûra bingehîn de hatin çêkirin û guhertina pêkhateya Dadgeha Destûra Bingehîn û Encûmena Bilind ya Dozger û Dadweran HSYK bûne sedem ku ew hêvî herdemê zindî bimîne. Lê belê berovajî baweriya raya giştî, AKPê ji bo tunekirina Kemalîzmê tu gaveke berbiçav neavêt.

Beriya referandûmê, hinek aliyên nêzîkî AKP û Erdogan, temamê tawanên sîstema dagirker avêtin ser milê Kemalîstan û CHP. Ew weke çavkaniya êş û neheqiyê nîşan dan û xwestin Komara Tirkiyê bê tawan derxin. Dema ku aliyek weke berpirsê pirsgirêk û êş û azara Bakurê Kurdistanê were nîşandan, wê aliyê din ango AKP bê guneh derkeve û heger Kurdistanî piştgiriya wê bikin, li gora wan aliyan, wê pêkhateya kolonyalîst ya Komara Tirkiyê were guhertin û mafên netewî werin bidestxistin. Xwestin bi awayekî vekirî û veşartî jî vê bîr û baweriyê belav bikin û bibêjin, binerin derfeta nûjenkirina sîstema dagirker heye. Xwestin bi hêviyên vala xelk di referandûmê de dengê "belê" bikar bîne.

Piştî referandûmê, hinek aliyên siyasî yên Kurd ku serokê partiyan jî di nava wan de hebûn, digotin; wê bi hatina sîstema serokatiyê re Kemalîzm derbasî qonaxa tunebûnê bibe, wê Erdogan serxwebûna Başûrê Kurdistanê nas bike û li Bakurê Kurdistanê jî sîstemeke federal were avakirin. Beriya her tiştî, tu bingeh ji vê îddîayê re nîne ji ber ku AKP di gotara xwe de Başûrê Kurdistan weke "bakurê Iraqê" û alaya Kurdistanê ya ku li Kerkûkê hate hildan jî weke "potikekê" binav dike. Erdogan bixwe bi dehan caran diyar kiriye ku ewê serxwebûna Başûrê Kurdistanê nas nekin. Îddîaya ku wê Komara Tirkiyê derbasî sîstema federasyonê bibe, ne pêkenokeke jî ku mirov pê bikene. Tu xalên destûra bingehîn ya Komara Tirkiyê ku pişta xwe dide înkara Kurdan, rê nade peyrewkirina vê sîstemê. Birêvebirên AKP tu daxuyaniyên wiha nedane, berovajî vê yekê her demê bal kişandine ser pêkhateya dewletê ya yekpar.

Heman aliyan didane xuyakirin ku wê piştî referandûmê pêvajoya çareseriyê jî careke din dest pê bike lê vê carê wê partiyên derveyî PKK li ser masê bin û wê mafên netewî bêne bidestxistin. Lê dewleta dagirker her demê nîşan daye ku tu nêta wê û dayîna mafên netewî bo Kurdan nîne.

Hevdîtinên ku li gel PKK di bin navê pêvajoya çareseriyê de têne kirin, bi tenê ji bo çekdanîna wê rêkxistinê ne, ew ne ji bo gotûbêjkirina mafên rewa yên Kurdistaniyan e. Di encama wê pêvajoyê de, PKK û dagirkeran bi siyaseteke hevpar dest bi şerê xendekan kirin û dagirkeriyê careke din hebûna xwe li Kurdistanê rêk xist. Ji ber ku niha li Kurdistanê rêbaza aboriya dagirker tê pêkanîn, xelk di nava lepên xizaniyê de dinale û tirs ketiye her deverê.

Tiştê ku pêwîst e partî, rêkxistin û kesayetên Kurdistanî bikin, bilindkirina tekoşînê ye ji bo mafê çarenivîsê ku di nava hiqûqa navnetewî de jî bersiveke wê heye.

Berjewendiya Kurdistaniyan ne di wê yekê de ye ku di nava destûra dagirkeran de li çareseriyê bigerin, divê ew mafê diyarkirina pêşeroja xwe bidest xwe ve bînin.



Piştî referandûmê, hinek aliyên siyasî yên Kurd ku serokê partiyan jî di nava wan de hebûn, digotin; wê bi hatina sîstema serokatiyê re Kemalîzm derbasî qonaxa tunebûnê bibe, wê Erdogan serxwebûna Başûrê Kurdistanê nas bike.

ROJBIN ÖZKAN



## Jina Kurd; çavkanîya zimên

Zimanê dayikê nasnameya herî girîng û berbiçav e. Her gel di nav civatê de xwe bi zimanê xwe dide nasîn.

Kes kesî bi xuyangên wê ve nas nake. Bêguman kesê ku zimanê xwe nizanibe tu wateya nîjadê jî namîne.

Ê ku nîjadê dide nasîn ziman û çand e. Çand jî bê ziman nabe. Û helbet ziman jî bi xêra kedkar û pisporan ve digehîje nifşên nû. Dema em dibêjin; "Pispor" bila kesên xwedî bawername an xwedî berhemên nivîskî neyên bîra we.

Îro dost-dijmin giştik baş dizanin ku di gel zext, zordarî û asîmîlasyonên li hember Kurdan hatiye meşandin eger zimanê Kurdî li ser pîya mabe, ev xebat, ked û serkeftin para dayika Kurd e...

Wekî tê zanîn gelê Kurd di welatê mêtîngeran de dijîn…

Gelên ku ne bi serê xwe bin, perwerdeya zimanê dayikê tunebe, ne pêkan e ku zimanê xwe biparêze û bigehijîne nifşên nû. Lêbelê, zimanê Kurdî yek ji wan minakên herî baş e, digel ku ne zimanê fermî ye, ligel wê qasê dîsa jî nav zimanên cîhanê ên herî dewlemend de cihê xwe girtiye…

Vêca gelo dayika Kurd, rê û rêbazeke çawa meşandiye ku ev zimanê qedexekîrî heta îro li ser piyan maye?

Ez dibêjim DAYIK! Ji ber ku dayikatî dilovanîyeke bêhempa ye. Dayikatî lê xwedî derketin e. Dayikatî parastin e. Dayikatî hêzdarî ye…

Dayika Kurd, zimanê xwe bi hestên dayikatîyê himbêz kiriye û ji hemû xesarên hawêr parastiye.

Dayika Kurd, zimanê xwe wekî laçika spî ya serê xwe parastiye û nehiştiye tu lekeyek li wê laçikê bikeve…

Zimananîna kul û keserên xwe, gilî û gazindeyên xwe, lawîjên li ser mirîyên xwe lorînên li ser landikên zarokên xwe bi Kurdî ristiye…

JINA KURD ÇAVKANÎYA ZIMÊN E

Hz. Aîşe dibêje: "Eger hûn dixwazin zarokên we zimanê we baş hîn bibin, hingê divê zarokên we bi gundîyan ve têkildar bin."

Herweha Îmamşafiî jî Xwedê jê razî be, dîbêje: "Ez di zaroktiya xwe de ji bo erebiyeke baş bizanibim diçûm li gundan dimam"

Ji van mînakan jî em baş dîzanin ku kîjan ziman dibe bila bibe, çavkanîyên zimên ê herî bi bandor gund in. Pîrejinên Kurdan jî bi gelemperî li gund dijiyan, zarokên xwe jî bi ava vê kanîya zelal gojî dîkirin…

Îro kî bi Kurdî binivîse an bikaribe berhemên Kurdî bixwîne jê re dîbêjin: "Tu Kurdiya akademik bikartînî" Kurdî çiqas bûye zimanê akademîyê, an ne bûye? Bila ew bibe mijarên pisporan lêbelê rastîyek heye ew jî ev e; kesên li ser Kurdî lêkolînan dikin an jî ên wekî min bêyî ku lêkolînek li ser Kurdî bikin, tenê bi Kurdî dinivîsin herî zêde peyvên ji pîrejinên Kurdan bihîstîne bikartînin…

Gelek peyvên ku min di pirtûkan de nebihîstiye, min ji dayik an pîrika xwe ya rehmetî an jî ji pîrejinên gundî bîhistiye û ez wan peyvan di nivîsên xwe de bi kar tînim.

Helbet têşeya malbata Kurdan jî dibû sedem ku jin bêhtir bikaribin çand û zimanê xwe bigihînin nifşên nû. Lewre heta çend sal berê jî malbatên Kurdan bûk, xwesî, jintî û hwd. bi hev re dijiyan.

Di vê rewşê de jî mezînê malê xwesî bû, ku xwesî ne li jîyanê ba, hingê jintiya mezin dibû mezînê malê û neyartiya xwesîyê dikir û erka xwesîyê dida ser mile xwe.

Dibe ku jiyaneke bi vî rengî di nav xwe de zehmetên cur be cur jî bihewîne û dihewand jî. Bes bûkên ku di nav malbateke mezin de zarokên xwe mezin dikir, ne pêkan bû ku zarokan ji çanda kurdî dûr mezin bikin…

Ew pîrîkên ku neviyên xwe bi çîrokên Mem û Zîn, Stî û Fexrî, Xecê û Sîyabend çirçîrokên gelerî û bi stranên gelerî mezin dikirin; Bûne stûnê zimanê Kurdî…

Ji ber wêynê/rola wê ya girîng em dikarin bêjin nirxa jina Kurd di nav malbatê de gelekî girîng e. Lewre ê ku malbata Kurd birêve dibe bi gelemperî jin e. Û taybet pîrejin e…

Keda dayikên pîroz, di hemû rengên jiyanê de xwe nîşan dide.

Şayanê gotin û pesindayinê ye ku, îro em dibînin, li ser medya civakî de bi hezaran keç û xortên Kurdan bi zamane xwe peyamên sîyasî evînî û peyvên edebî parve dikin.

Parastina ziman, ji bo jina Kurd sedema xwedîderketina eslê xwe ye.

Di zaroktîya min de, dema yek bi Tirkî bipeyivîya pîrejinan ji wan re digotin: "We eslê xwe wenda kiriye."

Ev gotin, gotineke wîsa giran e ku erzê mirovan dişkênîne.

Ka kî dixwaze yek jê re bêje te eslê xwe wenda kiriye? Lewre zadeganî/esilzadebûn ji bo gelê Kurd tiştekî pîroz e.

Belê bê guman, wekî me li jor jî minak da keda jina kurd ya ji bo ziman kedeke bêhempa ye, lê mixabin şert û merc her ku diçe dijwartir dibe. Divê gelê Kurd zend û bendê xwe bade ji bo pêşeroja ziman têbikoşe. Lewre parastina ziman di nav jiyana nujen nav lepên malbatan de şemitiye.

Divê jina Kurd têbigehije ku tenê bi dirûşmeyên sîyasî wê nikaribin çanda xwe biparêzin. Parastina çandê bi beramberê parastina zimanê dayikê ye…

Jina Kurd ji vir şûn de ji bo ku keda dayikên xwe heba nekin; divê bêhtir li ser zimanê xwe û ji bo zarokên xwe û malbata xwe fêrî zimanê xwe bikin bixebitin. Divê bizanibin ku tolhildana herî mezin li hember neyarê Kurd, parastina ziman e. Xwedê neke, kengî neyar dît, zimanê Kurd têkçûye wê hingê xwe serkeftî bihesibînin…

Û mixabin di nav rewşa ziman ya îro de em nikarin bêjin ev xetere tune ye.

## Hilbijartinên Îranê

# Desthilata Îraniyan tepisandina Kurdan e!



ESKENDER CEIFERÎ







Li Îranê û Rojhilatê Kurdistanê sê rojên din hilbijartinên serokkomariyê û yên civatên gund û bajaran tênê encamdan. Her şeş aliyên Kurdî, ew hilbijartin baykot kirine. Take aliyê ku beşdar e Eniya Yekgirtiya Kurd e ku dengê xwe jî dide reformxwazan û kesên ji tevgera Hesen Rûhanî. Ew rêxistin, di nav xwe de rastî pirsgirêkan hatiye. Du rojan beriya niha Hamîd Ferazî yek ji serkirdeyên wê rêxistinê dev ji wê berda. Ferazî di nameya xwe de li ser devjikarberdanê daxuyand ku gelek ji endamên rêveberiya wê rêxistinê tenê ji bo nîşandana navê xwe bûne rêveber û karekî bi nirx ji Kurdan re nakin. Herwisa got ku ew tenê di heyamên nêzîkî hilbijartinan de tevgerên xwe zêde dikin û Ferazî vî karî bi baş nabîne. Got ew êdî dev ji eniya Yekgirtiya Kurd berdide bila kesên ku mîna wî nafikirin, bikarin di rêbaza xwe de serkeftî bin.

Rast e, Komara Îslamî, hemû wan şeş berendaman qebûl dike û kijan ji wan derkeve, ji wan re weke yê din e. Lê ew di nav xwe de jî rastî pirsgirêk û aloziyan hatine. Malper û ragihandinên girêdayî Sipaya Pasdaran, qet pişta Rûhanî nagirin. Hatiye bîra wan ku birayekî Rûhanî 38 salan beriya niha erdek bê pere ji dewletê wergirtiye û ji vê mijarê weke mînaka bikaranîna milkên giştî ji aliyê malbata Rûhanî ve şahîdan tînin. Belkî wan jî bîr kiribe ku her yek ji berendamên din jî weke Rûhanî dema ku rêveberê saziyekê bûne, berîk jî tijî kirine û pişt re carna dosyeyên gendeliyê li hemberî wan bûne doz. Şeş namzed bi navên Hesen Rûhanî, Mihemedbaqir Qalîbaf, seyîd Îbrahîm Reyîsî, Îshaq Cehangîrî, seyîd Mistefa Mîrselîm û seyîd Mistefa Haşimîniya hevrikiyê dikin û di berjewendiya xwe de li ser televizyona fermî ya Îranê behsa hemû dosyeyên her yek ji namzedên din dikin.

Çalakvanên ku hin tundtir in, dibêjin Komara Îslamî tenê dixwaze navendên dengdanê vala nebin. Ew behsa daxuyaniya Elî Xamineyî rêberê Komara Îslamî dikin ku got ji min re girîng nîn e hûn dengê xwe didin kê. Tenê ya girîng ew e ku hûn xwe nîşanî dujminên Komara Îslamî bidin. Hin çalakvanên navxwe dibêjin Kurd divê deng bidin lê Cemal Azadî rojnamevanê Kurd dibêje ew kes difikirin ku Îran dikare rê li ber demokrasiyê veke. Cemal Azadî tekezê dike ku vê dawiyê çend hilbijartinên azadane weke yên Amerîka û Fransayê li welatên din hatine encamdan. Lê ti yek ji berendamên wan, bikuj nebûn. Cemal Azadî dibêje wan şeş berendamên serokkomariya Îranê biryara kuştin, darvekirin û êrîşa ser xelkê dane ji ber ku tevahiya wan, beriya niha xwediyên postên ewlehî û dadweriyê bûne.

Bijen Qehremanî çalakvanê Kurd yê Rojhilat dibêje gelek ji kesên ku ji bo hilbijartinên civatên gund û bajaran selahiyet standine, navên wan di dosyeyên gendeliyê de hene. Bi vê biryarê jî xelk neçar dimîne here ser sindûqên dengdanê û ji bo rêgirtin ji qebûlbûna kesên gendel, deng bide. Lê mifaha herî zêde, Komara Îslamî dibîne. Ji ber ku wê hejmara dengderan zêde bibe û kes pirs nake deng didî kîjan berendamî.



Çalakvanekî Fars bi navê Mihemed Mîrjaferî bi rengekî din difikire. Ew weke gelek ji siyasiyên din yên Fars dibêje bi baykota hilbijartinan tiştek çareser nabe. Mîrjaferî dixwaze xelk dengê xwe bide kesekî baş bila kesekî li gora wî xirab, nebe serokkomar û tekezê jî dike ku Komara Îslamî rewatiya xwe ji xelkê standiye.

Ew nerîna gelek ji çalakvanên din yên Fars e jî. Lê hemû Kurdan jî hilbijartin boykot nekiriye. Hin nivîskarên Kurd jî hene ku pişta dewletê digirin. Ferhad Emînpûr û Rizgar Lutfî dibêjin em endamên ti partiyekê nîn in. Lê reformxwaz behsa mafên Kurdan dikin û emê dengên xwe bidin wan. Ferhad Emînpûr behsa nasyonalîst û netewexwazên Kurd dike û dibêje pêwîst e ew hin guhertinan bi ser xwe de bînin. Belkî mebesta wî ji vekirîbûna dewleta Rûhanî, dayîna derfeta derxistina heftenameya Gelawêj be ku li Sine du heftiyan beriya niha derket. Lê dibe em çavên xwe li ber qedexekirina dehan rojname, malper û belavokên Kurdî di dewleta Rûhanî de bigirin ku bikarin vê gotinê bînin ziman.

# Ragihandina sînordar li Rojhilat



Dayîn û standina zanyariyan li Îranê û Rojhilatê Kurdistanê, kontrolkirî û qedexe ne. Dibe ku rojnanevanek ji ber belavkirina nûçeya girtina kesekî yan jî zanyariyên li ser darvekirina kesekî, bi salan bê girtin. Li wir fîltera zanyariyan heye ku divê di berjewendiya hikûmetê de bin. Li gora benda 12'min a Danezana Gerdûnî ya Mafên Mirovan ku ji aliye Neteweyên Yekbûyî ve di 10'ê berfanbara 1948'an de hate pejirandin, ti kesek nabe ji ber sedemên weke jiyana arizî, malbat xanî an jî ragihandinê, rastî ziyanê bê.

Li wî welatî, qet ne Zertiştiyan ne Behayiyan û ne jî Yarsanan mafê derxistina tenê belavokekê jî nîn in. Ev jî yasayên exlaq û azadiyan bin pê dike ku li gora wê, mafê her kesî yê azadiya ji bo raman, wijdan û olê heye. Eger jî di asta cîhanî de tê gotin ku mafê her mirovî heye ku bi serbestî beşdarî li jiyana çandî ya civakî bike, lê li Îranê eger ew mirov girêdayî ola Îslamê nebe, jê re pir dijwar çê dibe ku beşdarî karûbarên ragihandinê bibe.

Li gora benda 731 ya Yasaya Cezayên Îslamî li Îranê, her rojname, malper yan ragihandinek ku zanyariyeke li dijî hikûmetê belav bike û partî û aliyên dijber ên Komara Îslamî bikarin li dijî hikûmetê mifahê ji wan zanyariyan bistînin, wê demê ew malper yan sazî tê cezakirin ku wan zanyariyan belav dike. Kesê ku bi vê tometê tê darezandin bi dayîna pere ji şeş milyon Tumenan heta çendîn salan girtinê tê cezakirin. Herwisa bendên 747 û 748'an yên yasaya navbirî, amaje dike ku eger kesê tometbar bibelavkirina zanyariyên lidijî hikûmetê, karmendê dewletê be, dibe ku tevî dûrxistina wî ji kar, rastî girtinê yan jî derbeyên qamçoyê bê.

Tevahiya saziyên ragihandinê yên çapkirî li Îranê, çi yên dewletê û çi jî yên derveyî desthilatê, divê derfeta çalakiyê ji wezareta Çanda Îslamî bistînin. Ew di dema standina derfetê de hin belgeyan îmze dikin ku têde amaje dike daxwazker nabe ti çalakiyekê li dijî hikûmetê encam bidin ku bikare di berjewendiya partiyên dijber de be.

Li Îranê tenê dewlet dikare xwediyê televizyonan be. Xelk yan xwediyên sermayeyan jî dikarin çend demjimêran ji bo programekê ji xwe re bikirin. Lê mafê wan yê avakirina TV û radyoyan tine ye. Ew tenê dikarin belavokan bi wergirtina derfetê ji dewletê çap bikin.

Mehdî Kerûbî berendamê serokkomariya çend geran beriya niha, Elî Muteherî parlamenter û hin kesên din dixwastin derfeta avakirina radyo û televizyonê bistînin. Lê tevahiya wan daxwaziyan hatine redkirin. Sedem jî ev e ku rêveberiya saziya televizyona wî welatî ku weke Deng û Rengê Komara Îslamî tê binavkirin, di bin çavdêriya rasterast ya Elî Xamineyî rêberê Komara Îslamî de ye. Bi vî rengî jî li Îranê û Rojhilatê Kurdistanê, tenê Xamineyî xwediyê radyo û televizyonan e.

Ew ragihandinkar û rojnameyên ku li gora yasaya wan, binpêkarî encam dane, di yek ji van sê dadgehan de dikarin bêne dadgehîkirin: Eger rêveberên saziyan li hemberî wan gilî kiribin, li Dadgeha Çapemeniyê têne darezandin. Eger li gora ku ew dibêjin, ewlehiya neteweyî aloz kiribe, li Dadgeha Çand û Ragihandinê têne darezandin. Eger jî Rûhulla Xumeynî avakerê Komara Îslamî yan jî Elî Xamineyî rêberê niha yê Komara Îslamî rexne kiribin, li Dadgeha Şoreşa Îslamî têne darezandin. Sedem jî ew e ku mafê kesî nîn e wan du kesan rexne bike.



# Heftiyek mafên mirovan li Rojhilatê Kurdistanê



Feramerz Mamedî ku salek beriya niha li Selmasê bi danîna kefaleta 100 miylon Tumenî hatibû berdan, divê car din here girtîgehê. Ew bi tometa hevkariya bi partiyên Kurdî re li dadgeha Urmiyê bi 3 salan girtîgehê hatiye cezakirin.

Li girtîgeha Recayîşehr a navenda Îranê rê nadin girtiyekî Kurd î bi navê Fuad Rizazade ji bo çareseriya tendirustî here derveyî girtîgehê. Ew ji 4 salan beriya niha ve di girtîgehê de ye û bi tometa hewldana lidijî ewlehiya Îranê bi 5 salan girtinê hatiye mehkûmkirin.

Mihemed Sidîq Kebûdvend xelkê bajarê Sine û çalakvanê Kurd û serokê girtî yê Rêxistina Mafên Mirovan li Kurdistanê ku havîna 2007'an hatibû girtin, piştî 10 salan, bi danîna kefaletê azad bû. Tometa wî deh salan beriya niha "propagandeya li dijî Komara Îslamiya Îranê û alozkirina raya giştî di rêya avakirina rêxistineke mafên mirovan" de bûn.

Hîwa Kiyayî û Mehdî Selahî ku çalakvanên komonîst in, li ser biryara wezareta Dad ji mafê destnîşankirina parêzer bêpar in. Ew tometbar in ku di Telegramê de di derbarê mijarên weke karkirina zarok û jinan de nivîsên cuda belav kirine.

Li Seqizê herî kêm şeş çalakvanên Kurd bi navên Hamid Nebatî, Mistefa Misrî, Siyamend Salihî, Mehmûd Salihî, Usman Ismaîlî û seyîd Elî Husênî di derbarê rêwresma roja cîhanî ya Karkeran de ji aliyê hêzên ewlehî ve rastî lêpirsînê hatin. Mehmûd Salihî ku beriya niha li girtîgehê gurçikên xwe ji dest dabûn, di rêwresma cejna Karkeran de jî rastî lêdanê hatibû û birîndar bûbû.

Zeyneb Celakiyan girtiya mehkûm bi hebsa hertimî li girtîgeha Xoyê ji ber ku rê bi çareseriya bijîşkî li derveyî girtîgehê jê re nayê dayîn, kete gireva heban. Niha çavên wê di metirsiya korbûnê de ne û pêwîst e li nexweşxaneyên çav li derveyî girtîgehê çareserî jê re bê kirin.





Pêleke nû ji gazîkirina kesûkarên endamên partiyên Kurdî ji aliyê saziyên ewlehî ve li bajarên Sine, Urmiye, Kirmaşan û Seqizê dest pê kiriye. Saziyên navbirî ji wan malbatan re ku yek ji endamên wan di nav refên partiyên Kurdî de ye, dibêjin pêwîst e hûn zarokên xwe razî bikin ku zanyariyan li ser tevgerên partiyan bidin me û hevkariya me bikin.

Li navçeya Mirgever a Urmiyê 6 ciwan ji bo Îtilaata wî bajarî hatine vexwendin û lêpirsîn bi wan re hatiye kirin. Sedema lêpirsînê, beşdariya wan di rêwresma Newrozê de bû. Li Rojhilatê Kurdistanê tevî qedexekirinê, Newroza îsal ji aliyê xelkê ve bi germî hatibû pêşwazîkirin û ew jî bûye sedema vexwendin û lêpirsîna saziyên ewlehî yên Îranê bi ciwanên Kurd re. Ew, wan ciwanên Kurd ku tevlî rêwresmên Newrozê bibûn, bi alîgiriya partiyên Kurdî tometbar dikin.

Di berdewamiya xwekujiyê de jineke 62 salî ya xelkê bajarê Tikabêli gundê Sarî Qorxanê li navçeya Hewşar jiyana xwe bi dawî anî. Navê wê Zeyneb Sehrayî ye ku roja 08.05.2017'an ji ber desttengiyê xwe daliqandiye û dawî li jiyana xwe aniye. Li Kirmaşanê jî jineke Kurd bi navê "M.Ş" ji aliyê kurê xwe ve bi sedemeke nediyar hate kuştin.

Li gora çavkaniyên fermî yên Sipaya Pasdarên Îranê, Qudretulla Diyalme berpirsê giştî yê rêveberiya Îtilaata parêzgeha Sine dibêje ewê navend û cihên partiyên Rojhilatê Kurdistanê têk bibin û jinav bibin. Wî nerpirsê bilind yê Îranî di derbarê hebûna asayîşê de li parêzgeha Sine û navçeyên sînorî got ku eger ew hêzên Kurdî li dijî Komara Îslamî derbasî nav axa Îranê bibin, Îran wê bi hemû şiyana xwe ji bo jinavbirina wan tev bigere.

## Kêşeya Filîstîn û Îsraîlê berdewam e

# Hamas li gor sîyaseta cîhanê tevdigere?





DERYA KILIÇ

**Tekoşîna di navbera Îsraîl û Filîstînê de pirsgirêka bê çareserî ya herî mezin ya cîhanê ye. Lê di vê mijarê de rûdanên germ jî hene. Piştî hevdîtina Serokê Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê (DYA) Donald Trump li gel Mahmûd Abbas û vîzyona siyasî ya nû a Hamasê liv û tevgerên nû derketin holê.**

**SEROKÊ** Polîtburoya Tevgera Berxwedana Îslamî a Filîstînê (Hamas) Xalid Meşal, di 1'ê Gulana îsal de li Dohaya paytexta Katarê konferanseke rojnemavanî lidar xist. Xalid Meşal, di derheqê vîzyon û siyaseta nû ya Hamasê de agahî dan.

Hamasê nexşerêya siyasî ya nû, beriya serdana Serokê Rêveberiya Filîstînê Mahmûd Abbas a ji bo Waşîngtonê û amadekirina proseyeke nû ji aliyê îdareya Serokê Amerîkayê Donald Trump ve bê amadekirin, hat ragihand. Piştî bi serketina Hamasê di hilbijartinên 2006'an ên Filîstînê de şer di navbera Hamasê û El Fetîhê de derketibû. El Fetîhê xwestibû dest deyne ser îdareyê. Di encama vî şerî de jî Rojavayê Şerîa ji El Fetîhê re ma û Gazze jî ket bin îdareya Hamasê. Ji wê rojê vir de jî navbeynkariya di nav her du aliyan de encam nedan û kêşe heta niha jî didome. Lê belê piştî belavkirina vê belgeyê Hamas dixwaze tevlî refên Hêza Azadiya Filîstînê (FKÖ) bibe. Her wiha Serokê Îdareya Xweser a Filîstînê Mahmûd Abbas jî berîya hevdîtina li gel Serokê Amerîka Donald Trump ji her du aliyan xwestibû ku vê perçebûnê bidawî bînin. Zeft li ser Hamasê kiribû û gotibû ku em ê mûçe û alîkariyê nedin Gazzeyê da vê kêşeyê ji holê rakin.

Her wiha di hilbijartinên Serokatiya Polîtburoya Siyasî ya Hamasê de Îsmaîl Haniyye di cihê Xalid Meşal de wek serok hat hilbijartin. Ev yek jî li gor nexşerêya Hamasê ku tê de digot em ê 'Siyaseta pragmatîst bimeşîn in' jî piştrast dike.

**Armanca Hamasê çiye?**

Hamas, bi vê belgeyê dixwaze xwe ji nû ve ava bike û li ser zemîna meşrû bibe hêzeke cîhanî. Her wiha deriyên nû di têkiliyên li gel Misir, Welatên Kendavê û Dewletên Rojavayî re ji bo Hamasê vedike. Li aliyê din, Hamasê daxwaza piştgirên xwe yên Tirkiye û Katarê ku dixwestin Hamas guhertinên xwe yên ku di pratîkê de kirine li ser belgeyên xwe yên siyasî jî nîşan bide, bicîh anî. Tevgerê, di navbera 1993-2005'an de li hember sivîlên Îsraîlî êrîşên xwekûjî pêk anîbû. Hamas, li Kanada, Yekîtiya Ewropa, Îsraîl, Japonya û DYA'yê di lîsteya terorê de ye. Baskê leşkerî yê Hamasê, Lîwaya Îzzeddîn El Qassam jî li Awusturalya û Brîtanyayê di lîsteya terorê de ye.

Piştî pejirandina hebûna Îsraîlê, Hamasê têkiliyên xwe ligel Îhvanî Muslîmînê ji nû ve şîrove dike. Meşal, Îhvanî Muslîmînê wek "Tevgera herî mezin ya Îslamî a serdema me" dipejirîne û dibêje "Hamas aliyekî îhvanê yê Filîstînî ye". Meşal, cudahiyê jî wiha tîne ziman: "Hamas, ji aliyê fikrî ve endamê ekola Îhvan e. Lêbelê em tevgereke Filîstînî a serbixwe ne."

**"Hamas tenê dikare li ser zemîneke realîst siyasetê bike"**

Mamosteyê Zaningeha Yildirim Beyazitê Prof. Dr. Mustafa Sıtkı Bilgin gavên Hamasê yên nû û kêşeya Îsraîl-Filîstînê ji Basê re nirxand. Bilgin dibêje: "Hamasê got ku eger Îsraîl vegere hidûdê beriya 1967'an em ê Îsraîlê binasin. Ev ji bo Hamasê gaveke nû ye. Ji aliyê din ve divê em li rewşa Hamasê binêrin ka çawa hatiye vê rewşê. Ew Hamasa ku digot em ê heta dawiyê li hember Îsraîlê di tekoşînê de bin û niha dibêje em ê Îsraîlê binasin ji bo kêşeya Filîstînê kêm be jî mirov hêvîdar dike. Lê Hamas, pêdiviya siyaseta realîst dît. Bi şertên Rojhilatanavîn jî derxist." Bilgin dibêje ku êdî qet şansê Hamasê nemaye. Eger bixwaze siyasetê bike tenê dikare li ser zemîna realîst bike.

Bilgin, sedema destnîşankirina hidûdên pêşiya 1967'an ji aliyê Hamasê ve wisa dinirxîne: "Vekişîna hidûdên pêşiya 1967'an jî girîng e. Îsraîlê di şerê 1967'an de Qidûs bi dest xist. Hamasê ji bo têkiliyên xwe ligel Rojava xurt bike ev belge parve kir. Lê êrîşên Îsraîlê destnîşan dikin ku ev gava Hamasê jî astengî li pêşiya hewldanên Îsraîlê yên firehkirina xaka xwe nake. Hevdîtinên dîplomasî yên dewletên Ereban, an jî nasîna Îsraîlê ji aliyê Hamasê ve jî vê kêşeyê çareser nake."



### Şerê sedsalî çareser nabe

Trump, li Qesra Spî di 3'yê meha Gulanê de hevdîtinek li gel Mahmûd Abbas pêkanî. Di presskonferansa (civîna çapemeniyê) Trump û Mahmûd Abbas de Trump diyar kir ku ev biryara ku ji aliyê Abbas ve hatiye îmzekirin dê aştiyê, îstîkrarê, hizûrê bîne Rojhilatanavîn, Filîstîn û Îsraîlê. Ez piştgiriya Mahmûd Abbas dikim di vê mijarê de. Trump, destnîşan kir ku piştgiriya lihevhatineke mayînde dike û got, "Lêbelê tu lihevhatin bi zordariya DYA an jî welatekî din nayê kirin. Divê Filîstînî û Îsraîlî ligel hev bixebitin û her du alî jî li ser esasên aşitiyê bigihîjin encamekê. Ez jî navbeynkarî, çi divê amade me bikim. Em ê vê kêşeyê çareser bikin" Abbas jî destnîşan kir ku çareseriya bi du dewletî dê li hember tekoşîna dijî terorê jî tesîreke erênî bike.

"Gelo Trump dê biçe Filîstînê?"

Abbas di 10'ê Gulanê de piştî hevdîtina Serokkomarê Almanyayê Frank-Walter Steinmer da zanîn; 'Em çaverêyî serdana Trump a nêz de ku dê serdana Bajarê Beytullahim ku di bin dagirkeriya Îsraîlê de ye bike ne.' Qesra Spî di derheqê serdana Trump, ji bo Filîstînê de ti daxûyanî nedan e. Lêbelê yekem serdana Trump ji bo derveyî Amerîka, di serî de Erebîstana Siûdî, welatên Kendavê û Îsraîlê ye.

"Çareseriya bi du dewleta jî ne mimkûn ne"

Pisporê Filîstînê yê Dezgeha Siyaset, Ekonomî û Lêkolînên civakî (SETA) Bilal Salahmey ji Basê re kêşeya Filîstîn- Îsraîl û serdana Mahmûd Abbas ji bo Waşîngtonê nirxand. Salahmey dibêje: "Zehmet e mirov ji niha ve bibêje ku dê proseyeke nû ji bo kêşeya Filîstîn- Îsraîlê dest pê bike. Di hevdîtina Trump û Mahmûd Abbas de jî ji çareseriya siyasî zêdetir ewlehiya Îsraîl hat axaftin. Hê nexşerêya îdareya Trump di derheqê pirsgirêka Filîstîn- Îsraîlê de nehatiye belavkirin. Ji aliyê din ve îdareya Filîstînê di heman demê radigihîne ku piştgirê riya siyasî ye. Lê Îsraîl herdem nîşan dide ku ne piştgirê çareseriyê ye" Salaymeh, çareseriya bi du dewleta jî ne mimkûn e.

Salaymeh destnîşan dike ku Trump jî mîna hemû serokên berê yên Amerîka dê piştgirê Îsraîlê be û wiha pê de diçe: "Dibe ku Trump bi awayekî vekirî piştgiriya Îsraîlê bike. Diyarkirina Balyozê Amerîka yê Îsraîlê David Friedman jî nîşaneya vê yekê ye. Friedman, bi piştgiriya bicîhbûna Rojavayê Şerîayê, li hember derketina dewleta filîstînê û bi bersivdayînên li hember rexnegirên Îsraîlê, tê zanîn"

Salaymeh balê dikşîne 1967'an û dibêje: "Avahiyên li Rojavayê Şerîayê piştî dagirkirina 1967'an dest pê kiribe jî, bi taybetî piştî partiya Lîkud di sala 1977'an de bû hikûmet ev avahî bi awayekî bi îstîqrar berdewam kirin. Serokê Lîkudê Netenyahu, hevpeymaniya ku ligel partiya rast a tund û partiyên tundrew kiriye nîşaneya berdewamkirina vê siyasetê ye. Li gor daxûyaniya dawî ya Îsraîlê dê 15 hezar avahî bên avakirin. Ev biryar, piştî biryara 2334 a Konseya Ewlekarî a Neteweyên Yekbûyî hat dayîn. Ev yek jî destnîşan dike ku Îsraîl, biryarên NY û Hiqûqa navnetewî nas nake. Ev kiryarên dij-hiqûqî ji çareseriyê dûr dixîne."

---



HOŞENG OSÊ

## YNK, PKK û "qantona" Sulêmaniye

"Ji dîrokê re; Rastiya Artêşa Azad û Yekîneyên Parastina Gel (YPG)" (3.5.2017). "Li Efrînê û Şehbayê amadekariyên mûsima çinînê tê kirin" (4.5.2017). "Siyasetvanek Kurd: Pêwiste ku partiyên Kurdî li hember siyasta Tirk dest bi yek kin" (4.5.2017). "Heleb; Roja Zimanê Kurdî hate pîrozkirin" (6.5.2017). "HPC-Jin li hember êrîşên dewleta Tirk xebatên parastinê xurt dikin" (7.5.2017). "Artêşa dagirker (Tirk) nahêle ku cotkar berhemên xwe biçinin" (7.5.2017). "Radyoya FM ya Efrînê dîsa dest bi weşanê kir" (8.5.2017). "Tevgera Azadiya Jinên Êzdî ên Ewropa hate damezrandin" (8.5.2017). "Gera dîrokî li Rojavayê Kurdistanê-2" (8.5.2017).

Ev nûçe û nivîs ne di malper yan jî ajansên weke ANF yan ANHA...hwd ku girêdayî PKK - PYDê de ne hatine belav kirin, lê di malpera fermî ya Yekîtî Niştimanî Kurdistan de di PUK Media de hatine belav kirin. Ev nûçe û nivîs û deh qatên wan jî di vê malperê de hene, eger mirov bixwîne dê şok bibe û matmayî bimîne û ji xwe pirs bike: Gelo ev ji kengî ve ye, ewqas YNKê bi pirsa Kurd a li bakur û rojava, ji başûrê Kurdistanê û Sulêmaniyê jî bêhtir mijûl dibe? Yawo, YNKe ya ku hema hema Sulêmaniyê ji Kurdistana Başûr qut kiriye, gelo dixwaze bi Amed û Qamişlo an jî bi Eferînê ve girê bide?

Birastî, dema hevalekî min ku ew jî nivîskar e ji Suleýmaniyê l imin geriya, ji min re got ku ev parêzgeh, bi saya serê Mela Bextiyar, Hîro xan û serkirdeyê YNKê, êdî bûye "qantonek" ji kantonên PKKê. Min bawer ne kir. Lê dema min li malpera PUK Media nêrî, min ji xwe re got: Bi Xwedê rast e. Ev kegnî ewqas xwîna PKKê bi YNKê bûye hingiv?

Dema mirov li têkiliyên di navbera PKKê û YNKê de vegere, dê bighêje hin encamên balkêş. Di sala 1983an de PKKê xwest şer û pevçûnên di navbera PDKê û YNKê de rawestîne, lewma şandeyeke bi serokatiya Mehmed Karasungur (1947-1983) rêkir, lê berî ku Karasungur û hevalê wî Îbrahîm Bîlgîn, bighêje serkirdayetiya YNKê bibîne, li herêma Qandîlê di 2.5.1983an de hatin kuştin. Guman hene ku Nuşîrwan Mustafa fermana kuştina Mehmed Karasungur û Îbrahîm Bîlgîn daye. Jixwe her kes dizane ku Mehmed Karasungur ji damezrênerên PKKê bû û endamê komîteya navendî bû û berpirsê karûbarên leşkerî ê wê çaxê yê PKKê bû.

Rojnameya fermî û navendî a PKKê "Serxwebûn" di rûpela yekem de di hejmara 18ê hezîrana 1983an de nûçeya "şehîd"bûna Mehmed Karasungur belav kiriye û YNKê tawanbar kiriye. Di rûpela dawî ya eynî hejmarê ya "Serxwebûnê" de hevpeyvîneke li gel serokê PDKê Mesud Barzanî jî heye. Di rûpela 2an ji hijmara 19e tîrmeha 1983an de nûçeya hevdîtina di navbera serokê PKKê Abdullah Öcalan û serokê eniye ya CUD: (PDK-Î, PKÎ, PSK, PASOK) belav bûye. Li gorî nûçeyê hevdîtin di 6.7.1983an pêk hatiye. Di rûpela 10 ji eynî hejmara "Serxwebûnê" de peymana di navber PKKê û PDKê de hatiye belav kirin. Hin xalên vê peymanê, di nivîseke xwe yên "Basnews"ê de min diyar kiribûn. Mebesta min ji van agahiyan ev e ku piştî YNKê Karasungur kuşt, PKKê xwe nêzîkî PDKê kir û peyman pê re mor kir. Piştî 5 salan li ser kuştina Karasungur re derbas bûn, rojnameya "Serxwebûn" di rûpela yekemîn ji hejmara 77an, a gulana 1988an de nûçeya mor kirina peymana di navbera PKKê û YNKê belav kiriye. Piştî mor kirina peyman û protokolê bi 4 salan di sala 1992an de û li pêşiya perlemanto ya herêma Kurdistanê, Mam Celal Talabanî, serokê YNKê axivî û bi tundî rexne li PKKê kir û ji partî û rêxistinên Kurd xwest ku di gel artêşa Tirk şerê PKKê bikin û baş tê zanîn ku di payiza 1992an de YNK û PDK di gel artêşa Tirk şer kirin. Tevlî ku endezyarê wî şerî Mam Celal bû, lê YNKê xwe ji şer vekişand û yek alî bi PKKê re peyman mor kir û PDKê bi tenê hişt.

Di sala 1993an de û li ser daxwaza serokkomarê Tirkiyê Turgut Özal, Mam Celal bû navbeynkarê aştiyê di navbera PKKê û Enqere de. Di 26.8.1995an de, bi destek û piştgiya YNKê, PKKê êrîşî PDKê kir. Baskê leşkerî yê PKKê wê çaxê ARGK (Artêşa Rizgariya Gelê Kurdistan) daxwiyaniyek derbarê vê êrîşê de derxist û "Serxwebûn" di rûpela 15 ji hejmara 164an Tebaxa 1995an de belav kir. PKK - ARGK di vê belavokê de êrîşa xwe li ser PDKê weke "15ê Tebaxa" duyemîn bi nav kir. Her wisa tê zanîn ku 15ê tebaxa yekemîn di 15.8.1984an de li dijî dewleta Tirk bû û weke destpêka dîroka têkoşîna çekdarî ya PKKê ye. Ango PKKê êrîşa xwe bi piştgiriya YNK li dijî PDKê weke êrîşa li dijî dewleta Tirk dibîne. Lê PKKê di wê êrîşê de têkçû.

\-\-\-

Nivîs berdewam e

# Barava, çîroka du niyazan



FAWAZ HUSÊN

Di her berhemê de, piraniya caran, hevoka pêşîn gelekî balkêş e. Mirov nizane gelo nivîskar bi rastî dest bi wê dike, an piştî ku ew berhemê diqedîne dîsa lê vedigere û bi rêk û pêk û bi bêhna fireh hildibijêre. Kesên ku edebiyata fransî dişopînin dizanin bi kîjan hevokê Marcel Proust dest bi "A la recherche du temps perdu", ango "Li pey dema windabûyî" dike û Albert Camus jî, di destpêka Biyanî de. Barava, çîroka yekem ji berhema "Çar Yek" a Ciwanmerd Kulek bi vê hevokê dest pê dike: "Sînema Nadir yekem kes bû ku ji Barava reviya."

Sînem, keça zaro, ji malê direve û di dirêjahiya vê revê de, ew keys û firsetê dide nivîskarê xwe ku beşekî mezin ji dîroka miletekî, rabûn û rûniştinên wî û edetên revandinê, heyf hilanînê û perîşaniya wî, radixîne ser rûpelan. Sînema piçûk direve, lê bi tenê û ne weke diya xwe Helîma bi mêrekî re. Ew li malê hêrs dibe û di rêwîtiya xwe de dibe xwedî kesayetî û xwe vedinase. Ew di nava xwezayê de dibe jin û cara pêşîn dibîne çawan xwîn ji birîna nav ranên wê tê. Ew li wan rastan pêrgî nêçîrvanekî tê û ew dibe hevbeşê wê û jiyanê. Îsayê Ûsiv ne weke her kesî ye, mirovekî sade û kawikî ye, bawer dike ku ew miriye û di bihiştê de dijî û pergî periyekê, horiyeke xwedayî, tê. Gava ew Sînemê di nav rezan, di bin mêwekê de dibîne, ev yek destan û efsaneyên yewnanî tîne bîra mirovan û çawan cejna Diyonîsos û jîn û jiyanê di wan demên kevnare de, bi tirî û meyê dihat pîrozkirin. Lê ji ber navan, Îsa bêhtir Tewratê tîne bîra xwendevanên vê çîrokê çunku ew kurê Ûsiv e û bi ser de jî, navê diya wî Meryem e, lê wan rastan, di wê revê de, hîç pêjna Xwedê nayê. Bi pêrgîna Sînem û Îsayê Ûsiv, jinek û mêrek digihîjin hev û jixwe heryek dizane, gava jinek û mêrek bi tenê bi hev re bin, kesê sisiyan, bila di bihiştê de be jî, kî ye.

Vebêjerê çîrokê nasnameya xwe bi hêsanî belî dike û hîç çivan nade xwe û xwe ji xwendevanan venaşêre. Paşnavê wî Kulek e, weke yê Ciwanmerd. Ew mamoste ye jî, lê niyaz û mebesta wî ji jiyanê ew e ku bibe nivîskar, ne tenê ev yek, lê nivîskarekî bi zimanê kurdî. Ew li qetekî digeriya û werîsek bi destê wî dikeve gava rastî Sînemê û serpêhatiya wê ya dewlemend û seyr tê. Ew keysê jî dibîne û wê gavê tevnê dîroka miletekî, miletê kurd û zimanekî jî, zimanê kurmancî, dirêse. Hindik hindik, ahiste ahiste, ew xwe bi ser dîroka kurdên Bakur de xwar dike û guhertinên mezin ên sedsala bîstan rêz dike. Yek ji wan bûyeran ketina împeratoriya Osmanî ye. Dawiya şerê mezin, tenê yek ji gundê Barava vedigere malê, ew leşkerekî ku ji mirina mezin filitiye : "Şerê mezin qediyabû lê tu mêrek venegeriyabû. Ji bilî Emerê Hemo. Ji Diyarbekirê heta gund bi bazdan, bêyî ku li ciyekî bisekine, hatibû û bi qîreqîr bang kiribû ku împeratoriya Osmanî hilweşiyaye, xelîfê îslamê, sultanê dewletê reviyate." (r. 16). Weke leşkerê ku nûçeya serkeftina Marathonê guhest yewnaniyên Atênayê, ew jî piştî wê beza dirêj dimire û di goristana gund de tê veşartin. Lê leşkerê kurd hîç agahiya xêrê û pîroziyê bi xwe re nayîne, bi tersî wê yekê, kul û derdên kurdan ê ji wê gavê li pey hev bêhtir rêz bibin. Nivîskar helbet berhemek dîrokî nanivîse, lê dîrok, yaxut tarîx bi xurtî derbasî çîroka Sînema Nadir dibe û bandora xwe bi tundî, bi xurtî, dihêle. Tirkên nû, bi fermanên nû, fermanên qereqoşî û dûrîaqilane têne gundê Baravayê. "Hin kesên xerîb ên bi bedlên reş hatibûn û mohrek dabûn vî tekane mêrî li gund û gotibûnê ku mirê jî êdî tên tomarkirin û pê ketibûn navê her kesê li gund li derfterinî reş î mezin ên bi xwe re anîbûn bi tîpên ecêb nivîsîn û çûn. Dem çûn tiştek ji dû xwe hiştin: Navekî din, navekî duyemîn dabûn her kesî. Paşnavê hemûyan kiribûn Türk û rahiştibûn defterên xwe çûbûn." (r. 17). Nivîskar, an dapîra wî, an diya wî, bi kurtahî behsa serhildana "Şêx Seîd" û "Mela Mistefa Barzanî" jî dikin. (r. 14)

Îsayê Ûsif, ku dibe Îsa Türk, di nav xwezayeke weke bihiştê de dimire û ew Sînema bi tenê bi halekî dihêle. Piştî ku keça kurd, ku êdî bûye jin, hevalrêyê xwe binax dike, rêwîtiya xwe didomîne û di Stembolê re derdikeve. Erê ew ewçend ji kurdan û ji Kurdistanê û bi taybetî ji gundê Baravayê dûr dikeve, kurd bi ser de dibarin. "Di wê demê de ku gundên xelkê dihatin şewitandin, leşkeran û şervanên kurdan pîncên hev û xelkê dişidandin û jiyana li gundewarên Bakurê Kurdistanê zehmettir dibû û her kesî berê xwe dida bajârên mezin, ên ku ji Barava rabûn û hatin Stembolê giş pêşî rasterê çûn ba wê." (r.32)


Lê Sînema Nadir di rewşek malkambax de digihîje Stembolê. Ew pêrgî cihûyekî dilovan û weke Xwedê mihreban tê û dibe Sînem Taşçi. Ew bi kurê ji Îsayê Ûsiv, di mala wî cihûyî de bi cih dibe û navê lawê wê dibe Mûsa. Li vê derê, çîrok bi xurtî derbasî nava Tewratê dibe. Sînem jî dibe kebanî û xwediya malên pir. Cihûyê kal her tiştî jê re dihêle û diçe. Mûsa mezin dibe, diçe dibistana fransî, lê tê kuştin, bêyî ku kesek bizane çawan, û wê gavê pêçeka Nêrgizê, keça wî, li ber deriyê malê tê danîn. Piştî ku law diçe, keça wî dikeve şûnê, û tiştê seyr ew e ku Sînema ku ji ber destê diya xwe pir renc û ziyan dîtiye wisa bi keça lawê xwe re ye û dikeve int û qayîşê. "Mirov nikare bibêje ku Nêrgizê zarokatiyeke ji a bavê xwe bextewertir jiya. Evê keçika bê nav û nîşan a ku tenê bi destmaleke nexşîn a pîvazî di ber pêçeka wê de hat mala Sînemê ji roja yekem de ket ber destê tund û bêrih ê dapîra xwe Sînemê." (r. 29)


Di dawiya çîrokê de, vebêjer ji dapîra xwe, ji diya xwe û ji bavê xwe bêhtir cih digre û dikeve jiyana Sînemê û ya malbata wê. Rojekê, Nêrgiza ku mezin bûye dixwaze alîkariya wî nivîskarê xort bike û wî bi çend tirkên girgire bide nasîn û deriyên navdariyê di rûyê wî de veke. Lê belê nivîskarê kurd li vê hêsaniyê nagere, xwedî biryar e. Ew ê bide ser rêya zimanê xwe yê zikmakî û zehmetiyê. Ew ê weke Ehmedê Xanî bike, Xaniyê mezin ku bi kurdî nivîsî û li nav û dengê dinyayê û zimanê farisî an erebî negeriya.

Dem birînan dikewîne û lêborînê, piraniya caran, bi xwe re tîne. Sînem "navno"yetiya diya xwe Helîma, û ya xwe jî, ji bîr dike û bi aramî, bi hêminî, ber bi dawiya jiyana xwe ve ber bi warê nabûdiyê ve diçe. Eger piraniya kurdan zimanê xwe di çend salan de û bi hêsaniyek dûrî aqilane ji bîr dikin, ew xwerû kurd û wek zêrê zer dimîne: "Wê xanima ku rihmetiya pîrka min, diya min û bavê min gelek caran behsa wê kiribûn û min digot qey tenê çîrok û efsaneyek e, bi goşt û xwîna xwe li hember min bû. Kurmanciya wê ya ku heçku li hemû kevir û kuç û beran qelipîbû, di ser hemû kort û newal û gelî û bestan re herikîbû, di hemû gir û gaz û zang û çiyayan re bihurîbû, di hemû av û ba û axan de meyiyabû, weku bêheke ji nav pelên gulek nû dibişkuve bifûre ez sermst kiribûm nû di wê derba yekem de min biryar dabû ku çîroka wê binivîsim." (r. 32).

Sînema "mirova herî bextiyar bû ku jiyana herî bedbext jiya li vê dinyayê" dikare bi aramî bikeve ser koça xwe ya dawîn. Kurdek bi navê Kulek dastana wê û ya zimanê wê dinivîse û wisa jî firsetekê dide wê ku bibe jineke nemir û dastaneke cawîdane. Belê, Ciwanmerd du tiştan di vê çîrokê de diafirîne û du niyaz û daxwazan bi cih dike. Ew çîroka Sînemê bi honandikek nûjen vedibêje û ew wê bi zimanekî pir dewlemend pêşkêşî me xwendevanan dike û çîrok dibe gencîneya peyvên xwerû kurdî. Belê ne tenê hevoka pêşîn ji berheman bala min dikişînin, lê yên dawîn jî û çîroka Sînema Nadir bi vê hevokê tev dibe: "Wê şevê ji her carê zûtir ket nav ciyan û careke din ranebû." (r. 38)

Barava, in Çar Yek. Ciwanmerd Kulek. Weşanên Avestayê, 2015.





JAN DOST

## Nûrsiyê me û Nûrsiyê wan

Ti kes nikare bibêje ku şerekî çekdarî ji bo serxwebûn û azadiya miletan şerekî ne rewa û ne di cih de ye. Dema ku deriyên çareseriyê werin girtin, dema ku înkara hebûna miletekî bi sedê salan berdewam bibe û ew înkar bibe siyaseta dewletekê û deriyên diyalogê li pêşiya aştîxwazan girtî bimînin, rakirina çekan jî dibe rêya tekane.

Lê hin armanc hene, mirov nikare bi rêyên xwînrêjî û tundrewî û çekdariyê tenê xwe bigihîne wan, mirov ji bo pêkanîna wan armancan hewcedarî aqil û mêjiyekî geş û vekirî ye, hewcedarî bikaranîna mentiqekî zanistî ye, hewcedarî alavên nûjen û "çekên" fikrî ye.

Me Kurdan jî têra xwe ji bo mafên xwe, ji bo îsbata hebûna xwe, ji bo rizgarkirina axa welatê xwe û azadkirina xwe gelek xwîn rijandiye û ked daye, gelek qurbanî û bedel dane, her çiqasî em negihiştibin armancên xwe hemûyan jî, lê me hebûna xwe û nasnameye xwe bi serhişkiya xwe parastiye.

Boneya van peyvên min yên li jor ew e ku min berî demekê fîlmekî sînemayê derbarî jiyana Ustad Bedîûzeman Seîdê Nûrsî temaşe kir. Ew fîlmekî ku nêzîkî du saet û nîvan dirêj bû. Min bi baldarî lê temaşe kir û guh da hemû hûrgiliyan, mesaja fîlm û diyalogên di nav kesan de û hwd. Lê bêtir ji çîroka fîlm, min bala xwe da peyvên tê de û niyetên veşartî yên di paş peyvan de anku fîlm dixwaze çi bibêje û bihêle em baweriya xwe bi çi riyê bînin!

Li gor ku ez têgihiştim, fîlm bi çavên desthilatdariya Tirkan hatiye kişandin. Ew Seîd Nûrsiyekî li gor xwe, li gor qalibê xwe yê ku berê amade kirine pêşkêşî mirovan dikin. Tiştê ku zêde bala min kişand ew dîmen bû ku tê de şandeyek ji hêla Şêx Seîdê Pîran ve tê serdana Seîdê Nûrsî û kesên wê şandeyê nameyekê ji ba Şêx Seîd didin dest ku têde doza tevlîbûna îsyanê lê tê kirin, lê Seîdê Nûrsî vê yekê red dike û serhildanê wek xebateke li dijî şerîetê bi nav dike û dibêje: "Bu mileti türkler idare ediyor, bundan böylede türkler idare edecek"! Yanî: "Ev milet ji hêla Tirkan ve tê birêvebirin, ji niha û pê ve jî wê Tirk wî îdare bikin".

Di rûpela xwe ya facebookê de wê demê min ev peyv ku li ser zimanê Ustad hatiye kirin raxiste ber destê her kesî û pirsî: Gelo ev di nivîsên Bedîûzeman de heye, yan Tirkan ji xwe re ev peyva bê wate û ne mentiqî danîne ser zimanê wî!

Li gor niqaşa di facebookê de, ewî tiştekî bi vê wateyê qet negotiye, ji xwe ez jî bi wê baweriyê bûm, ji ber ku min jî gelek kitêbên Ustad î ku wergeriyane erebî wek „Risaleyên Nûr" xwendine û qet min fikrek bi wî awayî nedîtiye li ba wî.

Rast e Seîdê Nûrsî xwe da aliyekî, raste tevlî serhildanê nebû lê gotinek bi wî awayî ne gotina wî zatê mezin e. ewî hakimiyet bi edaletê dipîva ne bi nijada hakiman. Li ba wî, li ser bingeha şerîetê, eger hakim zalim be nijada wî hîç e îca dê çawa bibêje ku em her ji alîyê Tirkan ve divê werin birêvebirin!

De ka gelo em dikarin li hember van îddiayan çi bikin? Him reşkirina kesayetiyek kurdan î mezin û him jî derewên dîrokî! Li hember vê yekê bi baweriya min bikaranîna eynî çekê divê, anku fîlmekî ku Kurd bi xwe derhêneriya wî bikin û ji perspektîva xwe de li vê kesayetiya xwe ya bejnbilind binêrin, aliyên wî yên kurdperwer yê rasteqîn bidin pêş. Miletperweriya wî, kurdbûna wî şanî nifşên nû bikin. Wan saetên dirêj î ku wî li ber tirba seydayê Kurdayetiyê Ehmedê Xanî dibuhurand bikin dîmenên bi wate. Navê wî yê ku kiribû Seîdê Kurdî bînin ziman.

Û bi vî awayî di hemû warên din de. Ji xwe divê em behsa fîlmê Mem û Zînê jî bikin. Ew fîlmê ku rehmetiyê Musa Anter pêşkêşiya wî kiribû û mîna çîrokbêj derketibû ser sehneyê. Ew fîlm bi dîtina min, bi qesd yan bê qesd kesayetiya Kurdan biçûk dike, mîrîtiya Kurdan î mezin, mîrîtiya malbata Azîzan ya Cizîra Botanê dike kirasê muxtariya gundekî biçûk î windayî, cil û bergê cotyaran li mîr dike û wan bi awayekî karîkatorîk tîne ber çavên temaşevanan. Tenê ku mirov, yanî senarîst û derhênerê fîlm li Mem û Zîna seyadayê Ehmedê Xanî vegeriya ba wê sehne li qonax û baxçeyên navdar bikişandana.

Em nikarin bi tena tivingê hemû armancan qezenc bikin. Cihê ku qelem pêwist be, tiving ne hewce ye, cihê ku fîlm û şano pêwist bin, qadên şer ne hewce ne û cihê ku divê hibir lê birije, ne hewce ye xwîna keç û xortan lê birije.

Şerê hebûna miletan şerekî pirralî ye, loma jî ku miletek giraniyê tenê bide aliyekî, wê zû bi zû negihijê armancên xwe.

Di vê serdema me de jî, serdema medyaya dîjîtal, serdema ku êdî mirov di ber berhem û produktên teknoliya wê re nagihê, divê awayê xebata me jî were guhertin û li gor vê serdemê be. yan na hîn emê gelek tiştan ji dest xwe berdin.

# Çîleka Sasonê li bazarên cîhanê ye



DARAYÊ PORXELEK



**PIŞTÎ** astengiyên li ser titûnê, gelê Sasonê ji bo pêşeroja xwe pey lêkolînan ket û di encamê de jî di sala 2007'an de li Gundê Mala Mêrgê (Yenikoy) dest bi çandina çîlekê kirin. Piştî titûnê tevî hemû kêmderfetiyan jî çandina çîlekê ji bo ajokerên Sasonê bûye alternatîfeke baş. Her wiha cotkarên Kurd ji kêmderfetiyên firotinê, cotkariyê, neyîna îmkana bikaranîna maşînan û piştgiriyên kêm yên dewletê bi gazin in. Serokê Komeleya Hilberînerên Çîleka Sasonê Mahmut Doğan dibêje: "Bi piştgiriya Îdareya Ajaldarî û Cotkarî a Batmanê çîlek ji Sasoniyan re bû alternatîf. Me bi ajotina 15 doniman dest pê kir niha jî bi qasî 1700 donim erd çîlek li Sasonê tê çandin. Nêzîkî 350 malbatên Sasonê bi çandina çîlekê debara xwe dike."

**Di salekê de 650 ton hat îxraçkirin**

Serokê Komeleya Hilberînerên Çîleka Sasonê Doğan dibêje, me ligel GAP'ê protokol îmze kir. Heger xalên peymanê bicih bihatana me dê zaftir îxraç bikira û radigihîne ku: "Me wek komele ligel GAP'ê peyman îmze kir. GAP'ê ji bo pêdiviyên komeleyên temîn bike pisporek diyar kir. Lê mixabin vî pisporî karê xwe baş nekir û îhaleya depoya cemedê ji bo mihefezekirina çîleka di şeva îhaleyê de betal bû. Ji bo mihefezekirina çîlekê depoya cemedê divê. Mixabin em çîleka xwe berhev dikin û bi tir û kamyonan dişînin Konya, Îzmîr û Mersînê da ku bên qeşimandin û ji wir jî ber bi bazara Ewropa û Emerîka ve biçin. Eger şertên peymana me ligel GAP'ê bicih bihatana me dê li Batmanê depoyê ava bikira. Piştî qeşimandina çîlekê jî me dê ji Batmanê îxracî Ewropa û Emerîka bikira. Lê mixabin şertên peymanê bicîh nehatin. Niha em jî wek komeleyê bi derfetên xwe yên xweser depoya cemedê ava dikin. Me îsal temelê xwe avêt. Bihesibînin me sala par di 2016'an de 650 ton çîlek bi navbeynkariya navbeynkaran îxracî Ewropa û Emerîka kiriye. Piştî avahiya me temam bû em dê bêyî navbeynkaran ji vir çîleka xwe bişînin bazara cîhanê."

**"Piştî qedexekirina titûnê em betal man"**

Miheme Tahirê ku ji gundê Çemê Reşo ye û ev 7 sal e karê çandina çîlekê dike çîroka xwe wisa bilêv dike: "Piştî qedexekirina titûnê em betal û bêkar man. Li Sasonê erdnigarî ji bo cotkariyê ne baş e. Mirov nikare heman cotkariyê bike. Piştî pêşniyaza Îdareya Ajaldarî û Cotkariyê ya Batmanê me jî dest bi çandina çîlekê kir. Çandina çîlekê jî ne hêsan e. Qeweta dest dixwaze, divê mirov pê re emek bide. Malbateke qelebalix tenê dikare 4-5 donim çîlek biçîne. Maşîne tenê dikare erdê me cot bike piştî cotkirina erd her tişt bi qeweta destan e. Mixabin alîkarî û piştgiriya dewletê jî tenê sala ewil ji bo me hebû. Ew jî gubre, naylon, çadir û pêzanînên çandina çîlekê bû. Ji bilî alîkariya van cûreyan, dewletê tu alîkarî nedaye me. Hemû masrafê çandina çîlekê me ji kîsê xwe da û me dest bi çandiniya çîlekê kir."

> "Çîleka Sasonê ji %100 xwezayî ye, bi tama xwe jî ji hemû çîlekên din cûda ye. Em tu dermanan nadinê, tenê zibilê ajalan lê dikin û awayê xwezayî digihînin ser sifreyên mezêxeran. Ji ber vê jî çîleka Sasonê him xwezayî ye him jî bi tam e."

**Alternatîfa titûnê ye Çîlek**

Miheme Salih Şahînê hilberînerê çîleka Sasonê jî dibêje, li Sasonê erdnigarî ji bo cotkariyê ne baş e. Mirov nikare heman cotkariyê bike û wisa didomîne: "Piştî kota danîn ser çandina titûnê, me dev ji çandina titûnê berda û em li alternatîfên cûda geriyan. Piştî vê lêgerînê di sala 2010'an de me dest bi çandina çîlekê kir. Li gor titûnê alternatîfeke ne xirab e. Ji ber neyîna depoya cemedê û neyîna derfetên paketkirinê em nikarin ji baxçeyan çîlekên xwe bifiroşin. Ji ber vê yekê jî em li gor bihayê çîlekê mafê xwe bidest naxin. Navbeynkar her roj bihayê çîlekê kêm dikin û ji hilberîneran dikirin. Bi midaxaleya komeleyê fiyat jî sabît dibe. Lê belê komele jî encax di dema derketina çîlekên ku dê bêne qeşimandin de dikare midaxale bike. Di serî de me tezgahên xwe datanî benda rê û me bi derfetên xwe yên heyî çîlekên xwe difirotin. Paşî navbeynkaran dest bi kirîna çîlekên me kir. Ji Batmanê, Diyarbekirê û ji Wanê navbeynkar dihatin ji bo çîleka me. Her çiqas ne çalak be jî niha kooperatîfa me heye. Kooperatîf, ligel çend cihên din jî di hemahengiyê de ye. Mixabin encax nîvê dahatê dikeve destê hilberîneran. Navbeynkar ji hilberîneran bi 2 Lîrayan çîlekê dikirin lê li marketan kîloya çîlekê 8 lîra ye."

**"Tenê 3 salan em dikarin li heman erdî çîlekê biçînin"**

Miheme Salih Şahînê hilberînerê çîleka Sasonê bilêv dike: "Li Sasonê erdên çandiniyê gelek kêm in. Her malbatek herî zêde xwediyê 2-3 an jî 4 donim erd e. Eger derfetên me ji bo çandina gilgil, pembû û cûreyên din hebûna me berê xwe nedida çîlekê. Ji ber ku dahata çîlekê li gor van cûreyan kêm e. Em mecbûrê çandina çîlekê ne. Niha bi hezaran kes bi karê çîlekê re mijûl e. Herî zêde sê sal em dikarin di heman erdî de çîlekan biçînin. Piştî çandina sê salan êdî ne mimkin e hûn ji wî erdî randiman bistînin. Çîlek randimana erd bidawî tîne."

## "Çîleka Sasonê bêhna esansê belav dike"

Serokê Komeleya Hilberînerên Çîleka Sasonê Mahmûd Doğan radigihîne: "Çîleka Sasonê organîk e, ji çîlekên piyaseyê cihê ye û bi tama xwe jî cûda ye. Em derman û maddeyên têkarî bikarnayînin. Sedî sed organîk e. Ji ber vê yekê jî bi tama xwe tiştekî bêhempa ye. Ji % 96 xwecihî ye. Di nav sêvze û fêkiyan de hatiye hilbijartin. Ev jî qalîteya çîleka Sasonê berbiçav dike. Ji ber organîktirîn çîlek a Sasonê ye û mezêxer(tuketici) çîlekê me tercîh dikin. Dema tu dikî nav seyareya xwe bêhna esansê dide der û dora xwe.

## Sason warê xwezayê ye

Sason li bin qontara çiyayê Mereto ye. Nêzîkî 30 hezar şêniyên navçeyê heye û navçe dikeve bakurê Batmanê. Ev navçeya Bakurê Kurdistanê bi hingiv, germavên xwe, xwedîkirina ajalan navdar e. Ji ber erdnîgariya çiyayî derfetên kar gelek kêm in. Bajarekî dîrokî û xwedî dîrokeke tije ye. Lê ji ber derfetên erdnîgarî ev navçeya Kurdistanê pêş neketiye. Heta sala 2007'an jî şêniyên Sasonê debara xwe bi çandina titûnê, xwedîkirina ajalan, hinartina hingivê Sasonê û bi kar û berên daristanê dikirin. Piştî girtina Tekelê û danîna kotayê li ser çandina titûn, şêniyên Sasonê ketin lêgerîna karên nû. Çîlek di encama vê lêgerînê de xwe gihande hawara Sasoniyan. Çîleka Sasonê li hemû cîhanê nav û deng veda. Her sal bi qasî 500-800 tonî çîlek îxracî derveyî welêt û Tirkiyeyê dibe.



# Şitilên Enqereyê jî Kurd difiroşin!



GÖNÜL GÜN



Bi hatina biharê re çikandina şitilên kulîlk, zerzewat û fêkiyan jî dest pê dike. Şitilên van mehsûlên ku ji tovên wan tên bidestxistin niha li bazaran li hêviya firotinê ne. Li bazara Hala Ulusa Enqereyê jî şitilên van mehsulan têne firotin. Firoşkarên Kurd ên şitilên zerzewat, fêkî û kulîlkan difiroşin dibêjin li Enqereyê ji ber ku bajarvanî zêde bûye mîna berê şitil zêde nayên firotin.

**Şitilek bi 1 lîreyî ye**

Enver Benlîyê Kurdên Haymanaya (Kurdên Şêxbizeynî) Enqereyê dibêje ev panzdeh sal e ku him şitilên zerzewat, fêkî û kulîlkan difiroşe him jî masîfiroşiyê dike. Benlî dest nîşan dike ku van karan ji malbata xwe hîn bûye û piştî ku sezona masîfiroşiyê xilas dibe dest bi karê firotina şitilên zerzewat, fêkî û kulîlkan dike û balê dikişîne ser zehmetiyên vî karî!

Benlî dibêje ku firotina şitilên dar û kulîlkan piranî di dawiya meha adarê de dest pê dike heta nîvê meha avrêl û serê gulanê didome û niha jî bi piranî şitilên zerzewat û fêkiyan tên firotin. Benlî wisa behsa karê xwe dike;

"Em du şîrîk in. Di saet şeşê sibê de dest bi kar dikin. Hevalê min ji bo ku şitilên zerzewat, fêkî û kulîlkan bikire diçe li serayên Çubuk û Karşıyakaya Enqereyê şitilan dikire. Ez jî li vir dezgehê amade dikim û kulîlkan av didim. Çawa ku şitil hatin vir, em hemû şitilan yek û yek ber çavan re derbas dikin û li dezgehê rêz dikin. Yek ji me her car şitilan dinihêre û yê din jî şitilan difiroşe. Heta heyştê êvarê em bi vî awayî dişixulin."

Firoşkarê Kurd Benlî diyar dike bi salan e li Karşıyaka û Çubuka Enqereyê seravanî tê kirin û ew hinek şitilên xwe ji van deran dikire. Wekî din li bajarê Îzmîrê û Mersînê jî şitil têne Enqereyê. Li gorî Benlî şitilên firîngiyan yên Mersînê jî zehf rind in. Ji derveyî Enqereyê piranî şitilên balîcan, îsot û çîlekan tên. Benlî tîne ziman dema ku şitil ji derve tên Enqereyê, di refên cuda û kasayên mezin û plastîk yên wesaîtên bi taybet de tên û hemû şitil li serayên Enqereyê tên firotin.

Benlî, "Niha di dezgeha me de, gelek cure şitil hene. Ez dixwazim navê çend heban bibêjim. Çar cureyên îsotan hene, wekî îsotên tûj, şîrin, cîn, û yên sor. Ji firîngiyan jî çêrî, firîngiya gûşî, çîlek, balîcan, xiyar, zebeş û gindor jî hene."

Firoşkarê Kurd dibêje heba şitilan bi qasî 50 û 70 quruşan dikirin û bi lîreyekî difiroşin. Benlî dibêje niha di nav şitilan de, şitilên firîngî, xiyar û îsotan zêde têne firotin û di rojê de hezar şitilên firîngiyan difiroşin.

> Firoşkarên Kurd ku bi salan e şitilên zerzewat, fêkî û kulîlkan difiroşin dibêjin li Enqereyê ji ber bajarvaniyê, avahî zêde bûne bexçe û bostan mîna berê nemane. Ji ber vê rewşê, şitil jî zêde nayên firotin!

**"Berê di rojekê de bi qasî sed hezar şitil dihat firotin!"**

Benlî balê dikişîne ser xalekê û dibêje berê li navenda Enqereyê şitil zêdetir dihat firotin. Heta carinan ji ber ku şitil bi dest nediket mirov diçûn ji qametê (karaborsa) şitil dikirîn.

Benlî, "Berê li vir firoşkarên şitilan zehf bûn. Lê belê ji ber ku li Enqereyê bajarvanî zêde bû şitil jî kêm hatin firotin. Çimkî avahî zêde bûn û bexçe û bostan êdî neman! Berê di rojêkê de bi qasî sed hezar şitil dihat firotin. Mirovan ev şitil dikirîn, an li bexçê xwe an jî li gundê xwe diçikandin. Lê niha li gundan jî av bi peretî ye lewma şitilan nikarin biçîkinin. Mirov niha tên û libek şitil dikirin û dibêjin emê li şaneşîna xwe biçîkînin."

Enver Benliyê firoşkarê Kurd dibêje ev panzdeh sal e ku şitilan difiroşe û hevalên wî jî wekî wî, rojê 70 an 80'î lîre qezenc dikin. Li gorî wî, tevî dayîna ked û zehmetiyê, heqê xwe baş nagirin.

"Şitilên ku li serayên Enqereyê têne çikandin dişînin gelek bajaran"

Yek jî firoşkarê şitilan ê din Enver Yemez jî bi qasî bîst salan e him şitilên zerzewat, fêkî û kulîlkan difiroşe him jî masîfiroşiyê dike. Yemez dibêje ew jî Kurdên Heymanaya Enqereyê ye û ji malbata xwe hînî vî karî bûye.


Yemez destnîşan dike ku niha kulîlkên wekî merzekew (fesleğen), gul, binefş, qerenfîl têne firotin lê Yemez dibêje herî zêde kulîlka merzekewê tê kirîn û wiha axaftina xwe didomîne,

"Kulîlka merzekewê ji ber ku him bêhna wê xweş e him jî gihîştina wê gelek hêsan e, kiryar zêdetir merzekewê dikirin. Her wisa gava ku kulîlka merzekewê di cihekî sergirtî de be mêş zêde nakevin wir. Wekî din niha di nav kulîlkên ku em difiroşin de gihîştina wê hinekî zehmet, gul e. Divê mirov dêna xwe baş bide vê kulîlkê."

Yemez dibejê di nav zerzewat û fêkiyan de jî gihîştina firîngiyê zehmet e û wisa pê de diçe, "Şitilên ku li serayên Enqereyê ten gihandin, ji bilî navçeyên Enqereyê, difiroşin bajarên wekî Qonya, Eskîşehîr û Çorumê jî."

Firoşkarên Kurd dibêjin, gava ku bo firotina şitilan diçin navçeyên Enqereyê ji wan re mesrefên nû derdikeve û zirarê dikin. Tevî bihayê nefta wesaîtê, bihayê poşet, av û heqê karkeran, barekî li ser milên wan çêdike û heqê xwîdana xwe nagirin.





NADÎRE GUNTAŞ ALDATMAZ

## La sey vatena mi nêbî

Ez çi zure bikerî, mi nê rojê peyenî cile de vîrnayî ra. Peynîya referandumî mi rê winî skut û xeyalo girs peyda kerd ke ez bi rojan nêameya re xo. Ez teber nêvejîya, derse nêşîya, kesî de qisey nêkerd, qaytê TV nêkerd. Hîna di hîrê rojîyo ke rindêr a. Çira ez tesîrê na peynîye de hende menda?

Mi gore gerek se ra 57-58 "nê" bivejîyêne. Mi va yew surprîz zî mumkun o, se ra 60-65 zî yê zerrîya mi û yê mantiqê mi bî. Ez bi xo zaf bawer bîya ke peynîya referandumî nîya bena kesê ke dormeyê mi der ê, mi ê zî îqna kerdî. Pekî no fikrê mi bi kamcîn argumanan virajîya, ez tenê qalê ci bikerî.

Her çî ra ver Tirkîya de nê di-hîrê serranê peyênan de, her sinife ra, her îdeolojî ra û her mintiqa ra şar mexdur bî. Taye kes bi FETOcîyenî, taye kes bi PKKcîyenî, keso bîn bi THKPCcîyenî, nêbî PYD/YPGcîyenî o zî nêbî îllahî bi çîyode bîn şar eşt zere, kişt, ci rê zulum kerd. Kesê ke eleqayê xo bi nê organîzasyonan esto helbet estê, la nê çend kesê? Kesê ke mexdur bîyê bi se hezeran ê. Keyeyê înan, naskerdoxê înan, cîranê înan û kesê ke qet înan nas nêkenê la wayîrê yew aqil û wijdanî yê û dûrî ra neheqîye vînenê çend mîlîyon ê? Mi va nê çend mîlyonî nîyê, nê zaf mîlyon ê, bi mîlyonan ê. Ez bixo FETOcîyan ra qet hes nêkena la no durum mi rê manî nîyo ke ez tayê neheqîye bivînî. Mi va belkî şarê Tirkîya zî sey mi na neheqîye vîneno. Kurdî tim maruzê neheqîye benê û şarê Tirkîya nêvîneno, no êdî normal o la nika tena kurdî nê hetê înan ra zî zaf kes mexdur bî. Cinî camêrd pîya kar ra eştî û domanî orte de mendî, ca ci nêda, keye ci nêda, herinda mezele bîle cî nêdaye. Mi va ma pê nê şarî qayîl nêbenîme la no şar ma dano şermayene, vengê xo vezeno. O wext ma zî vileyê xo kenîme çewt û ozrê xo wazenîme. Sey vatena mi nêbî. Mi ê ke îqna kerdê înan ra ozrê xo waşt. Ez şermayeya ke ez fikrê şarî ra hende dûrî der a.

Çîyode bîn zî ekonomî bî. Feqîrî her roj dahîna bîyêne feqîrî û zêdîyêne, kesê dewletî zî dahîna bîyêne dewletî. Mi va qey şar na feqîrîye rê razî nêbeno. La sey vatena mi nêbî.

Her roj meyîtî ameyêne, domanê feqîr-fiqarey kişîyêne. Ê bînan seba ke eskerîye mekerê domananê xo ruşnayêne welatanê Europa yan zî Amerîka. Mi va şarî prosesê aştîye dîyo, tehmê aştîye reye girewto, xirabinîya kiştene dîya, mi va no şar qey êdî herb û xirabîye nêwazeno. La sey vatena mi nêbî.

Mi va nê Europa de hende danê pêro, şarê mayê Europa terseno, seba ke rehetê xo dewam bikero vengê xo keno berz. Sey vatena mi nêbî. Xo ra mi ozrê xo her kesî ra waşt.

Ez zaf rind zana ke şima tayê kes nika mi ra persenê vanê "Qanunê no walatî, yan zî sîstemê no welatî o verên zaf rind bî ke ti hende dana xo ro!" Ez zî çend rojîyo persanê sey nînan xo bixo persena. Mi xo zanayo nêzanayo tim zulmê dewlete ma ser o bîyo. Hem zî dewrê ma, yê ma û pîyanê ma ra ridêr bîyo. Yê kalik û dapîranê ma zî yê înan ra bêter xirabin bîyo. Kalik û dapîranê ma qirkerdiş dîyo, ma û pîyê ma ortê mij û dumanê qirkerdişî de bîyê pîlî, ma zî bi hîkayeyanê înan û bi ters û xof bîyîme pîl. Dima zî şîma zanê hama hama çewres serrîyo na welat de se beno. Derbayî, îdareyê orfî… heta ewru ameyîme. Halê mayo ewreyen vizerî ra dahîna xirabin nîyo. Ancî zî ez û kesê sey mî halê ewreyenî ra razî nîyîme. Mi tim sîyasetmedaranê muhefezekaran ra hes nêkerdêne. Ma vajî mi Demirelî ra Turkeşî ra qet hes nêkerdêne la mi heta nika kesî ra nîya nefret zî nêkerd. Çike înan nameyê ma, nasnameyê ma, ziwanê ma qet qebul nêkerdêne. La nînan qebul kerd û ma çend serrî sey xo vejîyay meydan. Bi ziwanê xo qisey kerd, nuşt. Mi heyatê xo de na zî dîye, tayê talebeyî bi ziwanê ma unîversîte de perwerde bîy. Malimê ziwanê ma mezun bîy. Xeyalê ci bîle bêîmkan bî la bixo rastîye bîye. Maalesef rew qedîya. Seke nînan ma xapênayîme, tenê şeker da be ma dest dima zî çuye girewte xo dest. Coka ez nînan ra nefret kena. Nînan pê ma kaykerd, coka ez hende hêrsina, hende qeherîya.

Nika zî bêrîme meseleya xeletîyayîşê mi ser. Ez çayê hende xeletîya? Halê şarê Tirkîya o sîyasî, kulturî, sosyal, ekonomîk orte der o, ti çayê hende xeletîya? Yan no şar kor o, hende xirabinîye nêvîneno yan kî na xirabinîye rê beno razî la verê hukumatî de nêvindeno. Belkî zî ez nê şarî bes nas nêkena. Belkî no şar texmînê mi ra dahîna xirabin o. Alternatîfo hîrêyin zî no yo: No şar kor nîyo, ez înan nas kena. La hukmat zî înan nas keno û tedbîrê xo gireto.

nadirega@hotmail.com

# Pers & Cewab: Ümran Düşünsel



Kam a?: Ümran xanime yew tirk û nuştox a. Îstanbul de ronişena.

Çirê a?: A bi xo tirk a la balkêş o verî ra nata kirmanckî reyde eleqedar bîya. Hetta 2014 de bi perwerdeyê dûrî ra kursê kirmanckî yê Unîversîteya Artuklîyî qedenaya.

**P: Umran Düşünsel kam a? Ti eşkena xo tayê bide şinasnayene?**

C: Ez sey ferdê yew keyeyî yo ke wextê Osmanîyan de surgunê Qirimî bîyo maya xo ra bîya. Semedê wezîfeyê pîyê mi ra ez di serrî qezaya Qelqelîyê ya Wanî de ciwîyaya. Mi ê wextan kurdî nas kerdî. Birayê min o ke uca ameybî dinya û birayê embazanê min ê kurdan pîya merdî; semedo ke doktor çin bî. Mi ferq kerdbî ke ziwanê ma cîya bîy û ma nêeşkayêne hîsanê xo yewbînan rê îfade bikê. Naye ver canê mi dejayêne. Mi waştbî ke ziwanê înan bimusa la tayînê pîyê mi vejîya û ma agêrayî bi Îstanbul. Dima ra mi dest bi wendiş kerd û êdî mi seba musayîşê kurdkî wext nêdî.*

Mi heme tehsîlê xo Îstanbul de qedena. Ez Fakulteyê Komunîkasyonî yê Unîversîteya Marmara ra mezun bîya. Gama ke ez unîversîte de wendekar bîya, mi o wext Radyoyê Îstanbulî yê TRT rê kayê tîyatroyî nuştî û mi bi no hawa dest bi cuya xoya nuştişî kerd. O mabên de mi ge-ge hîkaye û ceribnayişî zî nuştêne.

2008 de bi nameyê Kimse Yüreğinden Öptü mü Seni? (Kes to zerrîya to ra maç kerd ?) yew kitabê min ê şîîran weşananê Yalın Sesî ra vejîya. 2013 de hîkayeya mi Ağaç Kurtları (Kermê Darî) wareyê tirkî de Xelata Hîkayeyan ya Şerzan Kurtî rê layiq ame dîyayene. 2015 de kitabê min o hîkayeyan yo verên Kırık Patika (Pîyara Şikîyayîye) Weşanxaneyê Babekî ra vejîya. Eynî serre mi bi hîkayeya xo Tek Ayakkabı (Sola Tekane) xelata 3. ya Musebaqaya Huseyîn Çelebî girewte. Kitabê min o hîkayeyan yo dîyin Ay Portakalı (Porteqala Aşme) aşma nîsane ya 2017 de hetê weşanxaneyê Ütopyayî ra çap bî û Halname yo ke kitabê min o hîkayeyan yo çarin bibo do hetê eynî weşanxaneyî ra hezîran 2016 de çap bibo.

Ez bi xo qiseykerdiş ra hende hes nêkena la aşiqê nuştişî ya. Mi ke nênuştêne ez nêmerdêne la ez vana qey bibacîyayêne. Çunke aqilê mi de zaf hîkayê arê bibîy. Nînan ra teber ez Umran Düşünsele kesêka sey her kesî/e ya. Ez bi xo sebze, meywe û vilan ronayene ra hes kena, tebîet û heywananê kuçeyan rê hesas a, fotograf antene û helbet wendişî ra zaf hes kena…

**P: Ma zanê ke ti demêk beşdarê kursê kirmanckî/zazakî yê MAUZEMî (Merkezê Durî ra Perwerdeyî yê Unîversîteya Artukluyî ya Mêrdînî) bîya. Gelo eleqeyê to bi kirmanckî senî dest pêkerd? Keremê xo ra tayê behsê hîkayeya xo ya zazakî û MAUZEMî bike.**

C: Domanîye ra nata meraqê mi esto ke çîyanê neweyan bimusa. Gama ke mi dest bi nuştiş kerd no meraqê mi hîna bî vêşî. Naye ra vîst serrî verê cû meraqê minê nuştişî dest pêkerd û ez eynî wext de Osmankî musaya. Xatiraya min a çarês serreyîye mi ser o zaf tesîr kerd û mi netîceya aye de qerar da ke zazakî bimusa. Maya mi o wext nêweşe bîye û nêweşxane de tedawî dîyêne. Kîşta aye de xalikêka/yayêka pîre rakewtêne. Ez key ke şîyêne zîyaretê maya xo mi dîyêne ke a bi ziwanêkê xerîbî şiwareyan vana. Rojêk ez raştê lajê aye ameya. Mi ci ra persa. Dewa înan ameya veşnayene û ê mecbur mende ke koç bikê. Ti nêvanî/e a xalike bêke reyna dewa xo nêvîno û bimiro, yanî terse nê îhtîmalî ver şiwareyan vatêne. 2014 de ez seba ke kurdkî bimusa kursan gêraya. Mi yew kurs dîbî û destpêkerdişê mi ser ra epey wext vîyartbî. Tam ê deman Roşan Lezgînî mi rê xebere da û va MAUZEM (Mardin Artuklu Üniversitesi Uzaktan Eğitim Merkezî) amadekarîya kursê zazakî yê durî ra keno. Mi dest de çimê xo kerdî tarî, muracatê xo kerd û qeydê xo viraşt.



T.C.
MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ
Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü
Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı
Kürtçe Öğretim Birimi

KÜRTÇE KURSU SERTİFİKASI

| | |
|---|---|
| Adı ve Soyadı | :ÜMRAN DÜŞÜNSEL |
| Doğum Yeri ve Yılı | :İSTANBUL 23.11.1968 |
| Baba Adı | :ZEKİ |
| Sertifika No | :2KTSSZK-0098 |
| Sertifika Tarihi | :28.04.2015 |

Enstitümüz Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalına bağlı Kürtçe Öğretim Birimi tarafından **15.08.2014 - 15.12.2014** tarihleri arasında düzenlenen Kürtçe Kursunda ...temel... seviyede başarılı olmuş ve bu sertifikayı almaya hak kazanmıştır.

*Yrd. Doç. Dr. Mustafa ASLAN*
*Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı Başkanı*
*Serekê Şaxê Mayzanistê Ziwan û Kulturê Kurdan*

K.T.
UNÎVERSÎTEYA ARTÛKLÛYÎ YA MÊRDÎNÎ
Enstîtûyê Ziwananê Ganîyan yê Tirkîya
Şaxê Mayzanistê Ziwan û Kulturê Kurdan

SERTÎFÎKAYA KURSÊ KURDKÎ (KIRMANCKÎ)

| | |
|---|---|
| Name û Peyname | :ÜMRAN DÜŞÜNSEL |
| Ca û Serra Mayaxorabîyayîşî | :İSTANBUL |
| Nameyê Pîyî | :ZEKİ |
| Numreyê Sertîfika | :2KTSSZK-0098 |
| Tarîxê Sertîfika | :28.04.2015 |

Mabênê **15.08.2014 - 15.12.2014** de beşdarê sewîya destpêkî ya kursê kirmanckî (zazakî) yê Şaxê Mayzanistê Ziwan û Kulturê Kurdan yê Enstîtuyê ma bîyo/a, bi heqê xo na sertîfika girewta.

*Mutlu CAN*
*Kurs Eğitmeni*
*Perwerdekarê Kursî*

*Doç. Dr. Mehmet Sait Toprak*
*Enstitü Müdürü*
*Mudirê Enstîtuyî*

**P: Gelo to dersan de zaf zehmetî ante? Derheqê kirmanckî de fikir û tesbîtê to çi yê?**

C: Ez verê cû wazena vaja mi mamosta Mutlu Canî bi no wesîle nas kerd. Zazakî reyde eleqedarbîyayîşê yew tirke zaf weşê ey şibî. Bêke bêzar bibo tekrar-tekrar lebate kerdêne ke zazakî bimusno mi. Bi nê wesîleyî seba ke zaf kede daya mi ez ey rê reyna sipas kena. Embazê ke beşdarê kursî bibîy zafê înan kirmanc/zaza bîy, înan ziwanê xo tay bo zî zanayêne. Naye ra mi verî zaf endîşe kerdêne. Nîhayet ez yew tirke bîya û mi tek çekuye zazakî nêzanayêne. Sifirî ra destpêkerdiş goreyê mi yew avantaj bî. Mi gramer de zaf zehmetî nêante. La telafuz de mi zaf zehmetî dîyî. Seba ke ez ziwanêko newe hela-hela ke ziwano ke ver bi vîndîbîyayîş şîyêne musayêne zaf heyecanin bîya. Îmtîhanê mi baş vîyartî. Gama ke ez bi telefon musaya ke bîya yewinê grûba xo hende zaf keyweş bîya ke telefon de qîrraybîya. Wexto ke o qirrayîşê mi yeno vîrê mi ez hema zî huyena.

**P: Ti bi xo yew tirk a û to dest eşto kirmanckî. To na mana de derûdorê xo ra reaksîyonê senînî girewtî?**

C: Mi serê de keyeyê xo û Roşan Lezgînî û heme dostanê xo ra desteg dî. Tabi tayê embazanê mi zî mi ra vatêne ke "Eke ti wazena namdare biba rîyê xo ver bi rojhelatî ney ver bi rojawanî biçarne, Zazakî ney franskî, îspanyolkî bimuse" Labelê herhal înan xo vîr ra kerdbî ke amancê min o sey kesêka populerebîyayîş çin o. Raşta ci ez nêeşkaya 2016 de semedê zazakî wext abirna. Çunke projeyê Halname/2016 zaf wextê mi girewt. Mi tena molayan de kitabê sanikan wendî.

**P: Seke ti zî zana kirmanckî lehçeyêka kurdkî ya ke binê tehlukeyê vîndîbîyayîşî de ya. Ti naye ser o çi fikirîyena?**

C: Binê tehlukeyê vîndîbîyayîşî de bîyayena zazakî canê mi zaf dejneno. Eynî wext de hêrsê mi zî ano. Ez mat manena ke ziwanê înan ha vîndî beno la zazayî sewbîna ziwanan dima şonê, lebate kenê ke ziwananê xerîban bander bibê. Semedo ziwanê minê dayîke tirkî ya, ez kena ke aye weş bixebitna, tirkîya xo aver bera la eke yewna ziwan ziwanê min ê dayîke bibîyêne, mesela zazakî bibîyêne teqez mi lebate kerdêne ke ez aye weş bimusa, mi xebitnîyayîşê aye teşwîq kerdêne û seba ke aye aver bera kede werdêne. Kursê MAUZEMî re zaf tay kesî beşdar bibîy û naye ver ez zaf xemgîn bibîya o wext. La ez bi xo qerardar a; heta ke ez zazakî de biresa sewîyeya tirkî ez do banderbîyayîşê/musayîşê xo bidomna. Vatişê min o peyên no yo ke ganî kirmanckî (zazakî) kilaman/deyîran û şîwareyan ra sînorkerde nêmana. Goreyê mi yew ziwanê dayîke naye ra zaf-zaf zêde dereceyanê berzan heq keno.

**Ümran Düşünsel, sewîyeya destpêkî de kursê kirmanckî girewto. Coka ma persanê xo bi tirkî pers kerdî dima cewabê aye çarnayî kirmanckî ser.*




# Kamîya Bawerîyêka Qedîme: Êzidîtîye (2)

SELMA DOGU

**E) Meleke Tawuse**

Na meleke kesê ke teberî ra ewnenê bawerîya êzidîtîye ra, seba înan melekêka xirab a. Xora êzidîyan na meleke ver zaf heqeretî dîyê, mexdur bîyê û binê îşkenceyî de mendê. Goreyê êzidîyan mîyanê melekan de melekêka tewr bihêz û başe Meleke Tawus a. No semed ra tewr zêde aye rê dua kenê. Goreyê înan çekuyê şeytan û îblîsî hetê muslumanan ra sey nengî Meleke Tawuse ra ameyê vatene. Bi Meleke Tawuse sembolîzekerdişê şeytanî tena bawerîya êzidîyan de çin o. Mandîyî, Durzîyî zî şeytanî bi na teyre sembolîze kenê. Eynî wext de ma Mishefa Reşî de vînenê ke Meleke Tawuse bi nameyê Ezazîlî ameyo name kerdene û seke ma zanê no name, nameyêşeytanî yo ke o hema cenetî ra nêerzîyaybî. Îfadeyanê corênan ra fehm beno ke Meleke Tawuse şeytanî sembolîze kena. Nînan ra ver ganî ma bifikirîyê gelo seba çîyî êzidîyî ruhê xirabê rê îbadet kenê. Seserra hîcrî yê 4. û 5. de zafê mutesavufan meseleya lanetbîyayîşê şeytanî reyde eleqedar bîyê. Goreyê mutesewifanê sey Îbnî Erebî û Ehmed Gazalî, Îblîs bi Ademî ver secdenêkerdişê xo, rûmeto ke ganî tena Homayî rê bimusno ey rê nêmusnayo. Û bi no hawa heskêrdişê xoyê Homayî yê bêhedî ver ameyo lanetkerdiş. Mutesawifan herinda ke şeytan mehkumê lanetê ebedî bike,o sey estena ke merdim ganî heyranê ci bibo pêşkeşê bawermendan kerdo, tayê înan zî o sey şeklê tezahûrê tewr gird yê îhtîşamê îlahî dîyo. Înan, şeytan sey tewr girdî yê monoteîstan dîyo. Bêguman Şêx Adîyî, Bexdad de perwerde dîyo û o naye ra nê doktrînî ra xeberdar bîyo. Şêx Adîyî nê doktrînî neqlê murîdanê xo keno. Labelê murîdanê ey prosesê dergî mîyan de no doktrîn vurna û bi temayêka cîyaye şîrove kerd. No şirove ewro zî muteber o. Murîdî senî ke qebûl kenê ke cezaya şeytanî do ebedî nêbena, ey cagirewtoxê tewr muhîmî yê Homayî tayîn kenê.

**Sultan Êzî**

Efsaneya êzidîyan de Meleke Tawuse ra dima cayo tewr muhîm, yê meleke Sultan Êzî ya. Ma na meleke zaf hîkayeyan de sey yew qehremane vînenê.

**Melekeyî Bînî**

Goreyê Mishefa Reş a ke sey yewê kitabanê pîrozan yê êzidîyan qebul beno, Homa tewr verî bi xeliqnayîşê yew încîya sipîye dest bi awankerdişê dinya keno. Badê cû bi nameyê Anfar yew teyr xeliqneno û na încî seba ke 40000 serrî ey ser o bimano nano nê teyrî ser. Naye ra dima hewt rojîde hewt hebî melekan xeliqneno û wezîfeyê îdarekerdişê dano Ezazîlî yo ke eynî wext de Meleke Tawus a. Goreyê naye Homayî tewr verî roja yewşeme Meleke Ezazîlî yanî Meleke Tawuse xeliqnayo. Meleke Tawuse sereka heme melekan a. Homayî, roja dişeme Meleke Derdaîl xeliqnayo. Ruhê na meleke, pîlanê êzidîyan ra Şêx Hesenî temsîl keno. Homayî, Meleke Îsrafîlî yo ke xo roja seşeme suretê Şêx Şemsî de nawito, roja çarşeme Meleke Mîkaîlî yo ke xo suretê Şêx Ebu Bekîrî de nawito, roja panşeme Meleke Ezraîlî yo ke xo suretê Şêx Sîcaaddînî de nawito, roja îne Meleke Şemnaîlî yo ke xo suretê Şêx Nasîreddînî de nawito û reya peyêne de Homayî Meleke Nuraîlî yo ke xo roja şeme suretê Şêx Fexreddînî de nawito xeliqnayê.

**Kitabê Pîrozîyê yê Êzidîyan**

Kitabê înan ê pîrozî di heb ê. O yewin Kitabê Cîlweyî yo ke sey kitabêko wehîy ameyo nuştene û o bîn zî Mishefa Reşî yo ke tede emr û qedexeyî ameyê neuştene.

**1.Mishefa Reşî**

Mishefa Reşî yanî Mishefa Sîyaye kitabo pîroz yê êzidîyan o. No kitab bi alfabeyêka cîyaye nusîyayo. Na alfabe ne alfabeya erebkî ne îbrankî ne zî suryankî ya, yanî alfabeyêka xususî ya. Tekstê nê kitabî tewr verî Anastase Marie 1904î de bi wasitayê êzidîyêk peyda kena û 1911 de weşanena. Maximilian Bittneri zî 1913 de nê tekstî transkrîbe keno, çarneno û newe ra neşr keno.Dima 1991 de Pêşrew Kerîm Ehmedî Mishefa Reşî çarneno herfanê erebkî ser û weşaneno. Mishefa Reşîde mîtolojî û hîkayeya xeliqnîyayîşe êzidîyan, emr û qedexeyî ca gênê.

**2.Kitabê Cîlwe (Îzahetê Îlahî)**

Kitabê Cîlwe zî sey Mishefa Reşî yew kitabê pîrozê êzidîyan o û no kitab zî bi alfabeyêka xususîye nusîyayo. No kitab wextêko hîna derg de û seba ke zanayîşê êzidîyan bizednîyo ameyo nuştiş. Nê kitabî de nusîyayo ke ganî o tena hetê êzidîyan ra bêro wendene û bi tu hawa nêkewo destê xerîban. No kitab, panc beşan ra awan bîyo

Beşo yewin: Nê beşî de sifet û ezelîbîyayîşe Meleke Tawuse û bêhukmîya dînan û kitabanê bînan îzah beno.

Beşo dîyin: Çerçewaya xelate, ceza û reenqaryasyonî ameyo îzah kerdene.

Beşo hîrêyin: Nê beşî de îzah beno ke her çî kontrolê Meleke Tawuse de yo.

Beşo çarin: Melumatê ke mewsîman û qanûnan reyde eleqedar ê û yew îqaz ca gênê. Goreyê nê îqazî ganî êzidîyî bawerîyanê xerîban ra dûrî vinderê.

Beşo pancin: Nê beşî de îbareyê ke konseptanê pîrozan yê êzidîyan formulîze kenê ca gênê. Goreyê nê îbareyan ganî her êzidî/ye hurmet bido nê konseptan.

Goreyê ziwannasanê ewroyinan nê di kitabî kitabê pîrozî yê êzîdîyan nîyê û ê îspat kerdê ke nê kitabî çaxanê kehenan ra nêmendê. Sebebê naye yo tewr pîl no yo ke bawerîya êzidîyan exleb girêdayeyê tradîsyonê edebî yê fekkî yo. Coka sey dînanê Îbrahîmî yê pîlan metnê pîrozî yê êzidîtîyan yê nuştekî çîn ê.

**F) Rîtuelê Înanê Dînîyî**

**1) Bawerîya Tenasûh (Reenqarnasyon)**

Êzidîyan de bawerîya cenet û cehenem çin a û bawerîya tenasûhî yanî reenqarnasyonî esta. Goreyê na bawerîye mergê merdimî dima ruhê merdimî bedenêko bîn de newe ra gane beno. No hal Kitabê Cîlweyî de wina îzah beno; [homa vano] eke ez biwazî eşkena ruhê merdimê merdeyî bi raya tenasûhî heta di-hîrê rey bierşawî dinya.

**2) Duayî**

Duayê êzidîyan bi nameyê qewl yenê name kerdene û êzidîyî wexte îbadetî de nê duayan wanenê. Êzidîyî tena zîyaretê înanê pîroz o ke Laleş de yo, uca bi hawayo komkî îbadet kenê û naye ra teber îbadetêko komkî nêkenê. Îbadetê înan o rojaneyî 2 rey yeno kerdene. O verên wextê vejîyayîşê tîje de o bîn zî wexto ke tîje kewte yeno kerdene. Êzidîyî tîje sey qible referans genê û bi no qaydê rîyê xo çarnenê tîje ra û îbadetê xo anê ca.Verê ke îbadet bikê, dest û rîyê xo şuwenê.

**3) Zekat û Rojeyî**

Bawerîya êzidîyan de seba murîdan û merdimanê dînîyan cîya-cîyaye rojeyî estê. Murîdî beyntarê 3 û 5ê aşma êlule de hîrê rojî roje genê. Sewbîna roşanê Xidir Îlyasî de zî hîrê rojî roje gênê. Roje serê sibayî bi zerdîya tîje dest pêkeno û heta mexrîbî dewam keno. Merdimê dînî zî aşma kanûne de 20 rojî, aşma temmuze de 20 rojî û beyntarê 15 û 20î êlule de zîyaretbîyayîşê pîrozgehê Şêx Adîyî ra pey 40 rojî û pêro-pîya 80 rojî roje gênê. Prosesê rojeyî de werdiş, şimitiş û tekîlîya cinsî yê cinî û camerdan qedexe yê. Nê qaydeyan ra teber mîyanê edetan de sifreyê fitarî de temînbîyayîşê şerab zî esto. Êzidîyan de murîdî, ameyeyê (gelir) xo ra %10î sey zekat danê şexî, %5î danê pîrî û %2,5î zî danê feqîran.

**4) Hec**

Êzidîyî beyntarê 15 û 20ê êlule de pîrozgeho ke gelîya Laleşî de yo zîyaret kenê. No zîyaret şertanê wezîfeyanê dînîyan ra yew o. Êzidîyî verî pirdêko bi nameyê Sirat yeno name kerdene ra vîyarenê û hema şinê pîrozgeh. Her êzidî ganî sanduqaya Şêx Adîyî hîrê rey tewaf biko ke hecî bihesibîyo. Merasîmê heckerdişî de êzîdîyî xo çeman de şuwenê, gorê/mezelê ke pîroz yenê qebul kerdene, înan ser o qendîlan tafînenê, gayan qurban kenê û goştê înan vila kenê. Derûdore pîrozgehî de bi solan nêgerenê. Alkol şimitene û daran birnayene bawerîya înan de qedexe yê.

**5) Waftîz û Sunet**

Lajekî maya xora bîyayîşê ra tepîya roja çewresine de hete pîran yan zî şexan ra pîrozgehê Şêx Adîyî de bi awa zemzemî hîrê rey yenê şutiş û bi no qaydê waftîz benê. Waftîzkerdişî ra hefteyêk tepîya qîco ke waftîz bîyo hetê pîr yan zî şexî ra yeno sunet kerdene. Sunet bîyayene her lajekê êzidîyî rê ferz o. O ke sunet nêbîyo goştê qurbanê ey helal nêno qebul kerdenê. Kerwatî êzidîyan de cayêko muhîm teşkîl keno. Kerwatîya lajekanê êzidîyan hete yew cîran, yew dost yan zî yew muslumanî ra yeno ca.

**6) Şehadet**

Êzidîyan de muhtewaya şehadetî de nê prensîbê bawerîye ca gênê; Homa wayîrê qudreto bêsînor o, Şêx Adî Bîn Mîsafîr melekê Homayî û murşîdê êzidîyan o, Sultan Yezîd meleke Homayî, nurê erdan û şayîya merdiman o. Meleke Tawus melek û sefîrê Homayî ya. Heme ezidîyî bawerîya xo bi nînan anê û îfadeyanê corênan her şewe wextê rakewtişî de û her şewdir gama ke werzenê tekrar kenê.

**7) Roşanî**

Roşanî êzidîyan di tewir ê. Qismê înan estê ke wextê înan sebît o yanî dîyar o, qismo bîn zî wextê înan sebît û zelal nîyo. Êzidîyî roşanan ra teber cuya rojane de roja şeme nêxebitîyenê yanî îstîrehet kenê.

**Roşanê ke wextê înan sebît û dîyar ê**

Roşanê Roja (Rojbîyayîşî): Pîrozkerdişê nê roşanî yewê kanûne de yo û hîrê rojî roje yeno girewtenê.

Roşanê Sultan Êzîyî: Roşanê Rojbîyayîşî ra dima êno pîroz kerdenê û zîyafetêko pîl yeno dayenê.

Roşanê Xidir Elyasî: 18ê sibate de yeno pîroz kerdenê û semedê pîrozkerdişê roşanî hîrê rojî roje yeno girewtenê.

Roşanê Sersalê (Serrneweyî): Çarşemeyê yewin yê aşma nîsane de yeno pîroz kerdenê. Nê roşanî de qurbanî yenê serê birnayene.



**Roşanê ke wextê înan sebît û dîyar nîyê**

Roşanê Merdeyan; Êzidîyî rûmetêko pîl danê merdeyanê xo. Seba înan her serre tewir bi tewir dîyarîyan benê gorîstanan. Hîrê serrî têdima aşma nîsane de, hîrê serrî têdima aşma yewine ya hamnanî de, hîrê serrî têdima payîz de û hîrê serrî têdima aşma kanûne de roşanê merdeyan pîroz kenê.

Roşanê Remezanî; Roşanê Remezanî yê muslumanan ra di rojî ver pîroz kenê.

Roşanê Hecîyan; Roşanê qurban yê muslumanan ra di rojî ver pîroz kenê.

**8) Birayê Axîretî**

Êzidîyan de birayê axîretî sey yew mecburîyet o. No edet hem mîyanê cinîyan de hem zî mîyanê camerdan de esto. Ê ke bîyê birayê axîretî, yewbînan ra berpirsîyar ê. Beyntarê înan de zewaj qedexe yo.

**G) Qedexeyî û Edetê Zewajî**

Êzidîyan de seba çîyanê werdiş û şimitişî û cilan/kincan çend qaydeyî estê ke ganî her êzidî goreyê nê qaydeyan hereket biko.Werdişê qulkelem (karnabahar) û marul qedexe yê û sewbîna daran birnayene û nêzdîyê bi kutikanê pîsan şîyayene qedexe yo. Goreyê neqlkerdişê Lescotî; ê bi vengo pîl tu nêkenê, firaqê ke ci ra veng vejîyeno, înan ra awe nêşimenê, pişwerdîya xerîban nêwenê, wexto ke qisey kenê herfa ayn qirikê ra nêvejenê. Yewna qedexeyo balkêş no yo ke êzidîyan rê kincanê keweyan xoradayene qedexe yo.

Sey heme komelan komelê êzidîyan de edetê zewajî cayêko muhîm teşkîl kenê û qedexeyê nê wareyî zaf zêde yê. Zewajê ferdanê êzidîyan û mensubanê dînanê bînan goreyê edetanê înan qedexe yo. Çunke goreyê bawerîya êzidîyan o yo/a ya ke mensubê/a dînêkê bînî reyde bizewîjîyo pakîya êzidîtî xo ser a dareno/a we, ruhê dînî xerepneno. Coka keso ke ferdanê êzidîyan ra teber bizewicîyo hete Mîrî ra êno afaroz kerdene. Beyntarê sewbîna tebeqayan de zewajî qedexe yê. Her êzidî/ye tena eşkeno/a tebeqaya xo ra yew kesî/e reyde bizewijîyo. Qedexekerdişê zewajî tena nê xususîyetê ke ma cor ra vatî înan ra sînorkerde nîyê. Kerwa û birayanê axîretî reyde zî zewaj qedexe yo.

**Peynî de**

Ma nê nuşteyê xo de na bawerîya qedîme ya kurdan bi xetanê umumî û çarçewaya cigêrayîşê xo de bi şima daye şinasnayene. Bêguman êzidîtî dînêko xorîn û hîra yo la seba ke cayê ma teng o ma nêeşkay zafê teferuatan bidê. Goreyê qeneatê mi komelê êzidîyî komelêko zaf balkeş o û dînê înan zî dînêko senkretîk o. Çunke rîtuelê zafê dînan tede estê û înan pêro-pîya seke yew kompkles awan kerdo. Belkî nînan ra muhîmêr êzidîtîye yew dîno orîjîn yê miletê kurdî yo. Tewr peynî de ma vanê ke sey her xebate beno ke na xebata ma de zî çend kêmane û xeletîyî estbê, naye ra ma ferasetê wendoxan rica kenê.

(Qedîya)

**Çimeyî:**

Christine Allison, Yezidi Sözlü Kültürü, Avesta Yayınları, İstanbul, 2007

Metin Bozan, Şeyh ‘Adî Bin Müsafir (Hayatı, Menkıbevi Kişiliği ve Yezidi İnancındaki Yeri), Nûbihar Yayınları, İstanbul, 2012

Ahmet Gökçen, Osmanlı ve İngiliz Arşiv Belgelerinde Yezidiler, İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları, İstanbul, 2012

Yaşar Kaplan, Günümüz Yezidiliği, Nûbihar Yayınları, İstanbul, 2013

Roger Lescot, Yezidiler (Din, Tarih ve Toplumsal Hayat), Avesta Yayınları, İstanbul, 2014

Malmîsanij (Tadayox), “Kitabê Pîroz ê Êzîdîyan: Meshefî Reş”, Armanc, hejmar: 150, Hezîran-Tîrmeh 1994, Bromma/Sweden, r. 10-11

Malmîsanij (Tadayox), “Kitabê Pîroz ê Êzîdîyan: Kitêbî Cilwe”, Armanc, hejmar: 151, Bromma/Sweden, Tebax 1994, r. 10-11

# Hişê Kurdan: Navendên Kurdolojiyê



NURULLAH ALKAÇ

Ji bo zimanê Kurdî bigihe îro, Kurdolojiyan gelek xebat kirine. Îro eger em di vê astê de bi zimanê xwe dijîn ev yek jî bi saya xebatên Kurdolojiyan e. Gelek navendên Kurdolojiyê hene ku ji aliyê Kurdan ve hatine vekirin. Di vê nivîsê de em ê Kurdolojiyên ku li Tirkiyeyê, Îranê, Îraqê û Suriyeyê bi destê Kurdan hatine avakirin û derketine pêş vekolin.

## Rojava (Suriye)

**Saziya Zimanê Kurdî/SZK (Heleb, 2010):**

Saziya Zimanê Kurdî di sala 2010'an de li Heleba Suriyeyê ji aliyê çend mamosteyên Kurdî ve hatiye avakirin. Dema hatibû avakirin li malan, bi awayeki dizî ders didan. Piştî şerê navxwe yê Suriyeyê li gor derfetên ketin destê wan, SZK: Efrîn, Qamişlo, Kobanî, Hesekê, Dêrik, Dirbêsiyê, Amûdê, Serêkaniyê, Girkê Legê, Minbiç û li Tirbespiyê beşên xwe vekirin. Akademiyeya Ziman, Dîrok û Edebiyata Kurdî a Celaded Elî Bedirxan û Înstîtûya Ziman û Wêje a Şehîd Viyan jî ji aliyên vê komê ve di sala 2013'an de hatin avakirin.

**Navenda Rojava ya Lêkolînên Stratejik/NRLS (Qamışlo, 2012):**

'NRLS' di sala 2012'an de li Qamişlo hat vekirin. Xebatên navendê bi piranî li ser fikir û ramanê ne. Di sala 2014'an de şaxa Efrînê dest bi weşana kovarek Erebî kir ku ji çar mehê carekê derdikeve û heta niha 8 hejmar hatiye derxistin.

Ji bilî van saziyan, Zaningeha Efrînê(2015) Zaningeha Rojava (2016) û Zaningeha Mezopotamya ji aliyê Kurdan ve hatine vekirin. Her wiha teza yekem bi zimanê Kurdî li Suriyeyê ji aliyê Ferhan Yûsif ve ji Zaningeha Mezopotamya hatiye nivîsandin.

## Rojhelat (İran)

**Înstîtûya Ferhenga Kurdistan (Tehran, 2000):**

Di sala 2000'î de li Tehrana Paytexta Îranê 'Înstîtûya Ferhenga Kurdistanê' hat avakirin. Serokatiya wê ji aliyê Behram Welatbegî ve tê îdarekirin. Înstîtû, bi piranî xebatên çandî, hunerî û çapemeniyê dike. Rojnameyên 'Aşitî' û 'Goft Nwe' ku bi Kurdî weşanê dikirin ji aliyê Serokwezîrê wê demê yê Îranê Ahmedînejad ve hat girtin.

**Înstîtuya Kurmancî (Quçan, 2003):**

Înstîtûya Kurmancî, di sala 2003'an de li Xorasana Îranê ji aliyê Mohemmed Rehîm Rehîmî û Nasêr Xakşûr ve ji bo xebatên çanda Kurdan hat avakirin. Di derbarê muzîk, çand û hunera Kurdî, cil û bergên Kurdî û orf û edetên Kurdî de xebatên bi qîmet kirine.

**Înstîtûya Ehmedê Xanî, di sala 2002'an de li Urmiyê hat vekirin û ji bo Kurdolojiyê gelek**

xebatên baş kir. Înstîtû di sala 2013'an de ji aliyê Îranê ve hat girtin.

Înstûtiya Kurdî a SOMA: Li Urmiyê ya Rojhilat ji bo perwerdehiya zimanê Kurdî dixebite. Her wiha 'Encümenî Edebi ya Bokan' jî di derbarê çanda Kurdî de xebatên balkêş dike

## Başûr (Îraq, IKFH)

**Navenda Kurdolojiyê (Silêmaniye, 1996):**

Li Silêmaniyê di sala 1996'an de di nava Zaningeha Silêmaniyeyê de Navenda Kurdolojiyê hat avakirin. Li navendê beşên erdnîgarî, dîrok, ziman, wêje, dad, jenosîd, civaknasî, jeopolîtik hene. Li navendê (2008, 2009, 2010) di kovara Kurdolojiyê ku 3 hejmar hat weşandin de di derheqê; siyaseta rojane,dengnasî, edebiyata nûjen û pêşketina zimên, ol û perwerdehiyê de gelek nivîs hatine belavkirin. Her wiha navendê 56 pirtûk çap kirine. Ji bo lêkolîner sûd jê wergirin di Pirtûkxaneya navendê de bi Kurdî ( 1292 pirtûk, 318 kovar, 200 rojname) hene. Her wiha bi Erebî, Farisî û Îngilîzî jî pirtûk hene.

**Binkeya Jîn (Silêmanî, 2004):**

Binkeya Jîn ne girêdayî tu partiyan e û distûra binkeyê " Miletê bê dîrok (arşîv) dişibe dara bê fêkî" ye. Di Binkeyê de beşên pirtûkxane, nivîs, weşanxane, mîkrofîlm, raport, xebata weşanê, tomarkirina deng û wêneyan hene. Armanca Binkeya Jînê ku bibe 'Pirtûkxaneya Netewî'. Di Pirtûkxaneya Binkeya Jînê de Kurdî, Erebî, Farisî, Osmanî (Tirkî), Îngilîzî û Firansî bi qasî 7 hezar pirtûk, 1187 weşanên demkî (kovar-rojname) û 669 (480 cîlt) nivîs hene. Zaftirîn pirtûkên bi 'Kurdî' û 'Kurdistan' ê ve eleqe ne, rojname û kovarên Kurdî tên berhevkirin û ji nû ve tên çapkirin. Her wiha Binkeya Jîn di derheqê ziman û wêjeya Kurdî de sempozyom û konferansan jî li dar dixe.

**'MERİ (Navenda Lêkolînên Rojhilatanavîn. Hewlêr-2012)', 'IRDK (Îstîtûya Pêşxistin û**

Lêkolînan )' û 'Peymengeha Kurdî Bo Hilbijartin' zaftirîn li ser xebatên polîtîk disekinin.

## Bakûr (Turkiye)

**Komeleya Lêkolînên Kurdî (İstanbul, 2017):**

Komeleya Lêkolînerên Kurdî wek berdewama Înstîtûya Kurdî a Stenbolê ku sala 1992'an heta 2016'an xebitî, hat avakirin. Ji 2017'an ve li Stenbolê dersên Kurdî dide.


**Înstîtûya Lêkolînên Siyasî û Civakî a Diyarbekir ( Diyarbekir, 2010):**

DÎSA, di serî de li ser pirsgirêka Kurdî, li ser kêşeyên siyasî, civakî, aborî û çandî yên Tirkiyeyê lêkolînên serbixwe dike. Ji aliyê (Kurdish Studies) 'Kovara Xebatên Kurdî' ve di nav 17 saziyên ku di derheqê Kurdan de xebatê dikin de hat nîşandan.

**Înstîtûya/Dezgeha Îsmaîl Beşîkçî ( Stenbol, 2012)**

Di gelek mijaran de xebatan dike. Di bin siya dezgehê û berhevkirinên Beşîkçî ku ji salên 1950'yî de hatine berhevkirin bi navê ' Pirtûkxaneya Lêkolînan a Îsmaîl Beşîkçî ' de 11.758 pirtûk, 800 kovarên cûda, nêzîkî 3000 rojnameyên ku ji 92 Rojnameyên serdema me pêk tên û hinek jî berhemên kêm tên dîtin hene. Di du salan carekê de 'Konferansa Xebatên Kurdî' (2013, 2014, 2016) ku gelek bala Kurdolojiya dikişîne li dar dixe. Her wiha şaxa Diyarbekir a vê Înstîtûyê jî heye.

Her wiha li Bakur, 'ZAN (Înstîtûya Civakî, Polîtîk û Ekonomî, 2014)', 'DÎTAM (Navenda Lêkolînên Cîvakî a Dîcleyê, Diyarbekir- 2010)', 'DAM ( Navenda Lêkolînan a Dêrsîmê)', 'Koma Bedlîsê ya Xebatên Akademîk û Ramanî, 2014', ' Koma Xebatê a Vate,1996' jî di derheqê Kurdolojiyê de xebatên bi qûmet dikin.




Zaningeha Efrînê(2015) Zaningeha Rojava (2016) û Zaningeha/Akademiya Mezopotamya ji aliyê Kurdan ve hatine vekirin. Her wiha teza yekem bi zimanê Kurdî li Suriyeyê ji aliyê Ferhan Yûsif ve ji Zaningeha Mezopotamya hatiye nivîsandin.





## Peymangeha Bedirxan a Zimanê Kurdî (Dêrîk, 2012):

Ji bo Ziman û Wêjeya Kurdî li ser bingeha zanistî û akademî pêş bikeve di 24'ê Hezîrana 2012'an de li Dêrikê hat avakirin. Di pirtûkxaneya navendê a bi navê Barzanî de 3 hezarî zaftir pirtûkên bî zîmanê Kurdî, Tirkî, Îngilîzî, Erebî û Firansî hene. Înstîtû ji zêdetirî 50 gundên Dêrikê xebatên dibistanê dike. Înstîtû heta 2017'an nêzikî 10 hezar kes fêrî Kurdî kiriye. Her wiha bi sedan mamoste jî gihandiye asta perwerdedayînê. Gelek panel û konferansên wêjeyî, hunerî û çandî jî li dar xistiye. Înstîtû bi tîpên Latînî dersên Kurmancî dide û ji 2013'an de dest bi dersên Soranî bi tîpên Erebî kiriye. Her wiha qursên Almanî, Tirkî û Îngilîzî jî hatine sazkirin. Înstîtû ji bo zaningeha bi navê "Bedirxan" veke xebatên xwe didomîne.

## Akademiya Kurdî (Bexdat-1970, Hewlêr-2007):


Akademiya Kurdî di sala 1970'yî de li Bexdayê hat avakirin. Di sala 1978'an de bû beşek ji Akademiya Zanyarî a Îraqê. Di sala 1997'an de navê 'Korî Zanyarî Kurdistan bikar anî. Heta 2007'an jî bi vî navî xebatên xwe domandin. Piştî sala 2007'an navenda xwe bir Hewlêrê û navê xwe jî kir 'Akademiya Kurdî. Heta niha ji 400'î zaftir pirtûk çap kirine. Bi navê 'Kovara Akademiyeya Kurdî' jî kovarek diweşîne (2017, R 36). Akademiyayê di sala 2009 û 2011'an de 'Konferansa Navnetewî a Zimanê Kurdî' li dar xistiye.




## Enstîtuya Kelepora Kurdî (Silêmaniye, 2003):

Ji aliyê Mezher Xaliq ve di sala 2003'an de li Silêmanî, 2005'an de li Kerkûkê, di 2006'an de jî li Dihokê şaxên Înstîtûya Kelepora Kurdî vekir. Her wiha li Hewlêr, Ranya û Piştderê jî şaxên Înstîtûyê hene. Înstîtû, bi armanca arşîvkirina folklor û bi hemû cûdayetiya ol û çandî a Kurdan xebatên berhevkirinê dike. Li Înstîtûyê arşîva Pirtûkxane, deng/reng, lêkolîn û beşên çapemeniyê hene. Înstîtû, bi hemû saziyên Kurdî yên çandî re di têkiliyê de ye. Berhemên Kurdî yên hemû cîhanê di arşîva xwe de tomar dike. Di pirtûkxaneyê de ji bo lêkolîneran bi Kurdî û zimanên cûda 500 pirtûk bi awayekê e-pirtûk hene.

---



FIRAT CEWERÎ

## Don Quijoteî, Oblomovtî û Libendemayîna Godot

Hin term û gotin hene ku gerdûnî bûne, di piraniya zimanan de bi cih bûne û ji aliyê piraniya mirovên xwende ve têne bikaranîn. Carina xelkên normal jî van celeb term û gotinan bi kar tînin. Gotinên welê, bêtir bi riya zanist û kitêban belav dibin û bi riya edebiyat û wergerê dibin malên zimanên dinyayê.

Ez ê di vê nivîsê de zêde nimûneyan nedim, lê bi tenê çend nimûneyên ku tavilê têne bîra mirov careke din bînim bîra we. Yek ji van gotinan "Don Quijote" (Don Kîşot) û "Don Quijoteî" ye. "Don Quijote" navê qehreman û romana nivîskarê spanî Cervantes e. Di ser vê romanê re zêdeyî çarsed salî buhurî ye, lê ev gotina ha hê jî zindîbûna xwe diparêze û hê jî di edebiyata devkî û nivîskî ya dinyayê de tê bikaranîn. Don Quijote tîpek e, tîpekî serîhildêr û şûrkêşekî li hemberî aşê bê ye. Macerahez û sergermekî xwedî fantazî ye. Siwar e, gerokekî bi serbûrî û bi serpêhatiyan ve mişt e; Don Quijote e…

Gotineke din heye ku temenê wê 158 sal e. Ew gotin jî "Oblomov" û "Oblomovtî" ye. "Oblomov" hem navê romana Îvan Gonçarovê rûs e, hem jî qehremanê romanê ye. Ev roman di navbera salên 1858-1859an de hatiye nivîsandin.

Qehremanê Gonçarov ji aliyê karakter û felsefê ve dûrî qehremanê Cervantes e; ew ji neheqî û berberiyên civatê haydar e, dixwaze guhertinan di sîstem û civatê de bike, lê nakeve nav macerayan, bêdeng e û di nav keftelefteke xewneromantîzmê de ye. Bi gotineke din bêkêr û teral e, di xwe re nabîne, pir rûdine û pir radizê. Ew mîna Don Quijote li hespê xwe siwar nabe û li hemberî aşê bê şûrê xwe nakişîne. Loma, di lîterature Bolşevîkan de, terma "Oblomovtiyê" ji bo rewşenbîrên bêkêr û teral dihat bikaranîn. Ew term, herçiqas zêde neketibe zimanê xelkê normal jî, lê li dinyayê û heta li ba şoreşgerên kurdan jî pir hat bikaranîn û hê jî mirov vê gotinê ji hin der û doran dibihîze.

Gotineke din, an jî termeke din heye ku ew jî di sedsala buhurî de û bêtir jî di nav entelektuelan de hat bikaranîn. Ev terma ha jî sernava kitêba Samuel Beckett ya bi navê "Li Benda Godot" (Godo) ye. Beckett ji xwe re du qehremanên pasîv û kawik çêkirine û bi riya wan dixwaze resimekî felsefeya absurdê bide. Du mirov, Estragon û Vladimir, li ser riyekê, li bin dareke rût rûniştine û difikirin ku xwe bi dar ve bikin. Ew biryarê didin ku ji hev veqetin, lê tenêtî bi wan zor tê. Ew pevdiçin, digirîn, distirên. Ew carina xwe ji bîr dikin ku li benda Godot ne. Godot ji wan re soz daye ku ew ê bê…

Belê, Godot nayê, lê di vir de ne hatina Godot, "libendemayîna Godot" girîng e. Loma, her kes li benda Godot ne.

Mirov gelek caran, di gelek zimanan de van gotinan dibihîze; "em li benda Godot ne", "ew li benda Godot ne". "Filankes wek Don Quijotekî ye" "Bêvankes Don Quijoteiyê dike". "Rewşenbîrên me wek Oblomov in", "Oblomovtî di ruhê wan de heye" û hwd…

Herçiqas ev term û gotin ji edebiyata dinyayê ya bijarte derbasî zimanê me bûbin jî, lê divê em mikur werin ku kêm kesan ev berhemên ku mohra xwe li dema xwe xistine û tesîreke mezin li dema me kirine, xwendine.

Loma, ez dixwazim bi kurtî li ser nimûneya yekem, yanî li ser Cervantes û romana wî Don Quijote rawestim. Ev romana ha ji du cildan pêk tê û herdu cild di navbera salên 1605 û 1615an de li Madrîdê hatiye nivîsandin. Di wê demê de bi taybetî li cografyaya ku Cervantes lê dijiya, gelek berhemên ku serpêhatiyên siwariyan dianîn zimên an bi devkî dihatin gotin an jî mîna berhemine nivîskî dihatin weşandin. Lê berhema ku Cervantes nivîsand, çi bigire ket pêşiya hemû berhemên wê demê û karakterekî gerdûnî ava bû. Dibe ku Cervantes ev berhema ha bi serpêhatiyên xwe hûna be, ji ber ku di salên ku ew bi nivîsandina berhemê ve mijûl bû, ew bi tirkan re ketibû şer û ji milê xwe birîndar bûbû. Paşê jî pênc salan di destê siltanê Misrê de hêsîr û zîndanî mabû.

Ev berhema Cervantes di klasîfîkasiyona edebiyata dinyayê de carina ket nav refên kitêbên zarokan, mîna qehreman Don Quijote carina kêmaqil hat dîtin, lê îro wek berhema destpêka hunera romanê tê hesibandin. Don Quijote jî wek qehreman, ne kêmaqil û kawik, lê wek mirovekî biaqil û jêhatî tê dîtin. Dibe ku jî ji ber vê dûrbîniya Cervantes be, ku Don Quijote gerdûnî bûye û piştî bi çarsed salî jî bi kêf û zewq tê xwendin.

Rast e, Oblomovtî zerarê dide me, lê Oblomov di nav me de pir in. Gelek ji me jî li benda Godot ne. Em Don Quijotean jî naecibînin. Lê hewcedariya me bi Don Quijoteên mîna Elyezer Bin Yehûda, Don Quijoteên mîna Celadet Alî Bedir-Xan, Don Quijoteên mîna Mûsa Anter, Don Quijoteên mîna Edîp Karahan û Don Quijoteên mîna….hene.

Ji kerema xwe re li dora xwe binêrin û hejmara Don Quijoteên kurdan li ser zêde bikin…

Sefernameyek-III

# Koloniya dawî li Rojhilat: Makao





CIWANMERD KULEK

> Tişta ku vî welatê piçûk ewqas mezin û qelebalix dike belkî jî kasînoyên wê ne. Salê 35 milyar dolar dahat ji van kasînoyan tê, ango heft qatê dahata kasînoyên Las Vegasê. Min serdana çend ji van avahiyên mezin û luks ên kasînoyan kir.

Di heşt û deh deqeyên tariya êvarê de, ji keştiya ku ji Hong Kongê dihat peya bûm û ketim avahiya îskeleya Makaoyê. Min navê vî welatî, yekem car, çaxa ez ji bo wir hatim vexwendin bihîst. Heta wê rojê min nizanibû welatekî wiha li ser rûyê cîhanê heye. Festîvala Edebiyatê a Makaoyê (Rotas das Letras) a ku ez vexwendibûm, ji nav festîvalên navnetewî ên ku heta wê gavê ez çûbûmê, xwedî bernameya herî dirêj û tije bû. Di bernameya festîvalê de 105 çalakî (pirranî panel) hebûn ku 55 nivîskarên ku ji welatên cuda ên cîhanê hatibûn, di wan de beşdar bûn. Di çarçoveya vê festîvala ku du hefteyên rast dewam dikir de ez ê jî di sê çalakîyan de amade bûma. Di bernameya festîvalê de Abdulai Siláyê ji Guinea-Bissauyê ê ku yekemîn roman û yekemîn şanoya welatê xwe nivîsîbû jî hebû, Yu Huayê yek ji nivîskarên herî mezin ên Çînê ên van deh salên dawî jî. Li Makaoyê min ê her şev çîrokeke ku nivîskarên ku berî min hatibûn wir û li ser wir nivîsîbûn bixwendaya, û hinekî jî wî welatê piçûk û taybet ji aşop, çavdêrî û serpêhatîya wan nas bikira.

Piştî deh saetên ku li asîmanan û li ser deryayê derbas bûbû êdî min ê bi çavê serê xwe bidîta ku berra jî welatekî wiha li ser rûyê erdê heye. Li gor hesaban, hinan ji desteya kargerîya festîvalê dê di heşt û çarîkekê de li ber deriyê avahiya îskeleyê ez pêşwazî bikirama û bibirama hotêla min. Bêhneke xerîb a goştê biraştî ji hundirê avahiya îskeleyê dihat. Bi qelebalixeke westiyayî re ketim dorê li ber xala kontrolê a koç û gumrukê. Çend dezgeyên dî ên kontrolê ku ji bo hevwelatiyên wir hatibûn veqetandin wek bayê dişixulîn û xelk zûka derbas dibûn; lê kesên li ber xalên ku ên wek min ji welatên biyanî hatibûn tê re diçûn, pir hêdî derbas dibûn. Fermanberê ku li pasaporta min nerî, berê xwe da min û ji nişka ve ji ciyê xwe rabû. Xuya bû bi Îngilîzî nizanibû, yan jî qedexeya axaftinê li ser wan hebû; lewra tenê bi îşaretên destan digel min da û stend û berê min da odeyeke li pişt dîwarê li paş wî. Dema ji nav her kesî tenê ez hatim veqetandin, min his kir ku tişta ku ji destpêka rêwîtiya xwe de jê ditirisiyam lê min nizanibû çi ye, dihat serê min. Digel polîsekî bi unîforme di dalaneke teng a pişt dîwar re derbas bûm û hatim ber ciyekî bi cam. Fermanberekî bi cilên sivîl hat, belgeyên min jimin stendin û ket odeyeke dî. Piştî xêlekê gava vegeriya, telefona min ji min xwest. Numreya wê ya IMEI li kaxezekê nivîsand û xwest ez pereyên di berîka xwe de derxim. Piştî lêkolîn û lêpirsîneke ku ji min re gelekî dirêj hat, kaxezeke ku destûra mana mehekê li Makaoyê tê de hebû da min û ez şandim. Heman polîsê bi unîforme min di dalana teng re derbas kir. Bêyî ku bîstikekê bêhna xwe berdim, bi gavên lezgîn ji hêwana fireh a ku bêhna xerîb a goştê biraştî jê dihat derketim. Saetê heşt û nîvan derbas dikir.

Li derve, ber derî, ti kes tine bû. Erê ez bi derengî ketibûm lê ez dîsa jî şaş mam ku ber avahiyeke wiha mezin û navnetewî ewqasî xalî û bê reng be. Kêliyekê, hînê min nizanibû bi kû de herim û çi bikim, ez lê warqilîm ku keçikek ji wesayîteke ku ji ber avahiyê hebikekî bi dûr ketibû daket û bi bazdan bi ber min ve hat. Du kaxezên spî ên A4 di nav destên wê de bûn. Yekê ji wan, weku di erênayê de mabe, piçikekî rakir û paşê fikra xwe guhert, şûn de girt. Lê kujekî wê bi ber çavên min ketibû: Navê min lê dinivîsî.

Me silaveke kurt û bi bez da hevdu. Navê wê Stefanie bû. Yeke zirav, dirêj î kejik bû. Çawa çav li min ketibû tê derxistibû ku ez im, lewma hewce nemabû ku kaxezê ji min re bilind bike. Li ber avahiyê li benda min mabûn, piştî ku her kes derketibû û ez nedîtibûm ji karmendên wir pirs kiribû lê ti salixek hilnedabû, jê re gotibûn ku kes li wir nemaye; lewma,wê kêliya ku ez ji avahiyê derketibûm, ew jî siwar bûbûn ku biçûna. Nivîskar û rojnamevanê ciwan ê Portekîzî, Henrique Raposo, ku tu nabêjî ew jî di keştiya min de hatibû, di seyareyê de rûniştî bû. Min ê vî nivîskarê ku bi pirtûka xwe ya ku vê dawîyê derxistibû li Portekîzê polemîk û sansasyonên mezin rakiribûn û gelekî deng dabû, di maweya festîvalê de çend carên dî jî bidîta.

Dema seyare hat li ber hotêla Henrique sekinî û Stefanie jî digel wî daket ku hevkariya wî bike bo karên hotêlê, min xwest wêneyekî wî welatî, ku ez neşiyabûm di tariya êvarî û rêwîtiya sergêjane de bi çavên xwe bi dest bixim, bi pirsên xwe ji ajokarê seyareyê wergirim. Tiştên ku vî ajokarê Filîpînî, ku şeş roj şûn de dîsa wî dê ez vegerandama ber keştiyê, di maweya du deqîqeyan de jimin re gotin belkî kurteya hemû pêzanînên min ên derbarê Makaoyê de bin: Makao kolonîya herî dawî bû li Rojhilat. Portekîziyan di 1999an de bi peymaneke digel Çînê ew dewr kir. Heta pêncî salî qedera vî welatî dê di destê wî de be. Dema ev welat hat dewrkirin, kesên zengîn, Portekizî, ên ku qaweta wan digihaştê, bi hinceta ku dê Komunîzma Çînê wir têxista destê xwe, ji welat derketin û kesên wek wî feqîr jî li wir mabûn. Kesî nizanibû dema 2049 hat dê çi bibûya, lê ajokar amin bû ku kesî bawer nedikir ku piştî dewrkirinê Makao dê ewçend bi lez bi pêş ketaya û zengîn bibûya.

**Hotel-Casino û Caxên Balkonan**

Sîlweta Makaoyê bi avahiyên bilind û keşxe, di nav mij û morana meha Adarê de bi zorê xuya dikir. Mirov şaş dima ku 650.000 kes li ser 30 km2yî dijiya. Nizanim geştiyarên ku ji nava Çînê, ji Hong Kongê û welatên dî tên çiqasî li vê hejmarê zêde dikin, bes ev hejmar bi tena serê xwe bes e bo ku welatê, li gor rêjeya xakê, herî qelebalix ê cîhanê pêk bînin. Tişta ku vî welatê piçûk ewqas mezin û qelebalix dike belkî jî kasînoyên wê ne. Salê 35 milyar dolar dahat ji van kasînoyan tê, ango heft qatê dahata kasînoyên Las Vegasê. Min serdana çend ji van avahiyên mezin û luks ên kasînoyan kir. Li her qatê, li her maseyê komek mirov li ber lîstikên cûr bi cûr rûniştibûn û heçku tiştekî pir biçûk î eleqeya wî bi vê qiyameta pereyan re tine bû dikirin. Ecêb e ku ewqas mirov bi ewqas lîstikên cûr bi cûr û adet û qaîdeyên wan dizanin. Van avahîyên ji derve de debdebeyeke wan î mezin heye, ji hundir de bi tiştên girantir pêşwazîyê li mêvanên xwe dikin. Peykerên zêrîn ên bi dehan kîloyan, zêrên heqîqî ên di nav mermerên erdê de, avahîyên di şiklê Parîsê, Venedîkê û bedewiyên dî ên cîhanê de hatine lêkirin û xemilandin... Hin avahî ne kêmî serayên împeratoran bûn û hîn min di hişê xwe de hewl dida ku têbigihêm gelo berberîya kîjan seraya cîhanê dikirin, Rui d'Ávila Lourido, dîroknasekî li ser têkiliyên Ewropayê û Asyayê dixebitî, nerîna min pûç kir: Ew ne ji bersûretên serayên dî ên cîhanê, her yek ji berberîya a dî çêbûbû. Di vê pêşbazîya bêhawe de her yeka nûhewl dabû heta cîyê ku aqlê mirov negihêjê ji bo ku ji a berî xwe mezintir û balkêştir bûya.

Tişta beloq a li ciyekî ewqas zengîn û ewqas piçûk î qelebalix, helbet, hebûna nakokiyan a ligel hev e. Heçku cî nemabû ku zengîn û feqîr ji hev cuda bibin, her tişt di ber hev de bû. Li taxên tûrîstîk û navendî, li ser mixazeyên keşxe, hesinên balkonên xerabe ên ku pot û pertalên malê tev de lê raxistî bûn li ber çavê mirov diketin.Tew di hin kûçeyan de xanîyên kevn ewqas di ser dilê hev de bûn ku evan şîşên balkonan li kêleka hev wek qefesan dixuyan ku di wan de bîranîn û halê malan dihatin pêşandan.

Herçî xwarin e, kêfa min ji bêhna ku min li kûçeyan kir re nehat. Min xwarinên Portekizî jî, li xwaringehên Çînî ên ku çayê berî xwarinê didin xwarinên Çînî jî ceribandin. Min ji bo xurekên li kûçeyan jî hewl da, lê dawiyê ji neçarî min berê xwe da McDonaldsê û Big Mac Menu digel kolayê xwar. Ji alî xwarinan de, ez jî wek zimanê Kurdî me: Zimanê Kurdî çiqas peyvên biyanî qebûl bike, mîdeya min jî ewqasî xwarin û tahmên biyanî qebûl dike.

Hey me got ziman; herçî zimanê Makaoyê ye,bi zimanê Kantonî diaxivin ku tenê li vê nîvgiravê heye.




## Li ser riyên bazirganiyê

Makao hê di sedsala şanzdehemîn de bala Portekiziyan kişandibû. Portekizî zûka bi qîmeta vî welatê piçûk ê nîvgiravî, ku bendereke pir girîng bû, hesiyabûn û ji bo bazirganiyê lê bi cih bûbûn. Bandora Portekiziyan a li vî welatî di rêveberiyê de bi awayekî kêm û zêde ji wê demê şûn de her tim bûbû, lê serwerî û kolonîzekirina wê vedigere sedsala nozdehan. Di berhevoka nivîskarên ku berî min hatibûn li Makaoyê mabûn û li ser wê nivîsandibûn de, nivîskarekî Çînî çîroka bûyereke ku qedera vî welatê piçûk guherandibû nivîsîbû. Min tê de xwend ku waliyê zalim ê wê demê, ji alî xortekî xwedêgiravî ji ber zilma wî jê bi kîn bû, bi awayekî hovane hatibû kuştin, milekî wî û serê wî hatibû jêkirin, û Portekiziyan ev kiribû hincet bo ku Makaoyê bi temamî têxin bin hukmê xwe û wê bikin kolonîya xwe. Beriya vê bûyerê bi çendakî Brîtanîyan di Şerê Efyonê de zora xanedaniya Çînê biribû û xanedaniya Çînê neçar mabû ku deriyên xwe ji bazirganên Rojavayî veke û Hong Kongê bide Brîtaniyan. Ji bo ku pozisyona xwe ya li ser riyên bazirganîyê xurt bikin, Portekizîyan jî rabû hukimraniya xwe ya li Makaoyê tekûz kir.

## Li erafa piştî Portekizê û berî Çînê


Brîtaniyan du sal berî Portekizîyan, di 1997an de, Hong Kong dewr kir. Vêga Hong Kong û Makao, du welatên nîv serbixwe, weku bi rîtma saeteke ku ji bo pêncî salî hatibe eyarkirin, di nav şêweyekî seyr ê Yek Welat (Çîn) û Du Sîstem (Komunîzm-Kapîtalîzm) de bi rê ve diçin. Roja ku Portekiziyan Makao dewr kir, 1999, wek do di bîra ajokarekî dî ê Filîpînî, Dante, de maye: "Min di televizyonê de temaşe kir ku alaya Portekizê hat daxistin. Serwerê Portekizî ê wê demê li ser xalîçeya sor dimeşiya û li balafirê siwar dibû ku vegere welatê xwe. Patronê min î hingê, yekî Portekizî bû, kelogirî bû. Piştî ku balafir bi hewa ket, patronê min berê xwe da min û bişirî, got: "Ez êdî Çînî me.""

Heta ku ez li vî welatî mam, herçî kesên ku min ji wan pirsî, kesî qeneeteke misoger tine bû ku dê di 2049an de çi bibûya. Rojnamevanekî ku bi min re hevpeyvîn kir, di wê qeneetê de bû ku dema Rojavayiyan Hong kong û Makao dewr kiribûn guman dikirin ku dê sîstemeke demokratîk li van welatan were peyrewkirin, lê ji niha de pergala Çînê a otorîter desthilata van herdu welatan xistibû bin hukmê xwe. Di rê de bala min bi înşeatên hin balaxaneyan ket, ên li bajarekî bi navê Zhu Hai, ku Çîn li ser sînorê -û li gor hinan ji girrê -Makaoyê ava dikir.



## Kovara Pepûk:

# Silavên kolanê hene!




BENGÎ BAWEŞAN

Kovar, ji ber gelek taybetmendiyên xwe ên cur bi cur di qada edebîyat û weşangeriyê de balê dikişînin û ji cureyên din cuda dibin! Kovara Pepûk li Çewlîgê dixwaze rengên bajêr di kovarê de cî bigirin û her wiha dixwaze li Çewlîgê bibe dengekî alternatîf! Bi van taybetiyên xwe ve Pepûk jî balê dikişîne.

Pepûk di meha Rêbendana 2017'an de bi dirûşma "Silavên kolanê hene!" dest bi weşanê kiriye. Pepûk wek kovareke çandî û edebî di çarçoveya edebîyata kolanê de weşanê dike. Wekî din Pepûk du meha carekê çap dibe û bingeha naveroka kovarê di derheq çand û jiyana civakî a Çewlîgê û li ser nivîsên edebî ye. Me li ser navê heftenameya Basê bi Rojnameger û edîtorê berê û nivîskarê kovarê Adem Özgür, Derhênerê Weşana Giştî û nivîskarê kovarê Faruk Aksin û editor û nivîskara kovarê Betül Metin re derheq Kovara Pepûkê de axivîn.



**"Divê dînamîzma kolanan bi awayek bihata vegotin"**

Rojnameger û edîtorê berê û nivîskarê kovarê Adem Özgür dibêje fikra kovara Pepûkê dema salên zanîngehê, di civata dost û hevalan de hatiye axivîn û wiha berdewam dike,

"Me bi hevalan re behsa kêmasiya weşangeriyê an jî kêmasiya reng û dengekî cihêreng dikir. Me digot pêwistiya Çewligê bi rojname û kovarekê heye. Berê ji ber ku derfetên me yên aborî û civakî ne pêkan bûn, me nikarî tiştek bikira. Derxistina rojname zehmet û bi mesref bû ji ber vê jî me biryar da ku em kovarekê derxin û me wisa dest bi kar kir."

Özgür destnîşan dike ku kovara Pepûkê bi nîyeta di çarçoveya edebîyata kolanê de dest bi kar kiriye. Özgür sedema vê çarçoveyê wiha tîne zimên,

"Çewlîg, bajarekî gelek piçûk e. Nêzikî Amed û Dêrsimê ye û ji bo vê erdnîgeriya wê taybet e. Him bajarekî muhafizekar him jî polîtîk e. Wekî din wisa xuya dike ku piştî sala 2007'an Zanîngeha Çewlîgê avabûyê li ser jiyana 'civakî-çandî' a bajêr guhertin kiriye. Ger em tevî van tiştan bifikirin dengên kolanê, mijarên ku li kolanê tê axaftin, atmosfera polîtîk a kolanê bi ya min girîng e!"

Özgür amaje dike ku qîmeta edebiyata kolanê him li Kurdistanê him jî li Tirkiyeyê tune ye. Özgür dibêje weşanên ku têne çapkirin jî dûrî edebîyata kolanê ne.

"Ger em Qırıx'a rojnameya Özgür'e nehesibînin hema bêje qet pratîkên edebîyata kolanê tune. Lê belê divê dengê kolanê, dînamîzma kolanê an jî bêhna kolanê ku wenda dibe, bihata vegotin. Me jî hewl da ku bi taybet vê valahiyê li Çewlîgê temam bikin."

**"Çîroka me jî nêzî efsaneya Pepûkê ye!"**

Derhênerê Weşana Giştî û nivîskarê kovarê Faruk Aksin jî dema ku ji bo kovarê li navekî digeriyan, xwestine ku ev nav, navekî ji çanda Kurdan be û li ser navê Pepûkê li hev kirine. Aksîn sedema bijartina vî navî jî wiha tîne zimên,

"Pepûka ku di efsaneyê de derbas dibe ji ber azaba wicdanê xwe li çiya û deştan weke ku dengên vê vedide, diqîre. Bi rastî çîroka me jî nêzî efsaneya Pepûkê ye. Em niha li rojên zor dibin şahid û dibe ku bi saya kovarê em ji ber vê rewşê diqêrin. "

Aksîn derheqê mijara 'her çi qas navê kovarê bi Kurdî be jî zimanê kovarê bi Tirkî ye' de dibêje ew wek tîm xwe di îfedakirina zimanê Kurdî de (kurmancî – kirdkî) baş nabînin û ji ber vê Tirkî bijartine.

**"Em hewl didin ku bi Pepûkê navdarên çanda me bigihînin xwîneran"**

Li Çewlîgê pratîka kovargeriyê lawaz e! Heta niha bi tu awayî kovareke emr-dirêj nehatiyê çapkirin. Aksin amaje dike ku nivîskar û xêzkarên ku di Pepûkê de dinivîsin û xêzkariyê dikin amator in û cara siftê ye ku di Pepûkê de dinivîsînin.

Aksîn balê dikişîne ser nivîsên xwîneran û dibêje xwîner nivîsên xwe ji me re dişînin û em jî wan di kovarê de diweşînin. Aksîn dibêje ev nivîs motîvasyonê dide tîma Pepûkê!

Aksin amaje dike ku ew girîngiyê didin navdar û kedkarên çanda Kurdî û di kovarê de cî didin wan, " Bo mînak bêjim me di hejmara yekemîn de hunermend Rênçber Ezîz bibîranî. Di hejmara me ya dawî de jî derheqê Hunermend Eyşa Şan de dosyayeke me hebû. Piştî lêkolînên dirêj em gihîştin agahiyên Eyşe Şan û ew agahî me di kovarê de weşandin. Wekî din vê ya bêjim ev agahî li qada dîjîtal û nivîskî tune. Em dixwazin bi saya Pepûkê di her hejmarê de ji navdarên çanda me agahiyan bidin xwînerên xwe!"

**"Nivîsandin me baş dike "**

Edîtor û nivîskara Pepûkê Betül Metin jî diyar dike "Ger em binivîsin wê cîhan rind bibe!" dibêje û bi saya Pepûkê zêdetir derheqê edebîyata kolanê de xwedan agahî bûye. Metîn bo kovarê wisa diaxive,

"Bi rastî dema ku em dinivîsin em him hînê edebîyata kolanê him jî hînê taybetmendiyên bajarê xwe dibin! Xema bazirganî a Pepûkê tune ye. Her wisa ne jî em dikevin derdê konjoktura sîyasetê. Nivîsandin me baş dike, ev yek bo me tiştê herî girîng e!"


Metîn amaja dike ku bertekên erenî bo Pepûkê hene û bi taybetî jî Çewlîgiyên ku li derveyî bajêr dijîn eleqeyeke mezin nîşanî kovarê didin dibêje û wiha pê de diçe; "Ji bilî van gelek cî û deverên din, bo mînak ji Behrareş, li bajarên wekî Yozgat û Erdehanê xwînerên me yên eleqeder hene"

Edîtor û nivîskara kovarê Betül Metin dibêje daxwaza wan a sereke ev e ku Pepûk her bifire! Û wiha diaxive, "Herçiqas naveroka Pepûkê sîyasî nebe jî em di her hejmarê de ji ber metirsiya 'Gelo emê bên girtin' kovarê çap dikin. Jixwe tê zanîn ku niha ji ber tweetekê mirov têne binçavkirin. Em bi tenê dixwazin emrê Pepûkê dirêj be."

Pepûk bi saya keda xwendekar, karmend, karker, nîgarkêş, rojnameger û kesên bêkar tê amade kirin û heta niha sê hejmarên kovarê gihîştiye ber destê xwîneran...

> Kovara Pepûkê li Çewlîgê di çarçoveya edebîyata kolanê û bi nîyeta li Çewlîgê bibe deng û rengekî alternatîf tê weşandin. Di kovarê de nivîsên edebî, helbest û karîkator cî digirin. Pepûk bi saya keda xwendekar, karmend, karker, nîgarkêş, rojnameger û kesên bêkar tê amade kirin.




## Orkestraya zarokên Gimgimê:

# Koroya ji enstrûmanên teşt, bîdon û textikan



CESİM İLHAN

Her tişt beriya sê salan dema ku xwendekarên dibistana Hamurpetê ji malên xwe anîna; teşt, bîdon, kevçî, quşxane û teweyan dest pê kir. Zarokên Gimgimê tevî hemû derfetên kêm, dev ji daxwaza xwe ya muzîkê bernedan. Piştî hatina mamosteya muzîkê Aslı Tanrikulu qedera van zarokan guherî. Mamoste Aslı ji bo xeyala xwendekarên xwe kompanyayek li dar xist. Gelek kesan jî piştgirî dan vê kompanyayê û xeyala zarokên Gimgimî zindî bû.

Piştî hatina mamosteya muzîkê Aslı, ku ji Îzmîra Tirkiyeyê ye, jiyana zarokên Gimgimê guherî. Mamoste Aslı li gundê Mamaxika(Yurttutan) yê girêdayî Gimgima navçeya Mûşê dest bi avakirina 'Koro û Orkestraya 11 Gundan' kir. Piştî avakirina vê orkestrayê jiyana zarokên Mamaxikayê guherî. Heta niha zarokan ti enstrûman nedîtibûn. Mamoste Aslı ji bo zarokan 'Pola Muzîkê' ava kir û zarokan li vê odeyê bi amûrên muzîkê dest bi ceribandina xeyalên xwe kirin. Zarokên orkestrayê dest bi gotina stranên Kurdî, Tirkî, Îgilîzî kirin. Pêşî li gund û navçeyên der û dora Gimgimê konsertên biçûk dan paşî jî ketin rojeva Tirkiyeyê.

Çîroka serkeftinê ya zarokên Gimgimî bi hatina mamoste Aslı Tanrikulu dest pê dike. Mamoste Aslı di demeke kin de qabîliyeta zarokan kişf dike. Ji bo ev qabîliyet wenda nebe mamoste gelek xebatan dike. Di encamê de jî orkestrayeke ji 40 xwendekarî pêk tê ava dike. Teşt, kevçî, quşxane û hwd. ku zarokan pê muzîk çêdikirin ji aliyê mamoste Aslı ve bûne wek amûrên muzîkê.

**Mamoste Aslı dixwaze xebatan pêş bixe**

Aslı Tanrikulu ji Basê re ragihand ku ev zarok di şertên tunebûnê de bi serketin. Ev zarokên ji gundekî Gimgimê bala kesên derveyî bajêr jî kişandin. Zarok, li gelek deverên der û dora Gimgimê konsertan didin. Bi Îngilîzî, Kurdî û Tirkî distrin. Zarok li amûrên wek tembûr, mandolîn, keman, gîtar, bilûr, piyano û hwd. dixin û di repertuara wan de gelek stran hene.

**Navê orkestrayê dê bibe "Orkestraya Xeyalan"**

Mamoste Aslı balê dikişîne ser dibistana Hamurpetê ku 65 km ji Gimgimê û 110 km jî ji navenda Mûşê dûr dikeve. Ji 11 gundên Gimgimê zarok tên vê dibistanê. Orkestra jî navê xwe ji vir girtiye. Mamoste Aslı dibêje " Orkestraya Hamurpetê ji 40 kesî pêk tê û dê di pêşerojê de wê navê 'Orkestraya Xeyalan' bistîne. Ev prose ji bo ciwanên herêmê dê bibe mînak."

**Ji zarokên Kurdan re xelat**

Komeleya Hevkariyê ya Hunermend û Hunerhezên Stenbolê (SANSEV) bi piştgiriya Şaredariya Maltepeya Stenbolê Festîvala ku ji 22 bajaran 99 koro û 3 hezar û 666 kesan beşdar bibûn lidar xist. Orkestraya Hamurpetê jî beşdarî festîvalê bibû. Ew orkestra ku ji 40 zarokî pêk dihat bi Tirkî, Kurdî, Îngilîzî 4 stran gotin û ji aliyê komîteyê ve hat ecibandin. Stranên, "Guzeller İçinden Bir Seni Seçtim", "Perhaps", "Gel Gör Aşk Beni Neyledi" û "Darhejîrokê" gotin û gelek hatin ecibandin.





### Mamoste Aslı: Zarokan ji bêjingê bendîr çêkirin

Mamoste Aslı destnîşan dike ku serkeftinên bi zarokan re ne bi plan bûn û wisa pê de çû: "Li vî gundê ku ji navçeyê 65 km, ji bajêr jî 110 km dûr e tu amûrên muzîkê tune bûn. Zarokan bi destên xwe ji xwe re amûr çêkirin. Xwendekaran teşt, bîdon, tewe û kevçiyên ku ji mal anîbûn bikardianîn. Birinc dikirin nav şûşeyan û deng jê derdixistin. Çermê çêleka li bîdona girê didan û dikirin def. Bêjingên dayikên xwe dikirin bendîr. Ji textikan tembûr çêdikirin. Bi vî awayî xwe pêş de birin. Em du salan bi vî awayî xebitîn. Min qabîliyeta zarokan dît. Hin amûrên min hebûn, min ev amûr ji bo zarokan anîn dibistanê, van amûran gelekî bala zarokan kişand. Dema em derketin rê em wek proseyeke mezin nedifikirîn. Fikra min tenê di dersên muzîkê de em dikarin çibikin bû. Paşê bi riya medyaya civakî me dengê xwe gihand guhdaran. Piştî vê, min kompanyayek lidar xist û gelek amûrên muzîkê ji me re hatin. Em bi 40 zarokan çûn Stenbolê. Paşê me dît ku em di Festîvala Navnetewî ya Pirdengî a Koroyan de konsert didin. Ji çar aliyên welat telefon ji me re hatin. Gelek kes ji me re bû alîkar. Orkestraya ku me bi piştevaniya xêrxwazan ava kir li her deverê bû xwedî eleqeyek mezin."